


NÜDEM

No 14 1995



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

NÜDEM

Kovara huneri, edebî ú çandi

Xwedi ú berpîsiyare gişti

Chief Editor

Firat Cewerî

Hejmar 14

Havin: 1995

Şerdîn abonetiyê (salek)

Swêd: 190 Sek

Welatîn din: 50 \$

Institution 260 Sek

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: B. Haco
Pergala berg ú rûpelan: Nûdem

NÜDEM kovareke serbixe wê
Kurdistanî ye, ferqiyetê naxê
navbera nêrin ú ideolojiyên kurdan,
ji dijminatiya kes ú rêkxistinan dûr
e, rûpelan wê ji hemû niviskarên
kurd re vekirine.

*Herkar: Melmed Uzun, Naci Kutlu, Z. Zinar,
Xelil Dabakî, Hesînî Metî, Husîn Duzen, Sebî
Batanî, Haviz Qazî, S. B. Soreklî, Bedîxanî Epizdeanî,
Fasînî Resîd*


Navnîşan/Adress

Termov. 52 2tr.
175 77 Järfälla-Sweden

Tel ú Fax: 8-583 564 68

NAVEROK

- 4 KA EM Ê KENGÎ VEGERIN? ♦ **Firat Cewerî**
 - 6 DO ♦ **Felat Dilges**
 - 7 DERPIYÊ SOR Ú ALA TIRK ♦ **Edip Polat**
 - 11 CAN YÜCEL ♦ **Werger: Mahmûd Lewendî**
 - 14 EZ DIFIKIRIM LOMA EZ HEME ♦ **Şerefhan Cizîrî**
 - 20 MILKÊ EVİNÊ ♦ **Rojen Barnas**
 - 21 MAHATMA GANDÎ ♦ **Mihemed Dehsîwar**
 - 40 DIVÊ ♦ **Latîf Özdemir**
 - 41 PINİKÊR ♦ **Mustafa Aydogan**
 - 53 EVÎNA CIZÎRÎ Ú CEGERWXÎN ♦ **Heyderê Omer**
 - 58 EZ Ú BAZ ♦ **Xemgînê Temê**
 - 61 HEVPEYVÎN BI VEDAT TÜRALÎ RE ♦ **Firat Cewerî**
 - 69 MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVÎSÎNE ♦ **Mayakovskî**
- Werger: Süleyman Demir
- 75 MELE SEÎDÊ KURDÎ ♦ **Zeynelabidîn Zinar**
 - 81 HÎZAR ♦ **Nacî Taha Berwarî**
 - 82 MAMOSTA BÊRENG ♦ **Şahînê B. Soreklî**
 - 94 HOZAN Ú MUEYID TEYIB ♦ **Haviz Qazî**
 - 97 LI BENDA GODOT ♦ **Zehra Îpşiroglu**
- Werger: Şefik Kaya
- 101 GIRTÎ ♦ **Husêن Duzen**
 - 106 NÜREDİN ZAZA Ú KURTEÇÎROKÊN WÎ ♦ **F. Cewerî**



KA EM Â KENGÎ VEGERIN?

Firat Cewerî

Mîn van rojan bîranînê Dr. Nûredîn Zaza bi tirkî xwend. Ew bi wergera Aytekin Karaçoban û di nava Weşanê Mezopotamyayê de derketye. Çiroka jiyana wî ya bi trajedî tesîreke ecêb li min kir. Min di çiroka jiyana wî de resimekî heftê salane yê kurdan dît. Resimekî reş... Resimekî ku divê rewşenbîrên kurdan li ser bifikirin. Nûredînê zarok piştî şikandina serîhildana Şêx Seîd mecbûr dimîne ku bi kekê xwe Dr. Nafiz re welatê xwe terk bike û piraniya jiyana xwe li sirgûnê bidomîne.

Nûredîn ji malbateke arîstokrat tê. Kalikê kalikê wî bajarê Madenê ava dike. Piştî ku Osmanî ji kalikê wî aciz dibin, ordiyeke leşkerên xwe dişîne ser, da ku wî ji Madenê derxîne. Ew ji bo ku pêşî li wêrankirina bajarê Madenê bigire, li ber ordiyê dest hilnayne, kincên derwêşan li xwe dike, berê xwe dide welatê Yemenê û piştî salan li wir di nava bêdengî û tenêtiyê de wefat dike. Nûredîn Zaza ji dil behsa vî kalikê kalikê xwe dike. Bermayê vî kalikî, yanî bavê Nûredîn Zaza jî xwende bûye û li gorî dema xwe rewşenbîr bûye. An jî ji rewşenbîrtiyê wêdetir arîstokratekî kurd û Osmanî bûye. Mirovekî bîrbir, sergiran, welat-hez û dûrbîn bûye. Ew mirovekî dostê ilim û dijminê nezaniyê bûye. Loma ew zarokên xwe dide xwendin û tu carî dûrî huner û edebiyatê namîne. Nûredînê ku di malbateke weha xwende û rewşenbîr de digihê, bivê nevê bal û meyla wî jî li ser xwendinê heye, di jiyana xwe ya sirgûnê de jî hema ku firsenda wî çêdibe, ew dixwîne. Lê ew bi tenê bi xwendinê jî nayê ser; ji bo hişyarkirin û ji

nezanî û stemkariyê rizgarkirina kurdan jî mecbûr dimîne ku xwe biavêje nava siyasetê. Loma ew li her sê-çar welatên dagirkirê kurdan di heps û zîndanan de dimîne, îşkence û neheqiya dinyayekê dibîne.

Nûredîn Zazayê ku di deh-diwanzdeh saliya xwe de dev ji welatê xwe berdaye, di navsaliya xwe de dixwaze lê vegere û li wir dest bi jiyanekê nû bike. Lê belê piştî kurte-demekê serê wî bi karbidestan re dikeve belayê û dîsan mecbûr dimîne ku welatê xwe terk bike û li Ewrûpayê bi cih bibe. Gava ew cara dawî ji Tirkiyeyê derdikeve û xwe digihîne Swîsreyê, mîna ku gîhîştibe azadiya xwe, bêhnekê ji dil berdide û hezkirina xwe ya ji welatê xwe yê azad, ji Swîsreyê re tîne ziman. Mîna xwendevan mirov bi xwe jî bi wî re bêhneke rehetiyê berdide, lê mîna kurd trajediya kurdan ya heftê salêن dawî jî tîne bîra mirov. Heftê salêن bi kuştin, bi êş û elem, bi koçberî û sîrgûnan ve tijî... Koça me ya dawî koça heştêyî ye. Bazdayêن vê koça heştêyî ji xwende û rewşenbîrêن kurd pêk tê. Xwende û rewşenbîrêن ku ji avisbûneke bi qolincê xurt zane. Li welatên paşdemayî gî-handina rewşînbîran karê herî zehmet e. Komek rewşenbîrêن ku ji vî karê zehmet hatiye holê, iro her ku diçe ew û hevwelatiyêن xwe ji hev bi dûr dikevin. Em tenê bi hesreta welêt û bi hesreta vegerê dijîn. Lê dem û dîrok li benda me ranaweste. Welat tê guher-tin, bi zorê an bi xweşî jiyanâ gundîtiyê ji navê radibe, jiyanekê bajarvaniyê li welêt dest pê dike. Kal û pîrêن dema, wefat dîkin, zarokêن ku piştî me çêbûne, iro bûne keç û xor-têن gîhiştî. Kevnehevalêن me yên mirine, yên hatine kuştin û yên ku baz dane. Malba-têن me ji hev de ketine. Nas û meriv û malmatên gelekan ji me ji welêt bar kirine, li bajarêن mezin bi cih bûne. Niha, welatê ku di xeyala me de ye dûrî resimê zaroktî û xor-taniya me ye. Her rojekê ku derbas dibe, me û welatê me ewqasî ji hev bi dûr dixe, reheke me diqete. Xewn û xeyalêن me, fentezî û daxwaziyêن me û welatiyêن me ji hev bi dûr dikevin. Em li biyanistanê, di qalikêن xwe yên teng de bi hesret û evîna welêt dijîn. Di nava jiyanekê modern de, em li nostaljiyê digerin; dilê xwe pê xweş û şâ dîkin.

Bi kurtî ez dixwazim bi çend hevokan gotina xwe bi naveroka vê hejmarê ve girê bi-dim; li vî welatê ku Descartes jî demekê jiyanâ xwe ya sîrgûnê lê domandibû, rawestan-dina li benda Godot êdî bêmane ye. Ji bo ku em jî wek Nûredîn Zaza li biyanîstanê serî daneynin, vegeراكه mîna ya Gandî ji me re pêwîst e. An na wê lîstika Pinîkêr jî me xelas neke û em ê serpêhatiya Mamosteyê Bêreng bijîn.

Bi hêviya hevdudîtina li welêt û li welêt geşkirina ziman, edebiyat û kultura kur-dî...

DO

Do...

Dîsa tu

hatî bîra min

Şev reş bû

Tarî...

Tarîstan

Dîsa deriyê derdan

Li min vebûn

Jî kulan re

dil bû nîşan

Do

Dîsa min

Qutiya dil

Jî te re vekir

Û ez...

Bi xiyalan re

ketim şer

Bi evînên

mirâ

û nîvcû re

Min kir ceng

Qêrîna min

bihîst kerran

Dîsa te serî neda

Û ne jî

Jî te derket deng.

Felat Dilgeş

DERPIYÊ SOR Û ALA TIRK

Edip Polat

Zengilo... Gundê Şêxan... Di navbeyna Bismil û Farqînê de cîh girtiye. 15-20 malbat tê de dijîn. Heta sala 1950'yi, ev gund bi qeza Farqînê ve girêdayî bû. Ji wê demê vir ve, pêwendiyên gund bi qeza Bismilê ve çêbûn. Li hember wî, gundê Zeko heye, gundê Pîrhesamê û Gilgilo jî gundên cîran in. Seba vê yekê, di nava gel de wuha tê gotin: "Zeko, Zengilo. Pîrhesamê û Gilgilo."

Her du gund (Zeko û Zengilo) li hafa hev, li ser du giran cîh girtine. Di nava wande, newal û çemek diherike. Havînê, heke di mesîla çem de çend golên avê û xiç neyên dîtin, mirov nizane da çemekî wilo heye an tuneye. Ava wî wilo kêm dibe û diçe nêzîkî çikandinê. Lê belê di mehêن biharê de, ji vê xewê şiyar dibe, dike fir e fir û pêl dide, ji ola xwe dertê, hêç dibe, mîna ku heyfa çikandina havînê hilîne gurr dibe û zinaran dixe bin xwe. Bona ji masiyên nav xwe re bibe sitarek bêxetere, ew şolî dibe. Ev çem tenê hêlinâ masiyan e, tenê cîh şongeha reqsa werdekan e?

Çemê Zengilo, Çemê Zeko, Çem Elodîna... Ew di ber kîja gundî re biherike, ji alî

gundiyan ve navê wî gundî lê tê danîn. Weke merekî Zîya li vî alî-wî alî xwe dide, diherike bê bêhndayin. "Marê Ziya" biharê hêç dibe û havînê radiweste. Xwedê dizane, çend egît û mîrxas di gerînekên wî de feti-sîne!

Li vê herêmê kîjan gund bê çem û gol in? Kîjan çem bêyî gundan diherike? Jixwe av û jiyan çiqas bêyî hev dîbin!

Riyên van gundan, mîna çemên xwe bi fetlanok in, lewma leşker riyên van gundan şas dikin, bi hêsanî hîn nabin.

Li vê deverê, her gund bi çemê ber xwe re dikeve gotübêjekê. Gava lehî radibe, xuşina ava çem dibe lorîna zarokên dergûşê, vê herêma bê çiya, van gundên bê quşûr ji wan mewer, best, gir û newalan re bûne nexşen gulên li ser fistanê qedîfe. Li alî rojavayê gundê Zengilo. Dala Hewra û Kanîya Mezin bi bayê hênik û sivik gund bawesîn dikin. Li raserî gund, nêzîkî Kaniya Mezin daristana fêkiyan destpêdike û hetañî jêra gund dide ber xwe. Ji vê, sêvê şîn, xox û hirmê bêhna xwe belav dikin û dixin nava hilma evîndaran. Gelo, heke ne ji darêñ bihîvîn mezelêñ gund bûwa, zarok,

seng û sîpele sebra xwe wê bi çi baniyana? Wan hêja bi kerikîbihîvan diqedandin. Newala Waşa -ku seranser ji jora gund hetanî ber çem tê- qermûçek kûr di ser çavê gund de çedike. Darika Remo, Qotikê Teyran û Besta Sorka... Van navan, di şevbêrkên Zengilo de gelekî cîh digrin. Lî xasima, niha ku behsa Darika Remo dibe mîna ku xencerek li kezeba gundiyan bikeve, ew dikesirin. Ji ber ku, êdî ew dara tuyê nîn e. Li cîhê wê cot tê kirin. Ew roj reş be ku şivanê gund dicemide û bona xwe germ bike di qurma wê de agir vêdixe! Çavê wî şivanî birje, sitûyê wî bişkê! Malûm e, hingî dareke pîr bû, qurma wê êdî riziyabû û nava wê vala bibû. Mîna extiyerekî ku zexm û bejndirêj be, lî nava wî xera bûbe wilo nava Darika Remo jî pûç bibû. Gava şivan li qurma wê, di cihê vala de agir vêdixe, pêşî nava darê û cihêñ hişk pêdi Kevin. Dû re agir li hemî deverên canê wê belav dibe. Mîna mîrovekî ku qengrêñ ji linga ve destpêbike û li canê wî biçêre. Weke "agirê ku bikeve daalê, ter û hişk bi hev re bişewutin." Hey dunyayê! Hebûna wê darê bi avakirina gund re, terhikî û balixî û extiya-riya wê bi Zengulîyan re derbasbibû. Di bîharê de, her tuyekî mîna pêçîyan, dirêj di-girt, di pelên şîn de dixemîlî û bi gundiyan re dikenîya.

"Rebbî!... Ew şivan bi sosretek giran he-re, xêrê jî xwe nebîne bila!" Gava Xaltiya Elîfê şewutîna pîra sedsalî bîhist, ev gotin ji devê wê pekiya, destê xwe xiste nava xwe ya tenik û bi ser çokêñ xwe yên hişk û qert-ve, xwe berra erdê da.

Xaltiya Elîfê; extiyara gund, pîra 95 salî,

dîroka gund a candar bû. Serpêhatiyêñ wê, serpêhatiyêñ gund bûn. Bûyerêñ ku wê dî-tibûn di axa gund, di bax û baxçen gund, di deşt û newalêñ wî de qewumîbûn. Di çena Elîfê ya qewarî de, di qermûçekên ser çavê wê de derd û kulêñ Dunê veşartîbûn. Damarêñ destê wê şîn û repisî bûn, mîna rehêñ darê jî hev pejkîlî bûn.

Hetanî çökêñ wê qerimîn li erdê rûnişt û li axê nihêrt. Kûr fikirî: Hate bîra wê ku di qîzaniya wê de, dema Darika Remo hêja terhik bû, wê ew çiqas av dabû. Ponijî bi ser rojêñ ku şivan li bin siya wê pez mexel dikir û wê jî şîr ji miyan didot. Di qêreqija nîviro de, pîrekên Zengilo li ser riya wê rêz dibûn, diçûn bêriyê... Bi van ramanan ra-hîst darikekî û bi ponijandina xwe re, li ser xweliyê xêzikân çêkir, heta çökêñ wê dîsa tevizîn rûnişt û li erdê, di nava xeyalêñ xwe de winda bû. "Ma qey ew tenê dara tuyê bû? Ew gundiyej ji cîranêñ me bû. Wa wey lê, wey li min porrûrê! Extiyara Qir-nê Çarda, dîroka Gundê Zengilo êdî tune-ye! Di dewsa wê de çend êzingêñ şewutî û qırşik mane."

Xaltiya Elîfê... Dîroka jîndar, pîra Zen-gulîyan... Darikê wê di nava axê de, li ser terhikiya Darika Remo difikirî. Hey felekê! "Dunya weke siya darê ye, ji kesekî re nadomîne." Wê demê ew jî xanimek bûkînî bû. Bejndirêj û rû-tenik. Bi mîrê xwe yê yekemîn (Elîfê gelek caran mîr kirîbû), bi Hemîdo re hêja nûh zewicû bû. Darika Remo jî gihîst, mezin bû û terk li canê wê ketin. Bi her terkeke bejna darê re, qermûçek li rûyê Elîfê jî xuya kirin. Darika Remo balix bû, siya xwe pirr kir û şax da. Mîrê

wê Hemido, şaxek ji canê darê jêkir. Şaxa yekemîn bû ku ji bedena wê dihat jêkirin. Mîna ku qîzaniya wê jê sitendibin (qîzaniya Elîfê jî bibû para Hemîdo). Piştire, mîrê Elîfê ew şax ji xwe re kir misas... Xaltiya Elîfê di ramanan de winda bû, darikê destê xwe şikand û çû sala 1925'a.

Jiyana xwe û Hemîdo, gîhiştina Darika Remo dan ber hev. Wê demê, ew li cem Hemîdo Bûkeke terrûteze bû. Wexta wê bû, fîstanê dirêj û melesî, ji wan kirasen pîrekê Dêriki'yan li xwe dikir. Di nava wî fîstanî de, bejna wê dirêjtir dixuya. Temeziyek zer li ser eniya xwe dipêça. Tûyên Darika Remo hêja kerik bûn...

Bûyerek girîng li dar diket. Nûçeyek di gîhişte gund: Hinekan digot nefîram rabûye, çend kesan behsa Sefyan dikir, çend ke san jî digotin na, Şêxan serî li hember Romê hildaye. Hawîr mij, tarî û dûxan e. Roj ji asîmanê sayî xeyidiye. Li hewa bêhna xwînê tê. Mirov dibêje qey Teyrê Baz ji behrê firiyyate, têjikên xwe di avê de hiştiye. Roj, ji asîmanê hefta, hatiye yê yekemîn. Bihara ku çav ji Dunê re dişikîne, xêr ji xwe nabîne. Darika Remo hêşîn nebûye, pel nedaye û nexemiliye, di şax û şilanen de nexemiliye. Mîna qîzeke xama por û kêziyên xwe şeh nekiriye, pelên wê li vî alî-wî alî belav nebûne. Xaltiya Elîfê hêja bûka destbihinne ye, keziyên sorî-sosinî li nava piştê dikevin... Her cîh tarîgewrik e û her tişt di rengê ariyê de ye..."Gundîno! Malîno! Rabin, karê xwe bikin û xwe girêdin!" Qêrina Şêxê gund diçû di taxa jêrin re der diket:" Dibêjin Şêxê Palo û Bavê Tûjo serî li ber Romê rakirine! Hûn hêja di xew de

ne gidî!" Hêvî pijkuvî, hêvî fêkî bû, avê tamsarkî çikiyan.

Hêvî şîlan da, ava kaniyên şêrîn ji nûh ve herikîn. Bi dengî re, wê jî daw û delinga xwe hildabû, kirasê dirêj û melesî li nava xwe pêcabû, çarika çûtikkirî li dora serê xwe gerandibû û bangî Hemîdoyê mîrê xwe kiribû!: Peyayê mino, malxwoyê mala mino de rabe! Te hewqas ramana Kurdayetiyyê dikudand, tu ci sekiniyî malnemîrato! Dibêjin Şêxê Palo bajarê Diyarbekir siten diye, tu hêja sekiniyî? Ka mîrê civat û caxiyan tu bûyi? Ka peyayê sivik yê roja giran tu bûyi? Ma tu çîma nalibîtî, jana zirav li te xistiye? Qey çokêñ te ji tîrsa sist bûne? Ziravê te qetîyaye? Hey min çarika xwe li serê te kiroooo!... Ma Hemîdo, piştî van galgalan karibû bisekiniya? Wî hew xwe girt û teqîya: "Wah! Ez Hemîdo me, kilê çavê te me lêêê!... Ka tu wê misasa min a ku min ji Darika Remo jêkiribû jî min re bîne!..." Dawiya sibatê bû, belekên berfê hêja nûh rabibûn.

Xaltiya Elîfê darikê xwe ji nava axê der xist û rabû piya, wê gavê mîrê wê li ber çavê wê bû: Hemîdo li misasa destê xwe û li bizmarê serê wê dinihêrt. Tivinga dirêj a Elemanî dihat ber çavê wî. Bizmarê serê misasê jî nîzeyê(singoyê) serê tivingê bû. Bi "tivinga" xwe ya darînî, dirêj û serî bi bizmar girt û piyê xwe li çaroxê xist. Piştî ramûsana Elîfê, tevî dilê xwe yê bi xem, xeyal û tev birîn, bi rê ket. Çeka misas di dest de, hetanî ber destê êvarê bi peyatî meşiya. Gihişte ber bajêr. Li nêzîkî gundê Tilelo, denge balafirekê bîhist. Bi çavekî li misasa destê xwe û bi çavê din li kambaxa balafirê

mêzekir. Mîrata Teyyarê tuxumê Kurdan tirsandibû, ew tucar nebîbûn xweyî balafir.

Hemîdo tırsiya û kete bin kema dirriyê, xwe civand hev û dilê wî çarqopal lê xist. Xwe quncufand ser hev, sekînî û xwe tev neda heta ku balafir derbas bû. Dû re, ne-ma taqeta çûyina şer di xwe de dît. Ji hewe-sa herbê tiştik ji pare nema, Hemîdo ma qalikê vala. Rakir misasa xwe, lê mixabin ew êdî ne tivinga Elemanî bû, dîsa guherî-bû darê misasê. Misasa darîn ajot. Ew êdî karibû pê li gayên cot bixe.

Gava Hemîdo vegeriya gund, nihêrt ku çi bibîne! Tevî zarok, pîrek û extiyaran, hemî kes civiyane, qare-wareke wilo, hêwur-zeyek wilo heye ku ya sitar! Dengê tukesî naçe hevûdin. Nûçeyek li gund belav bûye; dibêjin hêzên leşkerê Şêx Seid têkçûne, hemî hatine kuştin. Dibêjin qirkirinek li kuçen Diyarbekira xopan çêbûye, xwîn laşan hiltîne.

Qaşo Şêxê Zengilo jî alîkarê serhildanê bû, lê belê bi gurîna çend balafiran re gazî gundiyan kiribû.” Gelî gundî û cîranan rabi! Lez bikin, potikekî(paçekî) sor peyda bikin, bi serê darekî ve girêdin û li ser bani-yekî biçikînin. Rengê sor, nîşana ala Komara Tirkîyê ye. Zûka, destê xwe sivik bigrin, hindik ma teyyare bi ser me ve werin. Ew dê me edim (maf) bikin. Nîşana teslîmiyeta me, ala Tirk e, ango potikê sor e. Bila teyare bizanibin ku em teslîm dîbin û em jî Tirk in.” Bi vê gotinê re, gundiye-kî delingek (derpiyek) sor anî, bi serê silixekî ve girêda û wî darê silix li ser banekî ci-kand. Delinga jinikê, li ser xanî sor dikir, bayê lê dixist û li vî alî-wî alî pêl dida. Mê-

rê jinika xwediyê delingê jî, li ber delinga jina xwe (ku êdî bibû ala Komara Tirkîyê) di amadehiyê (hezirolê de) de sekînîbû û çend dilopêن histirêن çava li ser rûyê wî di-xuya. Hemîdo, hêja nûh ji rê hatibû, westi-yabû û li ber derî disekinî. Gava Elîfê çav pê ket, mîna miroveke ku çav bi neyarê xwe bikeve, çavên wê bûn kasikêñ xwînê û awurêñ wê tûj bûn. Nêrîna xwe kir tîreke zirav a ji agir, li nava kezeba mîrê xwe xist. Hemîdo serê xwe berjêr kir.” Çav ji çavan fedî kir.” Li misasa destê xwe nihêrt û serê xwe berjor kir, delinga sor a li ser xanî pêl dida.

Xaltiya Elîfê ji xeyalêñ xwe şiyar bû, di kolanê de hêdî hêdî meşîye û careke dawîn li ser milê rastê zivirrî û li alî newala Darika Remo çavêñ xwe sê car neqand. 

2.7.1994


ŞAÎRÊ TIRK CAN YÜCEL

Mahmûd Lewendî

Şair û nivîskarê Tirk Can Yücel di 1926'an de li Îstenbolê ji dayik bûye. Kurê Hasan Alî Yücel e. Li Ankara'yê di DTCF (Fakulta Ziman, Tarîx û Coxrafayê) de beşê Filolojîya Klasîk xelas kiriye. Piştre li Îngiltereyê di Üniversiteya Cambridge de xwendiye. Demekê li Londrayê di radyoya BBC de kar kiriye. Piştî ku vege riyaye Tirkîyê li Bodrumê ji bo tûrîstan rehberî kiriye, paşê li Îstenbolê bi cih bûye û di karê wergerê de jiyana xwe domandiye. Helbest, werger û nivîsên wî bi piranî di kovarêن Yenilikler, Beraber, Seçilmiş Hikayeler, Dost, Sosyal, Adalet, Şiir Sanatı, Dönem, Yön, Ant, Imece, Papirüs, Yeni Dergi, Birikim, Sanat Emegi, Yazko Edebiyat de derketine.

Piştî salên 1965'an Can Yücel dest bi nivîsên sîyâsî jî dike. Wî di helbest û nivîsên xwe de bi piranî iîronîzm, "mîzaha reş" û hîciv bi kar anîye.

Berhemêن wî: *Yazma* (1950), *Sevgi Duvarı* (1973), *Bir Siyasının Şiirleri* (1974), *Ölüm ve*



Oglum (1976), *Şiir Alayı* (1981), *Rengahen* (1982), *Gökyokuş* (1984)

Her çendî wergerandina helbestan zehmet e. Ü tew bi ser de şâîr jî Can Yücel be, zehmettir dibe, lê dîsa jî me hewl da xwe, me çend helbestên wî ji Tirkî wergerandin.

XIYARARSÎ

Ez dibêjim "xiyar"
Dibêje, "na, ez turşî me!"

HELA BINÊRE!

Her tişt buye xurde
Lê dîsa jî li ortê perê xurde tuneye!

12 Adar 1980

ŞITIFİN*

Dema ku bi tenê dimînim ez,
Yanê gava ku Güler ji min direve
Hemû lambeyan vêxistî dihêlim bîst û çar saet
Du radyo hene, herdulan jî vedikim ez
Nanekî tam dikirrim li şûna nîv nanî
Û "Îro mastekî mezin bide min" dibêjim ji dikandar re

Yê ku bibîne wê bibêje qey dawet heye!

*Şitifîn: Di maneya "kaçamak" a tirkî de hatiye bikaranîn.

JI DEVÊ KURT AHMED*

Bavê min bi rastî zîrek bû
Ezê di demeke herî nêz de xelas bim lawê min! digot
Ji vê cehaletê
Ezê xelas bim, lê
Ku şûna wê bi tiştekî din danegrim?

*Kurt : Gur

JI ME RE JÎ DIBÊJIN ÇEQOKÊŞ

Her tim tebeşûr di bêrîka min de ye
Dema ku li kolaneke mûtena
Li ser derîyê baxçeyê koşkekê
Rastî wê lewha
Dîqqet (du nuxte li ser hev)

DI VÊ MALÊ DE
KÜÇIK
HEYE

têm, bi herfên mezin
RAST E
dînîvîsim.


Wergera ji Tirkî:

Mahmûd Lewendî

Çavkanî:

- Kurdakul, Şükran; Şair ve Yazarlar Sözlüğü, 1985, İstanbul, r. 669
- Batur, Enis; Kara Mizah Antolojisi, 1987, İstanbul, r. 148
- Yazko Edebiyat, (kovar), İstanbul, No: 10 (1981)

EZ DIFIKIRIM LOMA EZ HEME



Serefhan Cizirî

Cogito, Ergo sum" ango " Ez difikirim, loma Ez he-me", ji pirr aliyan de bûye weke simbol di dîroka felsefê de. Rene Descartes ji hemû tiştan şık dikir û ev yeka jî weke metodekî ilmî diparast. Şika Descartes şika metodolojîk bû. Li gora Descartes mirovan dikarîbû ji hemû tiştan şık bikira. Lê belê ji fikirandinê, mirovan tu cara nikarîbûn şık bikirana. Tenê fikirandin rast bû, tiş-tên din dikaribûn çewt an jî derew bûna. Wexta ku filozofê mezin Rene Descartes (1596-1650) ev dîtin pêşkêş kîrin, wê çaxê pelekî nû di dîroka felsefê û ramanweriyê de destpêdir. Li gora filozofê navdar Bertrand Russell (1872-1970) felsefa Rene Descartes destpêka felsefeyeke nû bû. Felsefa skolastik ya ku bingehê xwe ji otorîteyê kevnare digirt, bi felsefeya Descartes re dawiya wê hat û vê felsefê desthilata xwe gav bi gav winda kir. Beriya Descartes dîtinên nû li ser ilmê xwezayê ji aliyê Kepler û Galileo ve hatibûn pêşkêskirin. Descartes di bin tesîra fizîk û astronomiya çaxê xwe de mabû. Ilmê xwezayê di vê demê de şoreş kiribû. Fikir û dîtinên kapitalîstî hêdî hêdî di civatê de cih girtibûn. Di pirr warêن civatî de dîtinên Humanizmê, Ronesansê û reformîzekirina tevgera dînî pêşde diçûn...

Rene Descartes jî weke pirr kesên demê, li Ewrûpayê, ji ber fikrên xwe yêñ felsefi pirr caran penaber bû. Ew li Ingîlistanê, li Hollandayê, li Almanyayê, li İtalyayê û di dawiyê jî de li Swêdê qismek ji jiyana xwe derbas kiriye. Li cem Kralîçeya Swêdiyan Kristina ew jiyaye, demekê

Kralîçe perwerde kiriye û di dawiyê de jî li Stockholmê wefat kiriye. Bi kurtî mirov dikare bêje; ji bona ku azadiya fikrî li Ewrû-payê neticeyên baş karibe bigre, gelek bedêl û tekoşîn hatine dayîn. Kes tu heqqan belaş nade hevdû, ji bo bidestxistina heqqên sosyal û mirovî hergav tekoşîn lazim e. Di vî warî de dîroka felsefî û ramanweriyê tijî mînakên baş in.

Felsefa René Descartes hergav hatiye munaqşekirin. Ji ber vê yekê jî li ser felsefa Descartes pirr dîtinê cur be cur hene. Pirraniya caran, dîrokvanê felsefî ji bona ku karibin felsefa Descartes baş fahmbikin û wê rast tercûme bikin, zehmetiyên mezin dikişînin. Felsefa wî bixwe jî pirr têkilhev e. Weke tê zanîn, Descartes hergav ji aqilê xwe destpêdike, xwedî dîtinê xwe ye, bûyeran li gora xwe tercûme dike û bersivêñ wî yên bi taybetî jî hene. Ev jî tê vê manê ku di felsefa Descartes de "Ezîti" dikeva obje-ya navendî û hemû xweza, civat û bûyer li gora vê "Ezîti" yê têne tercûmekirin. Netîca vê yekê jî ji aliye dîrokî de dibe metode-kî nû ku divê bi hemû awayan were hû-nandin, necirandin, rastkirin, ávakirin û parastin.

Di felsefa Descartes de gervanî roleke girîng digire. Weke ku me li jor jî bahs kir ew li gelek welatêن Ewrûpa geriyaye û pirr tişt bi çavêن xwe dîtine. Bi alîkariya gera xwe wî mirovêñ nû, derdor û îmkanêñ nû dîtine. Ger, dîtin û tecrûbeyên nû alikarî dikirin ku ew bi dîtinê nû li pirsgirêkîn civatî û felsefî binêre. Ji bo ku dîtin û me-

todêñ xwe yên nû biparêze ew hinek avanî û hosteyê wan mînak dide. Descartes dibê-je; Avanî û berhemêñ mezin hergav ji aliye yek mîmarî hatine plankirin û avakirin. Ev avanî piraniya caran bedew û heygirtine. Lê belê avanî û berhemêñ ku ji aliye çend hosteyan bi hev re hatine avakirin, pîr caran dikarin mekroh û tevlîhev bin. Bi kurtî mirov dikare bêje ku pirrdengî, diyalog û demokrasî li ba Descartes zêde ne girîng e. "Ezîti" dermanê hemû derdan e.

Beriya felsefa Descartes, metodêñ ilmî ji aliye otorîteyên mezin weke Aristoteles, Platon, Thomas Auqwîno û ji aliye Otorîteyên derve hatibûn tespîtkirin. Hemû tişt û dîtinê girîng, van otorîteyên ku me li jor behs kirin, ji xwe ji kevnare de gotibûn. Xebata ilmî di rastiyê de dubarekirina van dîtinan bû. Ji aliye metod de hemû kesan behsa hinek otorîteyan dikirin. Ma Galileo ne ji bona wilo hate mehkemekirin? Ma Giordiano Bruno ne ji bona wilo hate şewitandin? Kesên ku otorîteyên kevnare di warê ilmî de nedipejirandin, zû dihatin mehkûmkirin û ricimandin. Lê bi destpêka şoreşa ilmî re, bi keşifkirinê cografi re, bi xebatêñ ilmî yên xwezayî û rasyonalizma felsefî re demeke nû destpêdikir...

Ji ber hinek problemêñ metodolojîk, Descartes nedixwast ku felsefa xwe li ser adetêñ dîrokî ava bike. Wî dixwast ku ew bixwe ji nû de û ji binî de felsefa xwe destpêbike. Descartes destpêkir pêşî xwe îzole bike û dûre jî bi aqilî bifikire. Bi vî awayî mehkemekirina ramanî hatibû lidarxistin.

Danûstandin ji hebûna objektîf pêşî hatin getandin. Îzolekirin ne tenê bi mana fizîkî bû. Mirov dikare bi hêsanî bêje; ev îzolekirin îzolekîrineke felsefi jî bû. Beriya ku Descartes kesên din îkna bike wî jî xwe destpêkir û pirsgirêkên felsefi, problemên ramanî û di ilm de pirsa metod, pêsiya pêşî ji xwe re zelal kir. Yanî Descartes di xebata metodê ilmî de ez ezîti diparast. Di normên ramanî û avakirina dîtinên xwe de, wî netîcîn xwe li gora prensîbêñez ezîtiyê derdixistin pêş. Pirsa ez ezîtiyê li Ewrûpayê ca-ra yekemîn bi xurtî di qirnê 15 û 16'an de derkete rojeva civatê. Weke tê zanîn bi tevgera ronesans û humanizmê jî ev rojev pirr xurt bû.

Wexta ku mirov metodêñez ezîtiyê ji xwe re bike armanc, wê çaxê divê Emerîka hergav ji nû de bêye keşifkirin. Descartes ji di felsefa xwe de weha kir. Hemû tişt ji nû de destpêkir. Hemû pirtûkên ku li dibistanan dihatin xwendin, bi rexnegîriyeke bi aqil di ber çavan re hatin derbaskirin. Ev pirtûkana ji aliyê pirr kesan de hatibûn afirandin û diviyabû ji aliyê kesekî de bihatina rexnegîrin û kontrollkirin. Metodê "Ezîtiyê" weha emir dikir. Lê Descartes ji, ji aliyekî de filozof bû û ne bêaqil bû. Ji ber vê yekê jî wî nikarîbû bigota ku bila hemû pirtûkên kevnare, bajar, kuçe û avaniyêñ kevin, yên ku bi bêaqilî hatibûn afirandin hemû ji navê bêñ rakirin. Biaqlbûn û bêaqilbûn li gora Descartes tiştek bû, lê li gora pirr keşen din jî ev yeka tiştekî din bû.

Descartes digit ku divê mirovên biaql, li

şûna ku tiştê kevin û bêaqil xerab bikin, ew dikarin tiştêñ ji van baştır têxin dewsa vana. Ew bixwe weha dibêje; "Armanca min ew e ku ez ramanên xwe bi xwe reformîze bikin û li ser bingehê xwe avabikim". Ji vê dîtinê mirov dikare tevger bike û bibêje ku rexnegîriya Descartes heta derecakê hinekî luxs e. Madem ku Descartes ji hemû hebûn û dîtinan şık dike, wê çaxê aqilê selîm jî dibêje ku "ezê çîma bi riya te de bimeşîm"!

Descartes ji metodê xwe pirr memnûn e. Ji ber vê yekê jî ew dixwaze ku hinek şiretan li ilmzanın bike. Şîretêñ wî weha ne; 1) Ilmzan divê tu caran bê îspat, tu rastiyê ne-pejîrînin. Bi wî awayî mirov dikare têkeve pêsiya dîtin û bûyerên şaş. 2) Ji bona mirov karibe lêkolînên baş bike, divê mirov probleman ji hevdu vejetîne û hata îmkan hebe beşê biçûk pêkbîne. Ev sîstem alîkarî dike ku mirov karibe probleman baş analîz bike. 3) Wexta ku mirov bixwaze sîstemeke rast pêkbîne, divê mirov pêşî ji tiştêñ ku bi hêsanî û zû dikarin bêne fahmkirin destpê-bike. Paş re jî gav bi gav divê mirov derbasî zanyariya têkilhev û giran bibe. Yanî bi kurtî divê mirov pêşî herfan (ABC) fêr bibe û dû re jî dest bi alfâbê bike. 4) Di hemû waran de hesab û kîtabê xwe pirr baş bike. Weha bike ku tu tiştêñ girîng, problemen heja û dîtinêñ kûr neyên jibîrkirin û li derive nemînin.

Ev şîretêñ Descartes tiştêñ bi giştî ne. Di hemû waran berhema zanyariyê de ev şîret derbas dîbin. Hemû cûre ilm di xebata xwe



Descartes

de ev şîret baş bikarnanîne. Li gora Descartes, ilmzanayê ku heta niha baş li rastiyê geriyane matematîkvan in. Ji ber vê yekê ji Descartes dixwaze ku bi awayekî metodîk ji cihê ku matematîkvanan destpêkiribûn, lêkolînên xwe berdewam bike. Ew destpê-

dike ku di navbera fenomenên cihê cihê de, danûstandina mitqalên helî biçûk bikoile û hevgirêdana wan derxîne ser rûwe rojê. Ji bona ku ilmzan mitqalên helî biçûk ji bîr nekin, ew dikarin li şûna wana işaretên Cebîr û Geometrî deynin. Armanc bi işaret-

tên Cebîr û Geometrî ev e ku problem hêsanî bibin. Ji bona mînak mirov dikare bîbêje ku zarokekî du salî dikare matematîka hêsanî baş bikarbîne. Du caran dudu 2x2 dike çar. Profesorê matematîkê jî van hejmaran bîne cem hev, netîce dibe çar û zarokek jî van hejmaran bîne cem hev, dîsa netîce dibe çar. Bi kurtî matematîka ku hêsanî ye, ji profesorekî matematîkê û ji zarokekî biçûk re jî weke hevdû ye. Heger mirov bi metodekî baş dest bi lêkolînê bîke, riya zanyariya rastî pîrr hêsanî dibe. Mirov wê çaxê bi yek zimanî bi hevdû re didin û distînin. Rasyonalizma felsefî ku hemû krîtera li dora aqil kom dike, bi vî awayî dibe dermanê hemû derdan. Aqil kîlîta hemû derian bû.

Ev şîretênu ku me li jor behs kirin, di danûstandinê normal de derbas dibûn. Di danûstandinê normal de hemû tişt zelal bûn. Lê wexta ku di civatê de azadî tunebûya, diviyabû ilmzanın jî li gora rewşa rojane tevger bikirana. Li gora rewşa rojane ilmzanın karibûn hinek normên muwaqqet ji xwe re çekiribana. Wexta ku ilmzanın nikarîbûn metodê helî baş di civatê de bi kar bînin, an jî mecal ji bo vê yekê tunebûya, wê çaxê ew dikarîbûn hinek normên muwaqqet ji xwe re çekin. Li gora Descartes ew normên muwaqqet diviyabû ev bin: 1) Hirmet û îtitat kirin ji qanûn û adetên welatan re. Hergav parastina dînê fermî. Ji aliye din jî de divê ilmzanın hergav li gora dîtinênu ku normal têne pejirandin, dîtinênu ku bê mubalexe bin û ji aliye

piraniya kesen ku weke mirovên zekî têne pejirandin, tevger bikin. Xwe li gora van dîtinan tekûz bikin. Yanî bi kurtî, ba ji kuderê bê, divê ilmzan berê xwe bide wê derê!

2) Di kîrinênu xwe de divê mirov xwedî biryar û bahwerî be. Li aliye din jî, lazim e ku mirov bide pey ew dîtinênu ku helî bişik in. Heger mirov bîryar da ji bona van dîtinê helî bişik, wê çaxê pêwîst e mirov tu cara gava xwe paşde neavêje. Descartes vî normî ji bona ci diparêze? Ev bi vê normê dixwaze têkeve pêsiya bê bîryarîbûnê û problemen wijdanî. 3) Hergav bixwaze, li şuna ku zora qederê bibe, pêsi zora xwe bibe. Li şuna ku bixwaze sistema cihanê bigûherîne, pêsi bixwaze ku daxwaziyen xwe bigûhere. Di dawiya dawî de jî, bixwaze xwe li ber bixîne ku mirov tenê dikare hakimî ramannen xwe be û tenê dikare wan kontrol bike.

Li gora van şîretan û norman, mirov bi hêsanî dikare bîbêje ku Descartes opportûnîstekî baş e. Lê weke ku pîrr baş tê zanîn, etîket piraniya caran probleman çareser nakin. Ji bona mirov bikaribe Descartes baş têbigihê, tenê etîket têra mirovan nakin. Beriya hemû tiştî, civata ku Descartes tê de dijiya civateke hov bû. Der û dewletê, li himber kesen muxalif pîrr bi zalîmî tevger dikirin. Di vê demê de kesen weke Galileu hatibûn mehkemerin û Giordan Bruno ji hatibû şewitandin. Ji aliye din de jî Descartes, metodekî pîrr zêde rasyolîstî hilbijartibû. Ev herdu encam, wexta ku li hev siwar dibûn, netîca vê yekê bê ku mirov baş hesab bike, dibû opportûnîzm.

Metode rasyonalistî, divê hergav alternatifên cur be cur bide ber hevdû. Ev rastiya hanê divê ji bona hemû kesan baş zelal be. Lê ev rastiya hanê bi xwe, tehlükakî mezin bi xwe re peyda dike. Wexta ku mirov alternatifâ xwe tenê li gora daxwaziyê civatê hilbijêre û li gora wê tevger bike, wê çaxê xebata ilmî û rûmeta karê entellektüeliyê, pirr bê mane dibe. Pîvan, nikarin tenê daxwaziyê civatê an jî daxwaziyê desthilata politîk bin. Li gora pîvanên ilmî çi rast be, divê ilmzana jî, pêşıya pêşî li gora pîvanê ilmî tevger bikin. Ewê ku tenê li gora daxwaziyê civatê û desthilata politîk tevger bikin, ew kesên oppotûnîst in.

Li aliyê din şîret û pîvanên Descartes, di rastiya xwe de pîvanên arîstokratan e. Ji bona ku mirov karibe li gora van şîretan tevger bike, divê berî hemû tiştî mirov bettal (bêkar) be. Mirov dikare bipirse; ma gelo îmkan û wextê kê heye ku karibe evqas tiştan fêr bibe? Ji bona ku mirov karibin ji-yana xwe bidomînin, divê ew kar bikin. Tenê kesên dewlemend û halxwes jî vê ye-kê mehrûm in. Mirovên normal û kedkar tenê nikarin bifikirin, lê belê divê ew tevger jî bikin. Weke ku em hemû dizanin, tevger jî praktik e û tecrûbe ye. Lê metodê rasyonalistî bê tecrûbe û praktik, di rastiya xwe de zêde bikêr nayên. Aqilekî ku ji praktik û jiyanê dûr be, di rastiya xwe de ne tu aqil e. Wexta ku praktik, tecrûbe û aqil bi hev re tevger bikin, wê çaxê aqil dibe aqil! Metodê rasyonalistî divê bi metodê ampirî re yekîtiyeke pêkbînin. Yanî bi kurtî divê tecrûbe û aqil hevdû timam bikin.

Ji aliyê din de jî, mirov dikare bibêje ku;

felsefa Descartes problemên di navbera raman û hebûnê de tîne ziman. "Ez difikirim, loma ez heme" felsefa îdealistiyyê derdixîne pêş. Bi kurtî ev dîtin dixwaze bêje ku hebûna fikrî, hebûna mirovan ya gewdeyî tayîn dike. Ew dîtin di dîroka felsefê û ramanweriyê de, bi pirr babetan ve hatiye formulekirin. Ji xwe weke ku Fredrich Engels jî gotiye, hemû munâqşeya felsefî û ramanî li ser vî bingehî dimeşin. Di dawiya hemû munâqşayan de pirs, li gora bersivîn metodîk têne danîn. Îca wexta ku Descartes dibêje; "Ez difikirim, loma ez heme", ew di rastiya xwe de dixwaze bibêje ku ruh heye, Xwedê heye, manewiyat heye û hêzên ku ji mirovan mezintir in hene. Ev hêz û gewdê mirovan ji hevdû cihê ne. Li gora Descartes, di jiyanê de dualizm heye; yanî gewde û ruh heye. Em hemû dizanin ka gewde çi ye. Lê ruhê ku Descartes behs dike weke objeya geometrî ye. Weke tê zanîn, di geometrî de dawî tune. Bi kurtî mirov dikare bibêje ku ruh, yanî Xwedê bê dawî ye. Ji vê "rastiya" han jî tu kesa şik nedikirin.

Di dema ku Descartes jiyaye, ev dîtin û şika felsefî, ji aliyê der û dewletê ve pirr caran hatine mahkûmkirin. Ji bona dîtinên xwe Descartes mahcir bûye. Divê mirov vê yekê tu carî ji bîr neke. Lê bi dîtina min, heger ew iro bijiya, wê dîtina xwe weha bigûheran da: "Ez heme, loma ez difikirim!". Ewê iro Descartes ne li ser serê xwe, lê belê li ser ligê xwe bisekiniya û felsefe bikerâ.

MILKÊ EVÎNÊ

Min milkekî heye li wê deverê
Serkaniya evîn û geş-asoya xweziyan
Karîna jiyana min
Bi rik jê dizê.

Milkekî diherike û tê
Dastan e, ji xewnan vekhonandî
Milkekî difûre, belê
Gewlaz e, ji axîn û keserê
Ku hê ji “Qalûbela”
Tarîx e, li enî û
nûsîn e, li bextê me.

Milkekî ji navserên li Mûnzir û Agirî
Serejêrî Xaniqînê dibe.
Gava roj dibişire li Mahabadê
Kerresî digermijin ji kêfa
Li dolik û mesîlên di Efrînê
Li wan berwarêن Çiyayê Kurda.

Min milkekî heye, ku lê
Her deq-qe
Perçeyek min
tête kuştin
di ber da
Û jê
Her deq-qe perçeyek min
ji nû ve dizê.

Rojen Barnas

MAHATMA GANDÎ

(1869-1948)



Mirovokî sergiran û aram, xwedî semax û pijiyayî, sergiran û bihêvî, pispor û ewle, hevdemê heyama xwe û nuha, bi rûmet û bêpaxaf... Hêviya gelê xwe û bi mîlyonan gelên bindest û belengazên dinyayê. Hêviya azadî, rizgarî û aştiyê. Hêviya jiyanekê birûmet, jiyanekê têr û tijî, jiyanekê dûrî bindestî, koletî û xizaniyê. Pêşevanê wekhevî, biratî û dilsoziyê; Gandî yan jî "Mahatma", ango "ruhê mezin".

Heyama Mohandas Karamchand Gandî, bi navê din Mahatma (ruhê mezin) Gandî, di Çileya Paşîn a sala 1948-an de ji aliyê nîjadperest û olperestekî Hîndû ve hat kuştin, ji çaraliyê dinyayê bi sedmîlyonan meriv li ser "Bapû" (Bavo) digiriyan, di kuçe û kolanan de xweî bi serê xwe ve direşandin û li çokên xwe dixistin. Kevoka aştî, azadî, wekhevî û biratiyê koç kiribû; gelên Hindîstanê bêyî "Bavo" û "Ruhê mezin" mabûn. Gelên cihanê yên bindest, belengaz û mirovperwer, bi kuştina serokê zîwer û hîmdarê fikra aştî û mirovantiyê xwîn digiriya; xemgînî û bêhêvîtyeke mezin ketibû nav kesên mirovperwer û rûmetzan.

Ji çar aliyên dinyayê, ci ji teref serok û pêşevanên dewletan û ci ji ji teref mirovên xizan û belengaz, bi dehhezaran nameyên serxweşiyê gihîştibûn hukûmeta Hindîstanê. Gandî wek resmî di idarekirina dewlet û hukumetê de cih û wezîfe negirtibû, ne dewlemend bû û qesr û qonaxên wî jî tunebûn. Gelo hîkmeta vê şâheşahê û xemgîniyê ci bû? Cîma gelên cihanê qedr û rûmeteke wisa dida vî zilamê zirav û dirêj; xwediyê kirasê sipî? Wî qedr û en-

Mihermed Dehsîwar

cama xwe ji ci sitandibû?

Porbandar bajarê ji dayikbûna wî ye. Gandî di sala 1869-an de li vî bajarê piçûk û nêzî Okyanûsyaya Hindê, di nav civaka Hîndûyan de, ji dêubavê Hîndû tê dinya-yê. Wek piraniya bajêr, malbata Gandî ji her roj diçûn perestgeha hîndûizmê. Xwarinên goştîn, ji malbatî ve tam nedikirin; ew hem ji bo siheta wan ne baş bû û hem ji di germahiya welêt de nedihat kişandin. Diya wî gelek caran rojî digit; ji bo siheta xwe, yan ji di ber xelkê de weke gazî.

Rojîgirtina diya wî, dê li ser Gandî ji tesî-reke mezinbihêle. Di kamiliya temenê xwe de, Gandî bi protestoyên rojîgirtinê nehişt ku nexweşî û birakujiyên mezin biqewi-min. Hetta ji ber rojîgirtinê, çend caran dikeve rewşike pirr xerab û halê mirinê ji. Lê wî dizanibû ku protestoyên wî, bi kêtî gelek tiştan dihatin. Xwedê rojî jê re "li hember xerabiye, bi taybetî şandibû" û diviya ku rojî di riya qencyiyê de û li dijî sitemkariyê bikata bikaranîn.

Gandî ji di zarokiya xwe de, carinan bi diya xwe re diçû perestgehê, lê xwe li wir nerihet hîs dikir. Hebûna pût û latan zew-queke zêde nedidayê, lê tevî vê ji li kêleka diya xwe rihet û dilşad bû. Diya wî zarokan fêrî başî û qencyiyê dikir; li gorî wê, derew û neheqî yan ji zilm û zordesû, ne karê mirovan bû. Gandî, xwişka xwe û herdu bira-yên xwe yên din, ji dê û bavê xwe aramî, û semaxê, sergiranî û rûmetê, hêvî û hurmetê fêrdibûn.


Bavê wî di hukûmeta Porbandarê de we-

zîr bû û bi her awayî alîkariya kesên hejar û belengaz dikir. Ne bi tenê alîkariya kesên Hîndû û yên ku bi zimanê gujaratî diaxi-fin, her wiha alîkariya misilman û bûdîstan ji dikir. Di tevaya Hindîstanê de, bi tenê Porbander ji hêla mîr û wezîrên alîcîh ve dihate idarekirin. Lê tevî vê ji, Hindîstan di bin bandora İmparatoriya Brîtanayê de bû û pê ve girêdayî bû. Bavûkalên İngiliziyan ji mêj ve weke piraniya heremê, Hindîstanê ji bi darê zorê xistibûn bindesten xwe û koledarî hîn ji berdewam bû.

Gandî ji xwendegeha xwe nerazî bû û jê ji hez nedikir. Di nav malê û xwendegehê de diçû û dihat. Gava hîn ew gelek piçûk bû, malbara wî ew zewicand. Toreyên ku li Kurdistanê di jiyanê de derbas dibûn, kêm-zêde li vî aliyê cîhanê ji hebûn. Dêubav, ji zarokên xwe yên law re li qîzan digeriyan û ew li gor biryarê dêubavan dizewicîn.

Dema dêubavê Gandî birayê wî yê mezin dizewicînin, dixwazin wî ji pê re biserîkin. Lewra ji jê re qîzeke di temenê wî de, yeke 13 salî dibînin û herdu bira bi hevdû re, bi dawetekê têbî biserîkirin. Destgirtiya Gandî, Kasturbay, qîzeke bedew û sipehî bû, di dawetê de tevî cilêr rengîn û xemla bedew, di milê wî de ber bi riya hevaltiya salêr dirêj ve dimeşıya. Bûk û zave di dora agirê pîroz de, heft gavê sondan avêtin. Sonda lênihêrtina zarokan, a xebata ji bo welêt, sonda li ser sekna sozên xwe û ya hevaltiya ebedâ...

Gandî bi keça 13 salî re ku dê pê re temenekî dirêj û jiyanekî zor û çêtin derbas bi-



Mahatma Gandhi

kirna, zewicî. Dê Kasturbay ji weke diya wî, di jiyanî Gandî de tesîreke mezin û di serkeftina wî de ji roleke mezin bigirta. Heyama ku Gandî li Londonê dixwend an ji li Afrikaya Başûr kar dikir, jina wî zarokan xweyî dikir û bi sebir li pawika mîrê xwe diseokinî. Dema ku wî kîmasî yan ji şasîti dikirin, bala wî dikişand û rastî pêşî wî dikir. Herduyan di tevaya hevjiyana xwe de,

ji hevdû gelek hez kirin û pirr hurmeta hev girtin. Gandî pişt re, dê ew di serpêhatiyên xwe de weke dost, heval û mamoste bi nav bike. "Ger ne ji wê bûna, min van fikrên li dijî şidetê û ji bo aştî û azadiyê nikaribû kamiltir bikirana." dibêje Gandî û berdewam dike: "Guhartinên mezin, bi raman û sebra wê, bi alîkarî û semaxa wê bi ser ketin"

Bavê Gandî, piştî zewaca wî bi demekê

nexweş dikeve û dikeve nav ciyan. Gandî bi kêt û bi sebir bavê xwe xweyî dike. Ew bi xwe jî hê zarok e, lê bi nexweşketina bav re, ne bi tenê zewac, her wiha xweyîkirina malbatê û lénêrîna bav jî dikeve sitûyê wî. Di temenê zarokiyê de barekî mezin û pîr giran dikeve ser milên wî. Piştî çend mehan, bav diçe rehmetê û ew dîsa dest bi xwendegêhê dike. Lê piştî nexweşîn û mirina bav, rewşa wan a aborî jî xerab dibe. Dostekî bavê wî rojekê pêşneyar dike ku ew here li Londonê bixwîne û bibe ewûqat. Gandî bi vê pêşneyarê gelek kêfxweş dibe, lê ew dixwaze bibe doktor. Diya wî, çûna wî ya Londonê bêdil qebûl dike. Ji ber ku xortêñ diçûn Londonê û li wir dixwendin û li wir demeke dirêj diman, dev ji kultura xwe berdayî, hay ji xwe nemayî vedigeriyan welêt. Di ser de jî fêrî vexwarina araqê û xwarina goşt û yên ku ji siheta meriv re ne baş bûn, dibûn. Lê Gandî soz û bext da diya xwe ku ewê xwe fêrî van xerabyan neke.

Xwendina wî sê salan dom dike û Gandî di van salan de li ser sozê ku dabû diya xwe, disekine. Dema ku nuh çûbû Londonê, li xwaringeheke vegetaryan (bêgoş) geriyabû û piştî ku cîhekî wisa dîtibû, bûbû endamê komeleya vegetaryanan. Piştî xwendina sê salan, Gandî dibe ewûqat, ci-lêñ xweşik û sipehî li xwe dike. Li Londonê gelek kesen ji ol û neteweyêñ cuda nasdiye û bi wan re dibe dost û heval. Încîl, Tewrad û Zebûrê jî dixwîne û ji wan gelek tiş-tên hêja fêr dibe. Raman û baweriyêñ wî yên li dijî şidetê, bêtir xurt dibin.

Gandî li ser rewşa welatê xwe bêtir dike-ve xem û ramanan. Împaratoriya xurt û bi hêz, Hindîstanê û gelek welatêñ din xistibû bin destêñ xwe û di bin pencêñ xwe de di-perçiqand. Şidet û sitemkariya dewletê roj bi roj zêdetir dibû. Serhildanêñ herî piçûk û bêplan jî dibûn sedemêñ kuştina bi heza-ran hevwelatiyêñ wî. Lewra jî pêwist bû ku kolonyalîst, ji welatê wî bi awayekî ku zerar neda vî gelî derketina. Diviyabû ku "riyeke din û teze hebe" difikirî, Gandî. Pêwist bû ku ev gel bi zerara herî kêm, bê şewitandin û kavilkirina welêt, bêyî kuştina gel bigihiş-tina rizgariya xwe.

Bi tewabûna xwendegêhê, Gandî vedige-re welatê xwe. Hê ji kêfa dîtina jina xwe û kurê xwe têr nabe, bi xebera giran dihise. Diya wî, çaxê ew li Londonê bû, çûbû ser heqiya xwe. Birayêñ wî, nexwestibûn mirina diya wî li welatêñ xerîban jê re rêkin û wî bi vê xebera nexweş, bê hizûr bikin. Li ser vê xeberê, canê wî giran dibe û dikeve bêdengiyeke kûr. Piştî xemgîniya xebera mirina dê, ser û guhê xwe dide hev û dest bi karê xwe yê praktîkî dike. Lê ew kar ne li gora dilê wî bû û lewra jî di wî karî de bi ser nakeve. Dema tacirekî Hindî ku li Afri-kaya Başûr kar dikir, pêşneyar dike ku ew li cem wî wek şewirdar kar bike, Gandî vê pêşneyarê bê teredut qebûl dike. Wê heyamê gelek Hindî derbasî vî welatî bûbûn û jiyana xwe li wir berdewam dikirin.

Ev xeber, bi jina wî Kasturbay gelek nex-weş hat. Piştî sê-çar salêñ Londonê, niha jî ev cihêbûn derketibû pêsiya wan û ew dê

dîsa ji hev biqetiyana. Zarok jî bûbûn dido û pêwîstiya wan bi bavê wan hebû. Her wiha Kasturbay jî ji hesreta mérê xwe nedixwest ku Gandî here Afrîkayê. Lê Gandî jî mecbûr bû ku malbata xwe xweyike. Hima piştî ku li wir bi cîh bibûna, dê haziriya wan bikirina û wan jî bianîna cem xwe. Jîna wî, bêçare vê yekê qebul dike û piştî çûna wî, diçe li mala bavê xwe bi cîh dibe û li hêviya xebera Gandiyê xwe disekine.

GANDÎ LI AFRÎKAYA BAŞÛR

Gandî ji bo, kar di sala 1893-yan de dev ji welatê xwe, ji mala xwe û hevalên xwe berdide û diçe Afrîkayê. Hê di rê de bela têr serê wî. Dema ji bajarê Durbanê bi trêne derbasî paytexta welêt Pretoryayê dibe, rêwingiyekî rengsipî dixwaze Gandî ji kompartimana sinifa yekem derbasî vagona barbibe. Çawa çêdibû ku yekî nîvreş dikaribû di vargonên sinifa yekem de rêwingîtiyê bike? Cihêن wan ancax di vagonên bar û di nav heywanan de hebû! Lê bilêta Gandî ji bo sinifa yekem bû û wî nedixwest dev ji cîhê xwe berde. Zilamê Afrîkî yê sipî, bangî konduktörên trêne dike û du konduktör, ew tevî walîzên wî ve, ji trêne davêjin. Kesên ku ne sipî bûn, cîhê wan nêzî rengsipyen tunebû û heqê wan kotebû!

Gandî şas û ecêbmâyî, cilên xwe yên belabûyî dide hev û dîsan dixe nav walîzan. Ev çibû gelo? Li Londonê jî ev tişt nehatibû serê wî. Ma çi ferq di nava sipî, reşik û esmeran de hebû? Kê ev mafê heqaret û pi-

çûkxistinê dabû wan? Her çiqas gelekan li Îngilîstanê bi çavên piçûk li wî û kesên weke wî mîze bikirina jî, tu kesî li wan bi vî awayî heqaret û pîkolî nedikir. Gelo dîsa vege riyanâ welatê xwe çêtir bû? Ecêbmâyî û bêgerar mabû. Soz jî dabû mîrik; nizanibû bê wê çi bike. Pişt re rewşa bêkes û belengazên welatê wî tê ber çavên wî; ma ne ew jî wisa dihatin piçûkdîtin û perçiqandin! A baş ew bû ku berdewam bike û soza ku dabû hevwelatiyê xwe pêk bîne. Wekî din jî mecbûr bû ku kar bike û di rojên pêşîn de veger jî li hesabêñ wî nedihat.

Ew bûyera ku di trêne de hatibû serê wî, bûbû sebebê ku ew li ser rewşa Hindiyêñ vî welatî lêkolînê bike û rewşa wan bêtir fam bike. Ji bo wê jî çend Hindiyêñ maldar zi-yaret dike û ji bo pêşerojê sohbet dikan. Dostêñ wî yên nuh ji ber van fikrêñ wî û bi taybeti jî ji ber ewûqatbûna wî, gelek kêfx-wes dîbin.

Gandî di 24-saliya xwe de dest bi karûbarêni siyasi dike. Her hefte diciviyan û li ser rewşa hevwelatiyê xwe sohbet û nîqaş dikirin. Gandî bi bersîv û axaftinêñ xwe, da îspatkîrin ku pêwîstiya van kesan, bi yekî weke wî heye û bi zanebûna xwe da qebûl-kîrin ku êdî ew di praktîkê de pêşevanekî hêja ye. Li gorî Gandî, tu ferq di nav hindû û misilman, cihû û mesîhiyan de tune bû. Ferq bi tenê ji aliyê idarekirinê ve hebûn; kesên serdest, bi zordarî û sitemkariyêñ xwe, bi pîkolî û piçûkdîtinêñ xwe, weke şev û rojê ji yên din, ji yên bindest û kole, belengaz û perîşan cuda dibûn. Ferq ev bû

û bi tenê di vir de bû. Tiştên ku wan jî dicivand serhev û ji wan re bûbû rêbertiya bîratî û wekheviyê, ev bûn.

Ew Hindiyênu ku li Afrîkaya başûr di-man, piştî van civîn û axaftinan, zû bi rewşa hev hisiyan. Ew bi pêşevaniya Gandî û çend kesên din, li hev dicivin û li welatekî xerîb û biyanî, ji bo mafân xwe yên miro-vantiyê, dest bi tekoşîna xwe dikan.

Piştî sê salênu dirêj, Gandî, jina xwe û za-rokênu xwe ji Hindîstanê tîne cem xwe. De-ma jin û zarok diçin malê, Gandî û dostekî xwe yî Ingîlîz bi rê ve dimeşin. Çend xor-tên sıpî Gandî dinasin û dixwazin bela xwe tê bidin. Çend heb bi yê Ingîlîz digrin û yên din jî li Gandî dixin. Gandî bersîva wan nade û lêdana xwe qebûl dike. Li gorî wî, gava ew dest hilîne, dê yên hemberî wî hîn bêtir zalim bibin û wê demê dê rewş xerabtir bibe. Dema jina serokê polisan vê rewşê dibîne, tevî sîwana xwe, xwe dide ber Gandî û wî ji lêdana zêde xilas dike. Piştî ku serokê polisan bi bûyerê dihise, diçe mala wî û wî diparêze. Gava polîs dixwaze Gandî li ser wan xortan ifade bide ku ew wan ceza bikin, Gandî xwe nade ber. Tu niyeta wî ku li heyfê bigere tunê ye. Dema xort gotinênu Gandî sa dikan, ji ber kir-yâren xwe fedî dikan.

Gandî li vî welatê dûr û xerîb buroya ewîqatiyê vedike û karê wî jî gelek baş di-çe. Li Afrîkaya Başûr du kurên din jî ji wan re çêdibin. Gandî ji hêlekê ve bi kar û barê xwe ve mijûl dibû, ji hêla din ve jî ji bo ku rewşa hevwelatiyênu xwe baştir bike, xebat

dikir. Rewşa wî ya aborî roj bi roj baştir di-be, ew ber bi zengîniyê ve diçe. Lî pirtûka Leo Tolstoy a bi navê "Zengîniya Xwedê, di hundirê we de ye" bala wî dikşîne ser çandiniyê (zîraet) û jiyana rihet. Pêşî ji xwe re zeviyeke erd dikire û gazî hevalê xwe Charlîe Andrews ku keşeyekî Ingîlîz e, dike ku li cem wî kar bike. Piştî heyamekê, bi alîkariya mîmarekî Elmanî, baxçeyekî me-zin û xweş dide çekirin. Çaxê baxçê û xanî ava dibe, Gandî tevî malbata xwe û hinek hevalên xwe, di wir de bi cih dîbin. Di "Baxçeyê Tolstoy" de herkes bi xwe xani-yênu xwe ava dikan, baxçeyen fêkî û sebzey-an datînin û bi şeklekî biratî kar dikan û dijnî.

Gandî û malbata xwe, li virê tevî dost û hevalên xwe heyameke xweş derbas dikan. Ew zarokênu xwe naşînin xwendeghêne girtî û bi cihêne razanê. Ew der, ji Gandî re weke girtîxaneyen dihat. Kurê wî yê mezin, tevî van dîtinêne bavê xwe jî vedigere welatê xwe û li dibîstaneke wiha dest bi xwendinê di-ke. Gandî bi çûna kurê xwe gelek aciz dibe, lê tiştekî ku zêde bike tune bû. Gandî û Kasturbaya jina xwe, tevî karkerên hevalên xwe bi dorê kar dikirin.

Gandî di dîtinênu xwe de pirr hişk bû, ji ber vê jî carinan dilê wî û Kasturbay ji hev dima. Lî jina wî li qisûrên wî nedînihêrt û ew zû efû dikir. Jina Gandî, Kasturbay mi-roveke rast û dirist bû, bi hîssên kûr bi van bawerîyan ve girêdayî bû. Wê jî ji têkoşîna bêşidet û bêxeyd bawer dikir. Dê ew di salênu pêş de, di têkoşîna rizgarî û azadiyê de

û bi taybetî jî di riya bêşidetê de, xebatên gelek hêja bike. Ji Gandî re dibe hevaleke bêhempa ku cîhê wê nedihat dagirtin. Gelek caran bi fîkrêن xwe yên kûr, alîkariya mîrê xwe dikir û bersîvên hêja dida pirs û problemên wî.

Gandî bawer nedikir ku bêeziyet û bêcefa kişandin dinya bête guhartin.” Ger ez û hevalên xwe, van eziyetan bêyî ku li heyfê bigerin, ji bo tekoşîna gelê xwe bikşînin hêla xwe, dê hingê rewşa dijminê meriv jî bi-guhiriya” digot, Gandî. Tekoşîna bêşidet, cefakarî, xwedîbiryarî û bêxofiyê şert dikir. Tiştên ku meriv dikir, pêwist bû ku vekirî û li ber çavan bûna. Qewet û heşamet di hundirê rastiyê de bû. Û guhartin jî bi rastî û diristiyyê çêdibûn.

Gandî piştî zêdeyî 20 salên dirêj li Afrîkaya Başûr, di sala 1914-yan de tevî gelek tecrûbeyan vedigere welatê xwe. Gelek keşen ku bi tekoşîna wî, ya li Afrîkaya Başûr hisiyabûn, hatibûn pêşıya Gandî. Gandî û Kasturbay di cilên sîpî de ketibûn nav gelên xwe û bi serbilindayî dimeşîyan. Hesreta welêt ketibû dilê wî. Êdî ew li welatê xwe bû û dikaribû welatê xwe bêtir binase û derd û kederên gelê xwe çêtir fêr bibe. Gul û çîçek di stuyan de, bi kêf û dilrihet çûn mala xwe.

Gandî li welêt pirr bi nav û deng bûbû. Pêşevanê Partiya Kongreya Neteweyî yên mîna Nehrû, Jinnah û Gokhale tên pêşıya wî û jê re qedr û rûmeteke mezin digrin. Ew dixwazin Gandî di şerê rizgariyê de li kéléka wan cîhê xwe bigre, daku agir hîn

bêtir ges bibe. Gandî dîtinên xwe bi kurta-yî pêşkêşî wan dike, lê ew ji wan re pirr sivik û bêmane tê. Li ser daxwaza Gokhale, Gandî, şevekê dibe mîvanê wî. Ew ji mêj ve êkdû dinasin û dostên hev ên kevn in. Piştî xwarinê ew li ser rewşa welêt, li ser bindestî û perîşaniya gel diaxifin. Dewleta koledar, welat di bin destêن xwe de xistibû halekî mirinê û pêwist bû welat ji destêن kolonyalîstan rizgar bibûya. Wekî din jî rewşa gelên Hindîstanê yên civakî pirr xirab bû. Ji hêlekê ve çend kes pirr zengîn û dewlemend bûbûn û ji hêla din ve bi mîlyonan birçî û belengaz hebûn. Kesên hejar, bêwar û bi taybetî jî jin, bi her awayî dihatin perîçqandin.

Gandî rewşa welatê xwe hê betir dinase. Li Afrîkaya Başûr jî hevwelatiyêن wî dihatin perîçqandin û rewşa reşikan hê ji wan jî xirabtir bû. Dema ku li wir dima, li ser hinêk zoriyêن ku hukûmeta Afrîkayê ji Hindîyan re derxistibûn, ew û bi hezaran Hindî wek protesto, pasaportên xwe şewitandibûn û ji ber vê jî têr lêdan xwaribûn û di ser de jî tevî hevwelatiyêن xwe ketibû zindanan. Gandî ji hevalên xwe re wiha gotibû:

”Ger em bersîva lêdana wan nedin û eşâ xwe bi hîssên xwe yên biqwet di hundurê xwe de vesêrin, dê rihim têkeve dilê wan û belkî jî fîkrêن wan bête guhartin. Pêwîst e, em li dengê hundurê xwe, yê Xwedê, yê eş-qê û yê rastiyê guhdarî bikin. Gelek giring e ku em rastiya xwe bêşik qebûl bikin û bêşidet jî bidin qebûlkirin.”

Li vî welatê xerîb ku hê wê demê di binê bandora Împaratoriya Brîtanyayê de bû, rojekê meşike protestoyê organîze dike. Slogan û daxwazên besarêrên vê meşê tiştên pîr sivik in: "Em jî hevwelatiyêن Împaratoriya Brîtanyayê ne!" Polês li ser van daxwazên piçûk jî êrîş dibe ser wan û tevî hespan dixwaze wan ji hev belake. Gandî û hevalen xwe ne lihêviya vê êrîşê bûn û tev xwe ji bo parastinê, li ser dev dirêj dikin. Hesp pêl merivên li erdê dirêjkirî nakin û tev ji perçiqandinê difilitin. Pişti meşê Gandî û jina xwe, tevî bi sedan kes têne girtin û dikevin hepsê.

Pişti çend salên dirêj û tekoşîna bêsemax, rewşa Hindiyêni li Afrîkayê baştir bûbû û dîtinên wî di jiyanê de cîhê xwe girtibûn. Edî dikaribû li welatê xwe jî, ji bo rizgariya neteweyê xwe bi vî awayî kar bikirna. Temenê wî 45 sal bû û tecrûbeyên wî bêhesab bûn. Tenê lazim bû ku li welêt bigere û rewşa gelê xwe baş binase. Li ser pêşneyar û alîkariya dostê xwe yê siyasetvanê naskirî Gokhale, Gandî tevî jina xwe Kasturbay Dyana rihet" dikin. Li qeraxa çem, di nav baxçeyê "Aşram" de duayên xwe yên rojane dikin. Piştre hinek malbatên bêkes jî digrin çem xwe û ji bo vê, gelek rexne tên Gandî. "Gandî qîmet û rûmeta xwe nizanibû!", û "pêl şexsiyeta xwe dikir!" li gorî wan. Lî Gandî guh neda wan û li ser gotinên wan wiha digot: "Em tev tazî hatine dinyayê, kes ji kesî ne zêde ye yan jî biqîmétir e. Ci zengîn û ci feqîr, herkes xwedî şexsiyet e!"

Li ser rastiyê Gandî wiha digot: "Bira

kes ziddê wê nefikire, rastî dê di dawiyê de biserkeve!" Gandî ji bo kesên tolaz û súcdar jî "birayênen me yên nezan" dîgot. Li gorî Gandî, pêwîst bû ku herkesî bikaribûya xwe ji bo welatê xwe û di riya Xwedê û rastiyê de fîda bikirna, yan jî di vê riyê de hazîrî tade û eziyetan bûna. Wekî din jî wekhevi giring bû, li gor wî. Ger wekhevî li welêtbihata bicîhanîn, jiyan dê hîn rihettir bibûna û herkes jî dilşad bijiya.

Rojekê hinek gundî gazî Gandî û jina wî dikin ku rewşa xwe nîşanî wan bidin. Rewşa wan a aborî ji xwe pîr xirab bû, lê pişti hukûmetê bi hinek qanûnan bac û mesrefen wan zêde kiribûn, ketibûn rewşa hebûn û tunebûnê. Birçî û perîşan mabûn. Gundîyan giyayeke ku reng dida cawan diçandin. Ji ber ku bihayê caw û cilên ku ji İngîlistanê dihatin, roj bi roj zêdetir dibûn, kêm kesan dikaribû ji wan cilan li xwe bikira. Çaxê firotina cil û cawan kêm dibe, maldar dixwazin bacê biavêjin ser wê giyaya ku gundî ji xwe re diçinîn û difroşin. Dema ku bac hatibû ser firotina giyaya "îndîgo", rewşa wan a aborî pîr daketibû û birçî-perîşan mabûn. Gandî û jina xwe diçin bi xwediyyê malan re xeber didin û wan mecbûri paşdegirtina vê biryarê dikin. Pişti ku ev biryar bi paş ve tê sitandin û perreyêni ku ji wan hatibûn girtin, bi paş ve tên dayîn, hinek bêhna wan derdikeve û gundî sipasiyênen xwe pêşkêşî Gandî û jina wî dikin.

Pişti vê bûyerê Gandî hîs dike ku meriv dikare bi vî awayî serkarêni Dewleta İngilîs-

tanê jî nerm bike û mafêن xwe ji wan bigire. Lewra jî bi vê baweriyê, di şerê cîhanê yê yekem de pêşniyar dike ku Hindîstanê bi dil û can herin şer û li gel Îngilîstanê cîh bigrin. Wî wisa bawer dikir ku dê Dewleta Îngilîstanê wek sipasî, mafêن azadî û rizgariyê bida Hindîstanê.

Ev pêşniyar li cem hevalêن wî yên herînêz û di serî de jî li cem Nehrû, wek biryareke şâş hat nirxandin. Piraniya hevalêن wî li dijî vê biryara "şâş" derketin. Gandî bi her awayî dikeve rewşike nexweş û siheta wî jî gelek xerab dibe. Ew ketibû halê mirinê; heyama ku bi hişê xwe ve hatibû, şer jî tewa bûbû. Lî ne azadiya gel û ne jî rizgariya welêt hatibû rojevê. Vê rewşê di dîtin û ramanêن Gandî de, xişûşî û pirsên nuh anîbûn holê.

PARTIYA KONGREYA NETEWEYÎ

"Indian National Congres" ku bi kurtayî bi Partiya Kongreyê tê binavkirin, ji aliyê Îngilîze-kî bi navê Hume ve, di sala 1884-an de hatibû damezrandin. Armanc ji damezrandina vê Partiyê ew bû ku dewleta mêtîngehkar nerm bibe û bi hinek reformên demokratik, rê û îmkanan bidin Hindiyan, da ku ew jî beşdarî jiyana siyâsî ya welêt bibin. Peyama ku bi avakirina vê partiyê, ew îmkan û rê vedibin, gelek huqûq-nas, intellektuel û maldarêن welêt beşdarî vê partiyê dibin.

Ev partî ji destpêka sedsala 19-an û vir de, di civaka Hindîstanê de li seha civakî û siyâsî, roleke taybetî û sereke dileyize. De-

ma di sala 1947-an de welat digîje rizgariya xwe, Kongreya Neteweyî ya Hindîstanê weke partiya yekemîn hukûmetê ava dike û dest bi kar û xebatêن idareya welêt dike. Ji wê demê û vir de heta iro ev partî bi hinek kurtebiran, li ser hukm e.

Gandî ji sala 1915-an û heta mirina xwe di vê partiyê de, ji bo rizgarî û azadiya weletê xwe kar dike. Qet wezifeyen wezîrtî yan jî berpirsiyariyeke Partiyê yê resmî nagire ser milên xwe. Ew her weke serbazekî vê partiyê dixebite. Tevî vê jî bi piranî gotin û pêşneyariyên wî tên guhdarîkirin û pêkanîn. Dema serê pêşevanên Partiyê, yan jî yên dewleta nuh diketin tengasiyê û na-kokî diketin nav civakê, ew diçûn cem wî, li fikir û pêşneyariyên wî guhdarî dikirin.

Di destpêkê de van kesan guh nedabûn Gandî û gelekan jî kenê xwe pê kiribûn. Hetta çaxa ku ji gera xwe ya welêt vege riya-bû, wî dawetî Kongreya Partiyê kiribûn û xwestibûn ku ew jî dîtinêن

xwe pêşkêşî beşdarêن Kongreyê bike. Gandî hê nuh ji nav gel hatibû, rewşa welet û ya gel ji tevan çêtir dizanibû. Lewra jî axaftinên piraniya beşdaran jê re ecêb û li hewa hatibûn. Pêşevanên Partiyê ku dê si-behê bibûna serokên dewleta azad û serbix-we, rewşa welêt û jana gel nizanibûn. Gandî di axaftina xwe de, li wan hinek rexne digire û wiha dibêje:

-Gotinêن me û rewşa welêt, ji hev gelek dûr in. Ji bo ku em bigîjin rizgariyê, divê em layiqî wê bin. Ger em dixwazin welatê xwe ji bin destêن kolonyalîstan rizgar bikin

û gelê xwe azad bikin, divê em gel baş fam bikin û daxwazên wan baş fêr bibin! Divê em têkevin nava gel û li wan guhdar bikin! Piraniya gel ji birçîna telef bûye; dê gelên birçî û perîşan, ji rizgarî û azadiyeke rût çi bikin!

Beşdarêن civînê li ser van gotinê wî heyrî dimînin. Gandî di nîvê civînê de dev ji wan berdide û diçe mala xwe. Cihê wî, li cem wan kesên ku rewşa gelê xwe nas neki-ribe, tunebû! Bi gotinê xweş û bi civînê maldaran, ne welat rizgar dibû û ne jî gel têr dibû!

GANDÎ Û NEHRÛ

Yekemîn serokwezîrê Hindîstana serbixwe Jawaharlal Nehrû, di sala 1889-an de, li bajarê Allahabadê tê dinyayê. Malbata wî bi eslê xwe ji bakurê welêt, ji Kaşmîrê koçî vî bajarî kiribû û li wir bicîh bûbû. Bavê wî Motîlal Nehrû, Jawaharlal di 1905-an de dişîne İngîlîstanê ku li wir bixwîne. Ew li xwendeghe Harrovê ku ji bo arîstokratan hatibû ava kirin û serokwezîrê İngîlîstanê Churchill bi xwe jî li wir xwendibû, dest bi dibistanê dike.

Nehrû zû dikeve bin tesîra şagirtên İngîlîzî û di destpêkê de dixwaze xwe bi her awayî têxe şeklê wan. Jiyana wan, xweşî û henekêñ wan, bi wî jî xweş têñ. Ew wisa dizane ku ger ew xwe nexe şeklê wan û xwe weke wan neke, nikare di nav wan de cîh xwe bigre. Hetta ji bo ku di nav wan de cîh xwe bigre, dikeve nav grûba kesên li dijî cihû-

yan. Wekî din bavê wî teví ku pêşevanekî Partiya Kongreyê bû jî, dixwest ku ew ji Împaratoriya xwe re sadiq bimîne. (Motîlal piştî çend salan dibe serokê Partiyê û bi taybetî jî di dawiya temenê xwe de bi alîkariya Gandî û kurê xwe Nehrû, dibe welatperwerekî tûj û giranbiha.)

Piştî Harrovê, li Üniversiteya Cambridge kîmya, botanik û jeolojiyê dixwîne. Dû re li Londonê dest bi dibistana huqûqê dike. Nehrû di van salêñ dawî de li ser dîrokê û civakê pirr dixwîne û serê xwe diêşîne. Ev xwendin û lêkolîn, hişê wî li ser rewşa welatê wî û ya kolonyalîstan baş vedike û ew dibe welatperwerekî tûj. Di 1912-an de dibe ewûqat û piştî heft salêñ dirêj vedigere weletê xwe. Nehrû piştî vejerê beşdarî civîna Partiyê dibe, lê ev civîn jê re pirr nexweş û bêmane tê. Piraniya wan, maldarêñ pirr zengîn bûn û sermayedarêñ mezin bûn. Li gorî wî, di Partiyê de kîmasiyeke pirr mezin hebû. Yek ji van kîmasiyan jî, tunebûna nîqaşan û fîkrîn nûjen bûn.

Dewleta kolonyalîst di sala 1918-an de, dixwaze hinek reformên piçûk pêk bîne. Partî li ser vê rewşa nuh dicive. Di civîne de nakokiyeke mezin dikeve nav beşdaran. Partî dibe du seq; hinek dixwazin vê pêşniyarê qebûl bikin û bi vî awayî dest bi diyalogan bikin û piranî jî li dijî vê fîkrê derdi-kevin. Anglo ev pêşneyar bi piraniya den-gan ve nayê qebûlkirin. Nehrû û bavê xwe jî bi vî awayî cara yekem di dîtinekê de digî-jin hev.

Piştî salekê, di 1919-an de qanûneke ku

hukmê kolonyalîstên heremî pirr zêde dikir û di îdareya herêmî de imkanên bêşînor di dan wan derdikeve. Polîs û leşker, bi van qanûnên nuh kî dikeve ber wan, digre û dixe zindanan. Gandî ji îdareya Partiyê re pêşniyar dike ku li dijî van qanûnên nuh û tadeyên polês û leşker, di 30-ê adarê de bi şeklê dua û rojiyê, protestoyeke gelempêr bête amadekirin. Partî vê pêşniyarê qebûl dike, lê di deqîqeya dawiyê de biryara xwe bi paş ve distîne. Tevî vê biraya partiyê ya nuh jî, gel dest bi protestoyê xwe dike. Li Delhi, Allahabad, Lahore, Multanê û gelek bajarên din bi hezaran kes besdarî civînên protestoyê û grevên birçibûnê dixin.

Hindîstan ji aliyê politîk ve felc dibe. Bi sedhezaran kes têngirtin û dikevin zindanan. Tade û işkenceyên ku polîs û leşker li gel dike, bêhesab e. Gel li malên xwe namînin û dikevin kuçe û meydanan. Hukûmet ji mecbûrî komîsyoneke resmî ava dike ku li ser vê rewşê lêkolînê bike. Partî pêşneyar dike ku endamekî Partiyê jî têkeve nav vê komîsyonê, lê hukûmet vê pêşniyarê qebûl nake. Li ser vê, ev komîsyon bi tevâyî tê boykotkirin û komîsyonek ji teref Partiyê ve tê destnîşankirin. Di nav vê komîsyonê de Gandî, Nehrû û bayê Nehrû, Motîlal ji hene.

Li ser van boykot û protestoyan û bi taybetî jî bi maneya ku doktorekî mîsyoner di nav van xirecirân de, ji ser bisiklêta xwe dikeve û birîn dibe, General Dyer biryar dide ku cezayeke mezin bide rûniştevanên bajarê Amrîtsarê. Di civîna protestoyeke mezin

de, ferman dide serbazên xwe, "ger ku xelk ji hev bela nebe, wan bê serûçav gulebaran bikin!" Ü wisa jî dibe. Nêzî 1000 kes têngüştin û bi hezaran jî birîndar dixin. Ev metodênen barbarî û çavtirsandinê, li tevaya eyaleta Puncabê û li piraniya Hindîstanê tê bikaranîn. Lê êdî hukumet jî nikare çavên xwe ji van qetlîaman re bigre; Wezîfeyê General Dyer, bi qerara dadgehê jê tê girtin.

Di 1920-an de Partî dîşan li ser pêşneyara Gandî, biryara rêxistîneke "digel wan kar neke", ku mebest dewleta kolonyalîst bû, ava dike. Gandî serokatiya vê projeyê digre ser milên xwe û dixwaze di nav alîgirên şerê çekdarî û yên ku dixwestin bi riyên reforman û bêşîdet welatê xwe ji bin nîrê kolonyalîzmî rizgar bikin de, pireke hevkariyê ava bike. Gandî bi xwe bi şid li hember şidetê bû. Wî fîkrê pêwistiya ku gel têkeve kuçe û meydanan wek prensîb qebûl dikir, lê gerek şidet nehata bikaranîn. Dema şidet bihatina bikaranîn, dê bi tenê Partî û gelên belengaz zerar bidîtina.

Nehrû di nav vê jiyanâ siyasiş û tevlîhev de, Gandî hê bêtir dinase. Nav û tekoşîna wî, hê ew li Afrikayê bû, seh kiribû. Heyranê dîtinên wî yên azadî û rizgariyê bû. Her çiqas dîtinên Gandî yên bi meyla olî ve nedieci band û şeklê tekoşîna wî têr nedidît jî, hebûn û mezinahiya wî, hêviyeke mezin dida Nehrû. Dîtinên wî ji gelên Hindîstanê re û ji rizgarî û azadiyê re pêwîst bûn û yekî wisa naskirî û xwedî birûmet, dikaribû berê gel bidana ser riya serxwebûnê. Nehrû

bi naskirina Gandî û bi kâkirina pê re kêfxweş û serbilind bû.

Di nav salan de dîtinên Gandî û Nehrû ji hev bi dûr dikevin. Nehrû dîtinên olperestî û mîstîzmê dûrî dîtinên xwe didît û xwe "çep" dihesiband. Gandî jî motîvên olî bi kar dianî. Ew bi şid li dijî her şekil kommunîzmê bû, niha tu feydeyên sosyalîzmê jî ji civakê re nedidit. Nehrû, ji Lenîn û Trotskî û dîtinên wan ên şoreşê şewq û ilham girtibû. Piştî ew li Brukselê beşdarî ci-vîneke ku armanca wê damezrandina yekîtiyeke li dijî emperyalîzmê bû û ji teref Komînternê ve hatibû amadekirin dibe, kesên weke Ho Chî Minh dinase û bi vî awayî hem di tekoşîna li dijî kolonyalîstan de û hem jî di ya dijî kedxwaran de, di bin tesîra Komînternê de dimîne. Piştî ku di sala 1927-an de, bi wesîleya pîrozkirina deh saliya şoreşê, Moskovayê ziyaret dike, ev dîtin û daxwaz dîbin armancê Nehrû yêne yeke-mîn.

Dîtinên Gandî û Nehrû cara yekem di bombekirina du qereqolên polisan de têpêşberî hev. Du endamên Partiyê, bi bombevê hazirkirî du qereqolan hildiweşînin. Lî kes nayê kuştin. Armanc jî ne kuştina kesan, lî çavtîrsandin bû. Gandî pirr aciz dibe û pêywendiyêñ xwe ji herduyan qut dike. Dema dadgeh cezayê bi dardakirinê jî dide herdu endaman, ew ne vî cezayî protesto dike û ne jî qala wan dike. Yek ji wan di nav gel de dibe leheng û bi sedan helbest û stran li ser wî têr derxistin, lî dîsa jî Gandî deng nabe xwe. Nehrû vê meyla wî,

bi dîtinên wî yê ekstremlî ku li dijî şidetê ne ve girêdide. Li gorî Nehrû, kesên ku di vî awayî de derketina pêşîya Gandî, wî ew efû nedikir û li hember wan gelek dijwar bû. Ew kesên ku şidetê bi kar dianîn, "di-bûn sedemên berdewamkirina kolonyalîzmî!"

Nakokiyêñ navbeyna herdu serokên wela-tperwerî yêñ Hindîstanê, berbiçav mezin bûn. Helbet ev nakokî ji rewşa wan a taybetî û ji şeklê gihiştandina wan jî dihat. Nehrû ji Kaşmîrê, di nav malbateke ji dîtin û baweriyêñ olî dûrketî; Gandî ji Gujaratayê û ji malbateke olperest dihat. Nehrû perçeyek ji Unîversiteya Harrow û Cambridge û di bin tesîra kultura Ewrûpayê de mezin bûbû. Gandî jî li Ewrûpayê xwendibû, lê ew perçeyek ji hundurê hinduîzma Hindîstanê bû ku taktîk û jiyana xwe ya siyasî ji tekoşîna Afrîkayê girtibû. Lewra jî Gandî bawer dikir ku tesîra ol li ser gel hebû û pêwîst didît ku giranî li wir be. Nehrû di riya rizgariyê de, vê dîtinê li hember gel xetereke mezin dihesiband. Ev nakokî, bi kurtayî xwe di modernîzmê û dîtinên tra-disyonel de eşkere dikirin.

Gandî û Nehrû gelek caran ji gelek sedeman ketibûn nîqaşan jî. Li gorî Nehrû, mîstîzma Gandî ya li ser hinduîzmê dikaribû bîba sebebê jihevqetandina hindû û misilmanan. Pêwîst bû ku gelên Hindîstanê, bêyî vegetandina ol û etnîkî li hember kolonyalîstan, bi hev re serî rakirina û ancax bi vî awayî dikaribûn bigîştina rizgariya xwe. Nehrû li ser rewş û dîtinên Gandî pirr

difikirî. Ew kesê ku şeklê jiyanâ xwe li ser gunehan, efûkirinê û li dijî her şikil şidetê sererast kiribû, ji Nehrû re weke gundiyeğî kevnare û paşdemayî dihat. Tevî vê jî, Nehrû wî vala û bi tenê ji hêla siyasi ve xasûk neditît. Ew her wiha gelek zana, gihîştî û pêşevanekî siyasi bû jî. Ya herî giring jî, piraniya gel ji herkesî bêtir li wî guhdarî dikir.

Gandî ji Tolstoy tesîreke mezin girtibû. Ew bi riya nameyan, pê re ketibû pêwendiyê û jê fêri gelek taktikên siyasi bûbû. Bi van taktikên xwe yên siyasi û pêşneyarên xwe yên zelal, di nav Hindîstanâ kevn û ya nuh de, di nav gundî û kolonyalîstan de û di nav Nehrû û burjûvaziyêneteweyî de dibe pir û kolan. Ê ku tevan bi hev re idare dikir, Gandî bû. Ew bû, yê ku di nav gund û bajêr, di nav gundî û karkeran, hindû û misilmanan, di nav Hindîstanê û Îngilîstanê de navberiyê dikir û riya rast pêşî wan dikir. Ew bû, cîhê herkesî weke kevirên setrancê, tesbît dikir û nîşanî wan dida. Nehrû baş dizanibû, ger ne Gandî bûya, tu kesî nikaribû van karêz zor û giran pêk bianîna. Rûmet û mezînbûna wî, ji zanebûna wî ya siyasi, semax û baweriya wî, ji taqet û rastiya wî, ji pêşevaniya ya gel dihat. Ger wî bixwesta, dikaribû berê gel bida ser riya çûyin û nehatinê.

Dema polîs di sala 1928-an de, di protestoyêni li hember dewletê de du kesen aştixwaz dikuje, gel pirr aciz dibe û qereqola polisan dişewitîne. Polîsen ku ji ber agir jî direvin, bi destan tên kuştin. Li ser vê, şere-

kî pirr mezin dest pê dike û li gelek cihan xwîn dirije. Gandî bi vê rewşê pirr dişê û piştî ku gotinêni wî nayêni cîh, dest bi greva birçibûnê dike. Gel ji vê protestoya wî pirr aciz dibe; serokên Kongreyê, wî bi "li hemberî şoreşa gel" sûcdar dikin. "Li çaraliyê welêt serhildan dest pêkiribû û Gandî jî dibû asteng!" digotin. Lê Gandî dev ji ya xwe bernade û rewşa siheta wî jî roj bi roj xerabtir dibe. Ref bi ref têc cem wî ku dev ji "rojî" ya xwe berde. Lê ew xwedî biryar e; heta ku şidet û xirecir hebe, ew dê "rojî" ya xwe berdewam bike.

Çaxê ku rewşa wî pirr xedar dibe, fîkrê millet diguhire. Gel ji bo xatirê "bavo", gul û çîçekan dixe stûyêni polîs û leşkeran. Nehrû tê cem Gandî û gelek acizbûyî jê re wiha dibêje: "Aştiya ku te dixwest bi cîh hatiye, wa gelê me yê bindest gul û çîçekan jî dixin stûyê leşkeren koledaran!" Li ser vê Gandî bi ken wiha bersîva Nehrû dide: "Xuya ye ku ez hebekî zêde çûm; ger rewş wisa be, êdî ez dikarim dest bi xwarinê bikim." Piştî ku herkes li malen xwe rûdinin, polîs tê ku Gandî bibe û têxe bin çavan. Nehrû dixeyide û ji polê re wiha dibêje: "Ev hûn dîn in, ci ye? Ne ew niha bû manîê şoreşekî!" Gandî jî li Nehrû dinêre û wiha dibêje: "Ger ez dizanibim feydeyek ji bo Hindîstanê heye, ez ji "mîvaniya" padîşahê xwe re nabêjîm "na"." Gandî vê carê jî ji ber "teşwîqa serhildanê", şes sal ceza dixwe.

Gandî dixwest ji bo rizgariya Hindîstanê du tiştîn giring bihata pêkanîn û di wan

tiştan de bi ser biketa. Yek ew bû ku Îngîliz, bi planekî serwext xwe ji welêt vekişandina û ya din jî pêşkeftina rewşa gel û welêt ya di warê aborî de bû, ku ev jî piştî serxwebûnê dihat. Tiştên ku serê wî zêde dişand û wî dixist xeyalan, ev her du tişt bûn. Pêwîst bû ku ew Partiyê li ser van tiştan bigıştandina hev. Ji bo ku van dîtinê xwe di nav Partiyê de bide qebûlkirin û ye-kîtiya Partiyê û ya gel bi hêzter bike, pêwîsiya wî bi Nehrû û alîkariya wî hebû. Gandî ji Nehrû pirr hez dikir û pirr qîmet di-dayê. Nehrû ji welatê xwe gelek hez dikir û mirovekî jîr, zana û têr gihîştî bû. Ew her wiha pêşevanekî bêhempa, serokekî birûmet û xwedî qabiliyeta rêkxistinî jî bû.

Di sala 1928-an de Motîlalê bavê Nehrû, serokê Partiyê bû. Piştî salekê Gandî pêşniyar dike, da ku Nehrû têkeve dewsa bavê xwe. Gandî wisa hesab dikir ku Partî, bi saya serê Nehrû dibû xwedî îstîkrar û dikete bin kontrolê. Ew dê her wiha di nava çep û rastan de bibûna pir û dê bi vî awayî Partî bi ser çepîtiya hişk ve neçûya. Nehrû bêdil vê wezîfeyê qebûl dike, lê di kongreyê de axaftineke pirr hişk û dijwar dike. Kongre ji ber axaftina wî şoke dibe, ew ji teref besdarên Kongreyê, bi kêf û şewq tê himêzkinin. Axaftina Nehrû, li Hindîstanê dibe sebebê şahiyeke mezin û li Londonê jî dibe sebebê panîkê.

Nehrû di axaftina xwe de meyla xwe eşkere kiribû; wî ji bo Hindîstanekê bêqeyd û şert serbixwe biryar dabû. Êdî reform û otonomî ne tiştên daxwazkirinê bûn. Ji

awayê ideoolojîk ve jî, xwe weke sosyalîstekî pêşkêş kiribû. Li gor wî, diviyabû ku ax li gundiyan belav bibûya, feqîrtî û xizantî bîhata rakirin û di nav sinifan de cudañ ji holê rabûya. Li ser dîtinêñ Gandî yên "dijî-şidetê" jî Nehrû wiha digot: "Partiya me hem bi îmkanêñ xwe û hem jî bi tebîta xwe dûri şidetê ye û şideta şexsî jî elametê diktatoriyê ye. Lê ger meyla Partiyê li ser wê bawerî û biryarê be ku şidet dikare we-latê me ji bin destan rizgar bike, wê hingê ez ê bêteredut wê meylê qebûl bikim. Şidet tiştekî nebaş e, lê koletî û bindestî, jê gelek xirabtir e!"

Axaftina Nehrû ya di warê pîrsên civakî de ji Gandî re tûj hatibû. Gandî ne li hember ji ortê rakirina feqîrtî û xizantiyê bû, lê ditirsîya ku rewşa welêt bêtir bi ser Moskovayê ve here. Lewra jî van dîtinan qebûl nedikir. Partî dîtinêñ Nehrû, tevî ku Gandî li hember jî derketibû, bi tevayî qebûl dike. Partiyê her wiha biryar girt ku tevaya karmendên Hindî dev ji karêñ xwe berdin. Biryareke din jî ku gelek giring bû hatibû girtin. Li gorî vê biryarê, Partiyê ji hemû welatparêzan daxwaz dikir ku heta welat bigje rizgarî û serxwebûnê, bira herkesî soz û bext bida ku wê ji bo vê armancê kar û xebatê bikin.

Gandî piştî vê kongreyê bi serê xwe kar dike û bi dest biderxistina rojnameyekê dike. "Harîjan" (zarokêñ Xwedê), bi taybetî li ser rewşa kesên belengaz û bêkêş disekine. Yek ji armancêñ rojnameyê ew bû ku ji kesên bêxwedî re xwendegah bêtin vekirin

û mafê wan î hevwelatiyê bête dayin. Gandî û hevalên xwe, êdî xwe zaftirîn bi rewşa xwendegehan re diêşandin. Xwendegehêن welêt kopyayên Îngilîstanê bûn û bi piranî li ser teoriyê disekinîn. Gandî dixwest xwendegeh giraniyê bida ser karên pratik ên weke çandinî, zenaat, baxçevanî, senet-karî û tiştên ku di jiyanê de ji wan re lazim dibûn. Pêwîst bû ku zarokan ji her awahî ve ji dibîstanê hez bikirna û di jiyanê de jî zorî nekişandina. Karmendêن dewletê, ji xebata wî ya pirsên civakî, gelek memnûn bûn. Li gor wan, ev xebat wî ji siyasetê bi dûr dixist; lê Gandî ne yê ku zû alaya sipî bikşanda.

Di sala 1930-yî de protestoyeke ecêb û nedîtî pêk tê. Gandî û du hezar hevalên xwe biryar didin ku bi meşê herin Okyanûsyaya Hindê û ji wir xwê bicivînin. Bi hezaran kes di rê de beşdarî vê meşê dibin û çaxê digijin ber deryayê, bi sedhezaran kes li pey Gandî bûn. Protesto li çar aliyê cîhanê belav dibe, bala kesên aştixwaz û mirovperwer dikşîne ser xwe. Wek tê zanîn, ev protesto ji ber baca dewletê ku nuh anîbû ser xwê, hatibû lidarxistin. Di welatekî wisa germ de giringiya xwê bê sînor e. Çaxê hukûmetê baca xwê zêde kiribû, ke-sên belengaz jî çûbûn cem "bavo" û giliyên xwe li cem wî kiribûn. Gandî jî xwestibû vê têxe rewşike siyasi û protestoyeke gelemerî li dar bixe. Nehrû jî vê protestoyê destek dike, lê dixwaze ku tekoşîn hê jî bilindir bibe. Li ser van protesto û mîtingan, bi sedhezaran kes hatibûn girtin, lê protes-

to jî gihiştibû armanca xwe. Ji hundir û dervayî welêt bi mîlyonan kes, bi tekoşîna wan hisiyabûn û gelên cîhanê guhê xwe dabûn dengê Hindîstanê.

Gandî, Nehrû û bi dehan rêber û serokê Partiyê jî dikevin bin çavan, zindanên kûr û tarî. Dadgerê Îngilîzî, di dadgehê de ji Nehrû dipirse:

-Ev çend car in ku tu dikevî girtîxaneyan û beşek jî ji jiyana te, di van deran de derbas dibe?

Nehrû radibe pê, li dora xwe dinêre û wiha bersîv dide:

-Tiştekî berbiçav û eşkere ye ku heta tu, leşker û polîsên dewleta te di nav welatê me de bin, ez û heryek Hindiyê welatperwer, dev ji armanca xwe bernadin. Di eslê xwe de xwedîyê pirsê ez im; hûn dê heta kengê li welatê me bin?

Gandî bi bersîva wî pirr kêfxweş dibe. Ew jî dizane ku heta mêtîngehkar di welatê wan de bin, rihetû ji tu kesî re tune bû. Gandî di dadgehê de li ser vî awayî wiha digot:

-Heps û zindan, ji bo rizgarî û azadiya neteweyan, bûyerên rojane ne. Tu kes naxwaze wextê xwe di zindanan de derbas bi-ke; lê hûn, dewleta kolonyalist tu riyê nadin me. Em jî dixwazin wextê xwe di nav jin û zarokên xwe de, ji bo pêşdeçûna welatê xwe derbas bikin. Em jî dixwazin biratî û aştî têkeve nav gelan û herkes weke bira bijî. Hêvi û baweriya me tevan ew e ku hûn rojekê berî rojekê dev ji welatê me berdin û em bigijin hêvî û armanca xwe. Divê

êdî we jî fam kiribe; cihê we li vira nemaye, divê ûn dev ji vî welatî berdin!

Dadger ji ber vê bersîva wî heyirî dimîne û wiha dibêje:

-Lê ger îdareya Îngîlîzî tune be, dê kaos têkeve Hindîstanê.

Bersîva Gandî pirr vekirî ye:

-Hukûmeta herî xirab a welêt jî, ji îdareya herî "qenc" a xerîb çêtir e!

Gandî, Nehrû û gelek serokên din ji ber "teşwîqa serhildanê" bi salan cezayê hepsê digrin.

Tade û pîkoliyêne dewletê roj bi roj zêdetir dibin. Lê êdî kes nikare pêşîya gelê birçî, perîşan û belengaz bigre. Protesto û meşen gel her roj zêdetir dibin. Hindîstan dikeve kaoseke politîk. Tevlîhevî û nerihetî ketibû nav Îngîlîstanê bi xwe jî. Rexneyêni jî dewletê Ewrûpayî û rêexistinêne humanîter, hukûmeta herêmî mecbûrî hinek guhartinan dike. Ger ew kesen ku ketibûn meş û protestoyan dest bi şerê çekdarî bikira, dê rewşa dewletê biketa rewşike pirr xerab. Lewra jî hukûmeta herêmî di sala 1935-an de dixwaze ji bo otomoniyeke qismî bi serokên Partiyê re têkeve pêywendiyê.

Li gorî pêşneyarê, dê îdareya merkezi dîssa di destê dewletê de bima. Lê ger ev pêşneyar bîhata qebûlkirin, îdareya piraniya herêman dikete destê Hindîyan û Partiyê. Gandî vê pêşneyarê ji bo rizgariya welêt gavekî giring qebûl dikir û dixwest ku Partî ji bo vê, biryareke pozitîf bigre. Lê Nehrû vê pêşneyarê pirr hindik û qebûlkirina wê bêimkan dibîne. Partî li ser vê pêşneyarê di-

keve nîqaşêke dirêj û piranî li dij derdikevin. Pêşneyara dewletê, bi piraniya dengan ve tê boykotkirin.

Tevî vê biryarê jî Partî, li dervayî kar û barêne legal namîne. Di sala 1937-an de, du sal piştî vê pêşneyarê, Partî biryar dide ku besdarî hilbijarinan bibe. Li ser vê biryarê bi mîlyonan kes besdarî hilbijartinan dibin û rayên xwe bi kar tînin. Partiya Neteweyî ya Kongreyê di yanzdeh eyaletan da ji 1585 kursiyan 711 cîh, û bi vî awayî ji nêvî bêtir rayên gel digre. Eyaleta Puncabê dikeve destê Partiya Yekîtiyê. Yekîtiya İslâmî jî ji 482 kursiyan ku ji misilmanan re hatibûn vejetandin, tenê 109 kursiyan bi dest dixe. Rayên vê Partiyê bi tenê ji % 4,8 ên misilmanan bûn.

Jiyan û tekoşîn bi vî awayî derbas dibe, agirê rizgariyê roj bi roj bilindir dibe. Nerihetî û kaos dikeve çaraliyê Hindîstanê; ji hêlekê ve hindû, ji hêla din ve misilman û gelên din, nerazîbûna xwe tînin zimên. Heyama ku Împaratoriya Brîtanyayê baş têdigije ku cîhê wan di Hindîstanê de nemaye, biryar dide ku xwe ji welêt bikşîne. Li ser vê biryarê Mountbattan, cîgirê Qralê Brîtanyayê bangî Gandî, Nehrû û serokê Partiya İslâmî Jînnah dike, da ku li ser şeklê guhartina îdareyê baxifin.

Lê niha jî, piştî ku serxwebûna welêt hatibû ber derî, astengiyek derketibû; ew jî vejetandina misilman û hindûyan bû. Serokê Partiya İslâmî ku bi eslê xwe ji Pakîstanê bû, ji Gandî û Nehrû re şertê xwe dânihbû: Diviya ku dewleta misilmanan a ser-

bixwe çêbûbûya. Gandî û Nehrû nedixwestin ku welat di destpêka rizgariyê de bibe du perçeyan. Ji ber ku ev gel bi hezaran sal li gel hev, di nav aştiyê de jiyabûn û ger welat bi vî awayî û nihabihata perçekirin, xetereke mezin derdiket pêşîya herdu gelan. Wekî din jî dê nakokiyên pratîkî derketa; misilman û hindû di nav hev de dijyan û barkirin û ji nuh ve maldanîna wan, dê hem ji aliyê aborî ve û hem jî ji aliyê teknîkî ve bibûna sedemê astengî û nakokiyên girîng. Lê Jînnah "Nûh" digot û "Pêxember" nedigot; an du welat, an jî şerê navxweyî!

Hem Gandî û hem jî Nehrû nedixwestin welat bi vî awayî perçe bibe. Hetta Gandî pêşneyar dike ku ji dewsa Nehrû ve, bira Jînnah bibe serokwezîrê pêşîn. Nehrû jî tevî ku li ser wî biryar hatibû dayin ku dê ew bûbûya serokwezîr jî, vê pêşneyarê qebûl dike, lê Jînnah dîsa qebûl nake. Hem Nehrû û hem jî Gandî baş dizanibûn ku perçebûna niha zerar bû û dê bi xwe re xeterên mezin bîne holê. Lê qetandin jî êdî bêçare bû. Lewma jî biryar didin ku di sala 1947-an de Hindîstan bibe du dewletên cuda; Hindîstan û Pakîstan.

Berî vegetandinê, ji bo haziriya damezrandina her du dewletên serbixwe, pêwîst bû ku gel bîn bicîhkîrin û herkes bicûna ser axa xwe. Misilman ji aliye kî ve diçin ser axa Pakîstanê û Hindûyêni di nav wan de jî vedigerin welatê xwe. Penabertî û cîhxîrâbûn li ser herdu aliyan jî tesîreke mezin dike. Gel ji barkirinê, perişanî û bêçaretiyê

aciz dibe; herkes sûc dixe stûyê pêşberî xwe. Bi van hîs û baweriyan, rojekê ji nişka ve şerekî piçûk derdikeve û bi carekê li tevaya Calcuttayê bela dibe. Wê salê (1946) bi hezaran kes têñ kuştin û bi dehhezaran jî birîndar dîbin. Misilman û Hindûyêni bi sedsalan di nav hev de weke bira jiyabûn, dîbin dijminîn hev. Ne polîs û leşker û ne jî gotinîn serokan dikaribû vî şerî bide sekinandin.

Gandî dîsa weke protesto, dest bi rojiya xwe dike û heta ku şer nayê sekinandin, dev ji rojiya xwe bernade. Çaxê şer disekine û gel li dora mala wî, li hêviya wî ye ku dev ji rojiya xwe berde, Nehrû tê ber serê wî û bi ser wî de digri. Dû re jî wiha dibêje: "Bapû, ne wa şer sekini ye, herkes çekêñ xwe dide leşker û polisan. Bes e, ma tê me bê "Bavo" bihêlî!" Gandî li Nehrû dinêre û dû re berê xwe dide Mîraben, keçika Îngîlîzî -ku di ciwaniya xwe de hatibû cem Gandî û li ber destê wî bûbû Hindûyêke hêja û li mala wî weke qîzeke wî dima- û jê ava xwe dixwaze. Pişt re jî gepek nanê ji garis dixwe û rojiya xwe dişkêne.

Di roja rizgariyê, 14-yê Tebaxa 1947-an de, dawiya serdestiya İmparatoriya Brîtanîyayê, pişti idareya 182 salan hatibû. Derd û kulen nêzî 200 salan jî bi vî awayî bi dawî hatibûn. Di rojekê wisa giranbiha de, serokwezîrê Hindîstanê yê pêşîn Jawaharlal Nehrû ji mîlyonan re wiha digot:

-Beriya gelek salê dirêj, civîneke me bi qederê re hebû; îro ew heyam tijî bûye û em dê wê pîroz bikin. Nîvê şevê dema din-

ya di xew de ye, dê Hindîstan bi jiyan û aştiyê re hişyar bibe. Yek lehzeyek ku di dîrokê de nayê jibîrkirin, ew lehzeya ku em gav ji kevnariyê diavêjin nûjeniyê. Çaxê heyamék tewa dibe û ruhê netewetiyê, yê di bin zordariyê de kuta dibe, pêwîst e ku bi cih be. Di cihê wê de ye ku em, di vî qasî de soz bidin ku ji Hindîstanê û gelên wê re û her wiha ji mirovantiyê re kar û xebatê bikin.

MIRINA "BAPÛ" GANDÎ

Kasturbaya jina Gandî di sala 1942-yan de, di hepsê de li kêleka wî nexweş dikeve. Gandî heta ku ew diçe ser heqiya xwe, li ber serê wê ye û jê re xizmetê dike. Lê Kasturbay bi nexweşîyeke giran ketibû û dermanê wê jî tune bû. Mirina wê li ser Gandî tesîreke mezin kiribû. Her wiha zîndan û grevên birçibûnê jî li ser laşsaxiya wî tesîrên mezin kiribûn. Gandî bi rojiya xwe ya da-wî ya li Delhiyê pirr xerab dikeve û gelek zedeyan dibîne. Temenê wî jî êdî mezin bû, ew nêzî 78 salî bû û çaxê şerê nav Hindû û misilmanan li Delhiyê dest pêdike, ew jî wek protesto, dest bi greva xwe ya da-wî dike. Gandî roj bi roj qelstir dibe û ji taqetê dikeve.

Rojekê Nehrûyê dostê wî tê cem wî û jêrica dike ku ew dev ji rojiya xwe berde. Axaftinên Nehrû û rewşa sihet û protestoyêndan Gandî, di nav gel de tesîrên xwe baş kribûn. Dema Gandî ji dostê xwe yî kevn Nehrû fêr dibe ku şer sekiniye, jê wiha dipirse:

-Gelo ew min naxapînin? Bi rastî ew dixwazin aştiyê pêk bînin?

Bi hezaran kes hatibûn ber xaniyê wî; Misilman, Hindû, Mesîhî, cihû û sîxî... Serokên gel soz û bext didinê ku aştî pêk hattiyê û tu kes wî naxapîne. Gandî li ser van soz û bextan hêdî hêdî dest bi xwarina xwe dike. Roja piştî wê, dixwaze here nav baxçe û dua û taetên xwe bike. Di milên wî de her du qîzên pismam, bi meş diçe duayan. Berî ku here, çend nameyên gîring dinivisîne û ji xwediyê wan re rêdike. Yek ji wan nameyean jî ji dostê wî Nehrû re bû. Ji dostê xwe re bi çend rêzan wiha nivîsandibû: "Belkî sibê ez nejîm, lê ez ji te re temenekî dûr û dirêj dixwazim û hêvî dikim ku tu bibî cewahirê (maneya navê "Jawaharlal" ji vir tê) Hindîstanê.

Êvarê dîsa diçe duayan û ji teref xortekî Hindû ve tê kuştin. Canê pak û delal, bêruh di nav destêñ her du keçikan de dikeve ser axê. Li dora xwe dinêre, dixwaze qatil nas bike, lê taqeta wî têr nave. Gula aştî û azadiyê, rohnî û şewqa gel, "Bapû" çûbû ser heqiya xwe. Gelên Hindîstanê, bêyî ser-wê xwe û gula civatê mabûn.

Xebera kuştina Gandî, zû belav dibe. Hindîstan felc dibe, ne kes ji malê derdikeve, ne jî kes diçe kar û xebatê. Hindû, misilman, mesîhî, cihû, bûdîst û ji hemû gel û olan mirov, dikevin huzn û xemgîniyê. "Bapû" êdî miribû, dê kî "bavîtiya" wan bikirna? Dê di dema xweşî û tengasiyê de kî fîkrîn baş bida wan û rê nîşanî wan bida? Dê kî şerê nav gelan bida sekinandin?

Kê dikaribû dewsâ wî bigirta?

Nehrû tevî hêşirên çavan, ji gelên Hindîstanê re wiha digot:

-Rohniya jiyanâ me tefiyaye û tarîtiyeke zilomat xwe berdaye seranserê welatê me. Ez nizanim bê ez ji we re ci bêjim an jî çawa bi bêjim. Serok û ezîzê dilê me, ku me jê re digot "Bavo", êdî ne di nav me de ye. Em ê êdî nikaribin herin ji wî aqilmendî û şîretan bixwazin, an jî xwe aş û tesellî bikin. Ev derbeke pîr giran e, ne tenê ji bo min, lê ji bo bi mîlyonan û dîsa bi mîlyonan kesen li ví welatî.

Min got rohnî tefiyaye, lê ez şas bûm; lew ev ruhniya ku şewqa xwe dabû seranserê welatê me, ne ronahiyeke vala bû. Ew ronahiya ku bi salan e şewq daye welatê me, dê hîn gelek salên din welatê me ronahî bike û ger hezar sal jî derbas bibin, dê dîsan jî ji welatê me û ji tevaya cîhanê re pêşevantiyê bike!

Ne bi tenê Nehrû û hevalên wî dilşikestî, hêvişikestî û xemgîn bûn, li seranserê cîhanê kesen welatperwer, rûmetzan, aştî û azadîxwaz vê xemgîniyê dikirin. Bi mîlyonan meriv ji ber mirina "Bavo" fîzar û jarîn dikirin, li çokêن xwe dixistin û hêvişikestî bûbûn.

"Bavo", kevoka aştî û azadiyê, weke stêreke bi dûvik şewqa xwe dabû seranserê cîhanê û derbaşî cîhê xwe, cîhê rihetî û şarezetiyê bûbûn.

MAHATMA Ú İNDİRA GANDİ

Gelek kes wisa dizanin ku Îndîra Gandî û

Gandiyêñ ku piştî wê hatin ser hukum, ji nesla Mahatma Gandî ne. Lewra jî ez pêwîst dibînim ku li ser vê yekê agahdariyekê bidim xwendevanan. Ji paşnav pêstir, tu merivantî yan jî eleqatên malbatî, di nav van her du malbatan de tunebûn. Îndîra Gandî qîza Nehrû bû û ew û Gandî dostêne gelek nézî hev bûn. Qîza Nehrû, Îndîra Nehrû bi zilamekî ku paşnavê wî Gandî bû û tu têkiliyê wî bi Mahatma Gandî re tunebû re dizewice û paşnavê wê jî dibe Gandî. Piştî kuştina wê, kurê wê Rajîv Gandî bi hilbijartinan dikeve dewsâ wê û piştre ew jî tê kuştin. Qedera her sê Gandiyan jî, bi ví awayî dibe weke hev. 

Çavkanî

- Nehrû û Gandî; Xanedaneke Hindî; Tarik Ali (Nehru och Gandhi, en dynasti i Indien)
- Bêxofiya tekoşînê ya bêşidet; Ulla Weiburt (Kämpa utan rädsla och med icke våld)
- Jiyana min a berê; Gandî (Mitt första liv)
- Mahatma Gandî; Chandrî Kumar û Mohînder Purî
- Jiyana Mahatma Gandî; Louis Fischer (Mahatma Gandhis liv)
- Şewqên ji dîroka cîhanê; Jawaharlal Nehrû (Glimtar ur värlshistorien)
- Filmê Gandî, Colombia Pictures-1982 (Film om Gandî)

DIVÊ

Ez bende û stembar im
Ji min re serdarek divê
Bi tenê me, bargiran im
Ji min re hevkarek divê.

Her teyrek hêlîna xwe heye
Bes ez im ku bê xwedî me
Bextê we me gelî bira,
Ji min re starek divê.

Nîne tu kes, bê yar im ez,
Her dem bi qisûr û tawan,
Star nakim bi bextê reş,
Ji min re dîwarek divê.

Rê tim li min serhevraz in,
Ji min re berwarek divê
Gelê cîhan serfiraz in
Ji min re mirazek divê.

Ez jî mîna we însan im,
Dil bi kul û perîşan im
Berê yek bûm, îro çar im
Ji min re cîwarek divê.

Çendîn sal e ez kole me,
Li bin lingan şerpeze me,
Ji bo rabim, şareza bim,
Ji min re şîarek divê.

Latîf Özdemir

PINİKÊR

Wî ji ber tirsa do êvarî, nexwest tu rîska bistîne. ji ber vê, bi Azad re dirêj nekir. Devê wî ji şîr şewitûbû û nuha ji tirsa, pif dew dikir. Divê xwe bisitranda. Ji xwe, ji ber problemên malbatî, rewşa Azad a psîkolojîk jî ne musaît bû. Ji ber vê yekê, wî rengê sohbetê guhert û sohbet li ser rewşa Azad a şexsî û malbatî domand. Azad di vê sohbetê de, ne normaliyek ferq kir, lê îtîraz nekir, li gor wî meşîya û dû re jî ew dawetî mala xwe kir;

- Ger tu karê te yê girîng tunebe, em bi hevdû re biçin malê. Em dikarin piştî şîvê, bişînin pê Zîwer û Hemo jî û çend destêن pinikêr bileyizin. Me ji zû de neleyistiye. Bi gotina pinikêr re sahneya lîstika pinikêr ji nişka ve hat ber çavan û dengêن lîstikvanan di guhêن wî de kir zinginî:

- Ji bo derxistinê ji wan re çi qas maye?
- Qoz çi ye?
- Kûpa ye.
- Saxên te çawa ne? Ger saxên te baş be, berê saxên xwe bikişîne.

- Bi usûl bimeşe.
- Ger saxên te nema, destêن wan bide wan.
- Qoz biavêje, wî sedê began xwendibû.
- Tu dixwazî bi "çaqa" min were, ez ê dû re destêن wan bidim wan...

Li hember pinikêr gelek zeif bû. Azad jî bi vê hêla wî dizanîbû. Pinikêr perçeyekî jiyana wî bû. Ji xwe ew bê pnîkêr nikarîbûbihata fikirandin. Lê rebeno, ji ber fediyê, di navbera salêن 1975-an û 1980-yî de, têra xwe neleyisti- bû. Heyfa wan salan, nuha hiltanî. Evîndariya wî ya pinî-



Mustafa Aydogan

kêr ewqas pêş de çûbû ku wî carekê xwestibû li ser vê leyistikê lêkolînekê jî bike. Gelek pirsên di vî warâ de, serê wî meşgûl dikirin. Li hinek deveran jê re digotin, "xoşkîn", li hinek deveran jê re digotin, "nezere" û li hinek deveran jî jê re digotin "pinîkêr". Bi kûrahî lê difikirî. Gelo ev leyistik berê çawa dihat leyiztin? Ji bo çi desteyê pinîkêr ji nava çar desteyên kaxizên leyistikê dihat neqandin? Çima ji herçar desteyên kaxizan, bi tenê dehlib, la-wik, keçik, keşe û yeklib dihatin neqandin? Ji bo çi desteyê pinîkêr ji heyşte kaxizan pêk dihat? Gelo hejmara kaxizên ku desteyê pinîkêr pêk tîne, ne heyşte ba, wê ev leyistik dîsa weha xwes ba û hwd?... Di jiyan xwe de, pêrgî gelek awayê vê leyistikê bûbû. Pinîkêrê bi du kesan, pnîkêrê bi sê kesan ê girtî, pinîkêrê bi sê kesan ê vekirî, pinîkêrê bi sê kesan ê pêric kaxiz veşartî, pinîkêrê bi çar kesan ê her yek ji xwe re, pinîkêrê bi çar kesan ê bi hevaltî û hwd. Awayê pinîkêr yê ku herî pirr dihat leyistin, pinîkêrê bi çar kesan bû. Pinîkêrê bi çar kesan, li gelek deverên cuda yên welêt, bi awayê cuda dihat leyistin, gelek caran qaîdeyên li devereke qedexe bû, li devera din, xwediyê fonksiyoneke bingehîn bû. Ji ber vê yekê, gava çar kes tên ba hevdû û dest bi leyistika pinîkêr dikan, dibêjin;

- Em li gor qaîdeyên kîjan deverê bileyizin?

Wî jî herî pirr bi pinîkêrê bi çar kesan dileyizt. Li hinek deveran îşaredayin û axavtin qedexe bû. Lê di leyistika wî de, axavtin serbest bû. Ji ber vê yekê, axavtinê di pêvajoya leyistikê de dihat kirin, bi qasî leyistikê bi wan xwes bû. Henekên ku li ser maseya lîstikê dihatin kirin, bi tu tiştî nedida. Hezkirina wî ya li hember vê leyistikê, pirsên di serê wî de pirrtir dikir.

Xuya bû, ji bo lêkolîna li ser vê leyistikê, xebateke ciddî û dûr û dirêj pêwîst bû. Gelo ev leyistik cara yekem ji aliyê kîjan gelî ve hatibû leyistin? Ev hersê nav û gotinê din yên ku di leyistikê de tên bikaranîn, aîdî kîjan zimanî bûn? Ji bo çi bi tenê Ermenî, Suryanî, Kurd û Erebê Mêrdînî bi pinîkêr dileyiztin? Gelo ev leyistik li tu deverên din jî dihat leyistin? Belkî ev leyistik li gelek deverên din jî dihat leyistin, lê ew jê ne agahdar bû. Her ku diçû, pirsên di serê wî de pirrtir dibûn. Ji bo çi di derheqa "Brîç" an leyistikê din de pir-tûk hatine nivîsandin, lê pinîkêr ji vê mehrûm bû? Mîna hemû dîroka gelê xwe, di warê leyistikên xwe de jî ji belgeyên nivîskî bêpar bû. Rastiya di vî warâ de, hîn jî di tariyê de bû. Ewrûpî kultura leyistikan ji nifşan teslîmî nifşan dikirin. Lê pinîkêr ji lêbixwedîderketineke weha bêpar bû. Liberketina wî pirs çareser nedikir. Gelo navbera nifşen nuh û pinîkêr çawa ye? Agahdariya wî ya ku di vî warâ de hebû, ji bo bersiva vê pirsê têr nedikir lê tiştê ku dizanîbû, ev bû; pinîkêr hîn jî bi nivîskî pêşkêşî civakê nebûbû. Li gor wî, xususiyetekê din a vê leyistikê jî ev bû ku ev leyistik li bajaran dihat leyistin. Kesên ku bi eslê xwe gundî bûn û bi vê leyistikê dileyiztin jî ya bar kiribûn û hatibûn bajêr û ev leyistik li wir dîtibûn, ya jî pêywendiyên wan bi kesên ku li bajêr rûdiniştin pirr xurt bûn. Li gor wî,

ji ber ku gelê Kurd, bi dû hemû gelên cîran re, dest bi jiyana bajarvantiyê kiribû, ew nikarîbû xwediyê yekem yê leyistikê bihata hesibandin. Lê li gor wî, xwediyê wê yê yekem kî diba, bila biba, tev ku gelê Kurd dû re fêrî vê leyistikê bûye jî nuha bi vê leyistikê dileyi-ze, bi awakî xurt lê bi xwedî derdikeve û wek kultureke müşterek ya gelên Mezopotamyayê didomîne. Ev leyistik di nava muhacirê ji Mezopotamyayê, hatibûn welatêna cuda yên Ewrûpayê jî leyistika herî sereke bû. Gotinênu ku di pêvajoya leyistikê de, dihatin telafûz-kirin, mîna zimanê pinikêr ji aliye herkesi ve dihatin paraztin. Ev müşterek, li gel gelek müşterekên din, Mezopotamyayîyan nêzîkî hevdû dikir û pêywendî û girêdanênu ku ji berê ve, di navbera wan de hebûn, xurttir û dewlemendir dikir. Wî ev tesbîta xwe ji bo parastina xwe ya di warê pinikêr de, gellek caran bi kar tanî.

Gelek kesan ji ber hezkirina wî ya pinikêr rexne lê digirtin û digotin;

- Tu hemû wextê xwe, bi pinikêr derbas dikî û tu tiştekî din nakî, ev ne tu sen'et e.

Pinikêrleyistina wî û ji bo vê leyistinê gelek wextveqetandina wî, rast bû, lê wî rexneya ku dibêje; "Tu hemû wextê xwe bi pinikêr derbas dikî û tu tiştekî din nakî." neheqiyek dihesiband. Wî ji bo iqnakirina xwediyê rexneyan, gelek zehmetî dikişand û carinan jî ji bo leyistika pinikêr bi wan jî bide qebûlkirin, dest bi pesnê pinikêr bikir. Heta carekê hingî pesnê pinikêr dabû û behsa şiyana kesen ku bi vê leyistikê dileyizîn û pêywendiyên zanebûna di vî warî de û entellektuelbûnê kiribû, hevalekî wî yê ku berê rexne lê digirt, lê pişti ızahata wî, nedixwest ji karwanê entellektuelan bi şûn de bimîne, ji bo fêrbûnê, jê ti-ka kiribû. Wî ew danibû ber xwe û bi cidiyeta mamosteyekî dest bi dersa pinikêr kiribû. Bi ızahatêne fireh û bi detay mîrik gêj kiribû. Mîrik xwe di dinyayeke xerîb de, bê nas hîs kiribû. Lê ew ji dersdanê qet of nebûbû û bi hilmeke fireh qaîdeyên lîstikê yek bi yek jê re şerh kiribû:

- Li min binihêre, ji bo vê leyistikê mejiyekî baş şert e. Divê tu ji destpêkê de bizanibî ku herkes nikare vê leyistikê fêr bibe.

Mîrik ji destpêkê de xistibû bin tesîra xwe. Çavên mîrik fireh bûbûn, meraqa wî bêtir bûbû û ji ber peyva ku "herkes nikare vê leyistikê fêr bibe" jî kêfa wî hatibû. Ji ber ku madem hevalê wî ew ji bo fêrbûnê qebûl kiribû, xuya bû ku ji mejiyê wî emîn bû. Wî dersa xwe, wek melleyê duwanzdeh-ilm dabû û ji hevalê xwe re bi sebireke mezin gotibû:

- Desteyê pinikêr ji heyştê kaxizan pêk tê. Ji nava çar desteyên kaxizan ku hejmara her desteyekî 52 ne, hemû dehlib, keşe, keçik, lawik û beg tên neqandin. Di desteyekî pinikêr de ji her rengekî 20 kaxiz hene. Di pinikêr de.....

Herdu jî bi heyecaneke mezin xwe dabûn wezîfeyên xwe. Mîrik di nava dersa bingehîn de, wenda bûbû. Di destpêkê de rehet xuya bûbû û vê jî hewesa mîrik zêdetir kiribû. Mîrik carinan li bende wî nesekinibû û bêyî ku dor hatiba wan, mahneya hin gotinênu ku ga-

va li wan temaşe kiribû hatibûn bikaranîn, jê pirsîbû. Wî ci qas gotibû wê nuha dora wan jî bê, lê mîrik ji bo bersivê israr kiribû. Wî ev rewş bê dilî xwe be jî qebûl kiribû.

Hevalê wî gotibû:

- Nuha rehme li bavê te be, tu ji min re nabêjî, bê “saxkişandin” ci ye?
- Saxkişandin, begên ji derveyî qozkişandine.

Beg? Ma di kaxizan de beg jî hene?

- Belê, em ji “as”ê re dibêjin, “beg”, bega qoz, yanî asa qoz.

Hevalê wî îcar mahneya qozkişandinê pirsîbû:

- Ez bala xwe didimê, hun pirr behsa qozkişandinê dikan, ev qozkişandin, ci ye?
- Qozkişandin, bi bega qoz leyistine.

Hevalê wî pirsên xwe rêz kiribû:

- Mezinkirin ci ye? Texmîn ci ye? Bi usûlhatin ci ye? Çaqkirin ci ye? 100-ê began..... 60-ê keçikan..... 40-ê lawikan.....

Wî her pirs bi kurtî bersivandibû.

- Em ji “mezinkirin”ê re dibêjin, di ser re girtin jî. Ev di leyistika pinikêr de qaîdeyeke bingehîn e. Gava yek bi kaxizekê daket, divê yê ku piştî wî bileyize, ger di destê wî de hebe, mecbûr e ku kaxiza ji ya li erdê mezintir biavêje. Texmîn jî ev e; di desteyê pinikêr de ji her rengekî çar beg hene, ger hevalê te bega rengekî kişand û di destê de du begên ji wî rengî hebin, tu dikarî bibêjî “texmîn”. “Bi usûlhatin”; gava yek ji hevalê xwe re bibêje, bi usûl were, wê gavê hevalê wî bi qozekî biçûk dileyize. “Çaqkirin” tê maneya ku gava rengê ku daket erdê bi mirov re tunebe, mirov ê ji mecbûrî bi qoz bigre. Peyva “çaqkirin”ê bi me gellek leyistikvanen pinikêr nexwes e. Ji ber vê yekê, em dixwazin wê biguherînin û ji iro û pê ve ji berdêla “çaqkirin”ê, gotina “pêvedan”ê bi kar bînin. 100-ê began..... 60-ê keçikan..... 40-ê lawikan.....

Pirs û bersiv bi rojan dewam kiribû. Êdî hevalê wî dev ji wî bernedida. Lê wî jî pirr dixwest hevalê wî fêri vê leyistikê bibe. Ji ber ku carinan sê kes digîhaştin hevdû, lê heta yê çaran peyde dikirin, çavêwan dirijiya. Bi armanca ku hevalê wî dikare carinan bibe yê çaran, di derheqa pinikêr de ci dizanîbû pêşkêşî wî kiribû. Hevalê wî di demeke kin de, ne pirr lê bi qasî ku yê çaran temam bike, ev lîstik fêr bûbû. Lê tev vê jî wî ji leyistika hevalê xwe zewq nedistend. Ger ne ji mecbûrî ba, bi wî re nedileyist. Ji xwe wî ev leyistik bi herkesî re nedileyist. Raqîbê wî jê nezantir ba, ji wê lîstikê qet tu tahm nedistend. Hem jî leyistikê û hem jî ji muhabeta ku di pêvajoya lîstikê de çêdibû pirr hez dikir û qet nedixwest bi tu tiştî biguhere. Li gor wî, yê wan bi tenê hobîyek bû. Hobîyek ku muhabet xweş dikir. Ne wek qumara Suleyman Xan û Haşmet Dîwan bû, ne wek rewşa “John Montagu Sandwich”ê Ingilîz bû û ne jî dişibîya tu danûstendinên din. Hobîyek e ku ji berdêla mi-

rov jê şerm bikira, divê pê bipesiniya bû.

Lîstikên wî qet ji bîra wî nedîçûn. Hema hema hemû listikên wî dihatin bîra wî. Gava hinekan bigota; " Ma nayê bîra bê me filan salê ci anî serê te?" Ji bo amadekirina bersivê, tavilê dipirsî; "Ya li mala filankes?" Dû re jî dest bi ızahata sedemên têkçûna wê rojê dikir. Heta carinan digot; Me lîstik pirr bi rehetî derdixist, lê hevalê min qoz nehejmartibû û ji ber wê, çewt lîst, bega qoz kişand û bega min xist. Ev jî bû sedema ku em bi 20 (bîst) hejmaran têkevin hundur."

Gellek caran di nava xeyalên lîstikên xwe de wenda dibû. Do ne pêr jî bera Zîwer û Hemmo dabû. Gava Azad behsa Zîwer kir, ji nişka ve ketibû nava xeyalên wê lîstikê.

Wê rojê ew, Zîwer, Heso, Simaîl, Kermo û Şêxo bi hevdû re çûbûn mala Hemo. Gava deriyê asansorê vekiribûn û derbasî korîdorê bûbûn, bêvila wan bi kombînezona hilma çend xwarinê cuda ve hatibû dagirtin. Kevaniya malê ya ku berê bi telefonê hatibû agah-darkirin, ji rewşa wan fahm kiribû ku ew şev dê şeva pinîkêr ba. Li nûçeyen Merhabayê* guhdar kiribûn û beriya ku dengê radyoyê hatibû birrîn, Simaîl bi xwe nikarîbû û rahiştibû destê kaxizan û ew du caran şeh kiribû. Hîn cîhê xwe baş xweş nekiribûn, kevaniya malê ya ku ji ber tecrubeya bi salan di vî warî de kone bûbû, ji wan re gotibû:

- Beriya ku xwarina we sar bibe, we xwarin bixwara, wê baş ba.

Bi çavên xemgîn li hevdû nihêrîbûn û Simaîl kaxizên di destê xwe de bêdîlî xwe danîbû ser maseyê. Hemuyan bi situxwarî li destê kaxizên ku ji aliyê Simaîl ve hatibû lihevdûxistin nihêrîbûn û mîna ku bibêjin "emrê me ji xwedê re", derbasî metbexê bûbûn.

Maseya xwarinê bi tîrşîk, birinc, şorbeya nîska, bahcanê bîraştî, zelete, dewê ku qesa di nav de û nanê germ ê malê ve hatibû xemilandin. Simaîl tev keda kevaniyê û mesrefa ku hatibû kirin ji bi çavên xemgîn û bê sebir mîna ku bibêje; "ev xwarin nahêle em ji xwe re têr bi kaxizan bileyizin", li wî nihêrîbûn.

Xwarin bi lez xwaribûn. Édî nema dihat idarekirin, li bende çayê jî nemabûn. Maseya metbexê paqjî kiribûn û kaxizên pinîkêr danîbûn ortê. Kevaniyê li rewşa wan nihêrîbû ku ne yên îqnakirinê bûn. Ji ber vê yekê gotibû:

- Bila firax bimînin, ez ê wan sibehê bişom. Lê ma hun ê çayê vexwin an qahwê?

Hemo ji nişka ve gotibû:

- Ez çayê mayê venaxwim. Ez ê araqa xwe vexwim, ka bîne nuha cemidiye. Ez gava araqê vedixim, baştir dileyizim.

Hemo araq wek avê vedixwar. Ji xwe nema dizanîbû bê kîjan av e, kîjan araq e. Jiyana sirgûnê araqvexwarin kiribû xusûsiyetekê wî. Hevalên wî dikirin û nedikirin, nikarîbûn ew jê vegeranda.

Hemo her digot:

- Ez dizanim bê ez çi dikim.

Hemo hingî weha pirr vedixwar, hevalên wî henek pê dikirin û digotin:

- Édî ne hewce ye ku tu ji bo kirrîna araqê biçî “Systembolaget”ê (dikana ku araq lê tê firotin), em ê xortûmekê ji dikanê bikişînin mala te û bila wek nargîleyê li ber te be.

Heta ku Hemo araqâ xwe xwestibû û yên din jî daxwaza çayê kiribûn, Zîwer ji firsetê îstîfade kiribû û kaxiz çend caran li hevdû xistibû jî. Gava yên din pê hesiyabûn, jê pirsîbûn:

- Destê kê ye?

Zîwer bi awakî ji xwe ewle gotibû:

- Ne destê kesî ye. Kaxiz li ortê ye.

Wê gavê wî xwe negirtibû û wek hertim bi munaqeşeyeke bê rawestan, ketibû qirika Zîwer:

- É, madem kaxiz li ortê ye, ji bo çi te kaxiz şeh kir.

- A, va min danî. De ka bazar bikin.

- Tu hertim weha dikî. Ger te kaxiz şeh kirin, divê tu destê xwe jî bidî.

- É baş e, yabo, em careke din weha nakin. Xuya ye li ba we weha tê leyiztin, em ê li gor qaîdeyên we bileyizin.

Edî ji hêrsa nema dizanîbû bê wê çi bigota, ji bahca dikira teqiyaba. Bi qehir û bi qêrîn gotibû:

- Lawo haho! Ji bo xwedê ma qaîdeyên ba me û yên ba we cîhê ne? Ma ne ez û tu ji ey-nî deverê nin. Ma me li eynî qahweyê hezar carî bi hevdû re neleyiztiye? Tu li xelkê weha dikî, ma li me jî lawo. Çavêن xwe veke!

Zîwer hatibû girtin, lê ez heyrana wî kesî bim ku bikarîba lê tesbît bikira. Hemo dizanîbû ku Zîwer dê qebûl nekira û munaqeşê dê her weha berdewam ba. Ji ber vê yekê gotibû:

- Ka bisékînin, lo! Me hîn dest pê nekiriye, hun dikin li hevdû bixin, îcar xwedê dizane bê hun ê di leyistikê de çi bînin serê hevdû.

Wî bi çavên ku li alîkariyekê digeriya, gotibû:

- Ma hun wî nabînin, bê çi dike?

Zîwer xwe avêtibû ortê û bi edayeke wek hertim xwedêgiravî bi heq gotibû:

- Hun ji bo çi guhêن xwe didin wî? Ew eşhed û billeh, dikare ji libik tirî mahsereyekê çêbike. Hema bila xwedê di orta me û wî de be. Ji bo xwedê wî çi got, qebûl bikin, bila devê wî bê girtin.

Wî teb'ê Zîwer dizanibû, loma kiribû niçe niç û gotibû:

- É yabo, ez neheq! Ma ji xwe pevv bi te re nabe.

Zîwer wek ku hertim dikir, vê carê jî tişt qebûl nekiribû û xwestibû dest bi leyistikê bike û munaqşeyê di wir de bidomîne:

- Kuro, ma tu hatiye peyvê? Ger tu bi xwe bawerî, a va ye kaxiz û dest pê bike. Tu weha nîkarî moralê me xera bikî.

Ew di ber xwe de keniyabû û gotibû:

- Gurrîko, navê min li te û kumê min li serê te!

Simaîl xwedêgiravî ji bo çareserkirinê, lê ya rastî, ji bo tiştekî Hesoyê birayê Hemo eşke-re bike, gotibû:

- Van kaxizan rakin û yên ku Heso ji keştiyê kirribûn, bînin.

Hemo bi meraq jê pirsîbû:

- Ji bo çi yên Heso? Ci hunera kaxizên Heso heye?

Simaîl bi ken û bi mahne gotibû:

- Yên wî, yên Estonyayê ne. Ma nayê bîra te ku ew sê meh berê çûbû Estonyayê? Gava vege riya di keştiyê de kirribû:

Îcar Zîwerê ku kêfa wî ji guhertina mijarê munaqşeyê re hatibû, pirsîbû:

- Ci karê Heso li Estonyayê hebû, lo?

Simaîl bi rehetiya yê ku gîhaştibû merama xwe, gotibû:

- Welleh, qet, bi tenê pratîk...

Zîwer dîsa fahm nekiribû, an jî nexwestibû fahm bike.

- Pratîk?

- Belê, Pratîk. Pratîka zimên!

Meraqa Zîwer bêtir bûbû.

- Pratîka zimên çawa? Ma Heso zimanê Estonyayî fîr bûye?

Simaîl êdî bi temamî gîhaştibû merama xwe.

- Ez êdî nizanim, ji wî bipirsin.

Wî rewş fahm kiribû û ji Simaîl re gotibû:

- Lawo tu ci ecêb ! Te asoxî lawok hetikand. Ecêb nebû ku lêwik xwest carekê xwe ji te vedize û tiştekî bike... De dev ji vê meseleyê berdin, lo. Zîwer, ka ji xwe re hevalekî peyde bikî. Tu kes nema dibe hevalê te jî. Ji ber ku kî dibe hevalê te, ew jî bi te re dihetike.

Zîwer serê xwe kil kiribû û gotibû:

- Maşallah, devê te dîsa vebû, ha! Tu yê xwe peyde bikî, yê min rehet e.

Kaxiz danîn ser maseyê. Ew û Simaîl bûn hevalê hevdû, rakîbên wan jî Hemo û Zîwer bû. Hemo ji kevaniyê kaxiz û pêñusek xwestibû û gotibû:

- Ez ê hejmaran binivîsînim.

Çav li kaxizên ortê bû û bi wî awayî dest bi bazarê kiribûn. Zîwer serê xwe bilind kiribû

û ji hevalê xwe re gotibû:

Hevalo, tu bazarê ji min re bihêlî, ez ê dînê wan teneke bikim.

Wî gotibû:

- Bi 500-î, ji me re.

Lê Zîwer lê zêde kiribû û gotibû:

- Ji me re bi 510-an.

Wî li hevalê xwe nihêrîbû, gava hevalê wî deyn nekiribû, cesaret stendibû û gotibû:

- 520

Zîwer dîsa lê zêde kiribû:

- 530

Wî nema wêrîbû li Zîwer zêdebikira û ji ber vê yekê, gotibû:

Vekin!

Ü bi 530-yî li ser Zîwer mabû. Diviyabû tev hejmar û kaxizên di leyistikê de bihata qezenzkirin, bi kêmanî 530 hejmar bidana ser hevdû. Ya na, wê biçûna hundur, yanî hem hejmarêwan ên wê leyistikê dihat xerakirin û hem jî 530 hejmar wek deyn diket situyê wan.

Wî dest bi dana kaxizan kiribû. Kaxiz pênc pênc dabûn. Hemo wê qoz çêbikira. Di destê herkesî de panzdeh kaxiz çêbûbû. Pêncê dawiyê dihat belavkirin. Bi vî awayî dê herkes xwediyê bîst kaxizan ba. Gava dor hatibû ser herpênc kaxizên Hemo yê destê dawiyê, wî ji Zîwer pirsîbû:

- Tu ê destê dawiyê bidî hevalê xwe?

- Zîwer ji ber heyecana ku ketibê û meraqa ku gelo hevalê wî qoz dîtibû an na, nema dikarîbû bipeyiviya, carekê xweziya xwe daqurtandibû û dû re bi zorê gotibû:

- Erê.

Wî bi teb'ê Zîwer dizanîbû, ji ber vê yekê, ew îqaz kiribû:

- Lê divê tu wek hertim neke, ha! Ger tu lê binihêrî, divê em jî wan bibînin.

Zîwer gotibû:

- Temam temam, tu ji xwe re li lîstika xwe miqate bî.

Dilê Hemoyê ku dê qoz çêbikira, kiribû te û rep. Pirr ditirsîya ku leyistikê dernexîne. Loma Zîwer halan di wî de hil dabû û gotibû:

- Ci hejmar ketin destê te, deyne. Ez birayê te mim, ez ê li ser wan temam bikim.

Hevalê Zîwer bi streske mezin kaxiz yek bi yek kişandibû, lê nihêrîbû û kiribû ufe uf. Di nav re jî gulpa xwe ya ji qedeha araqê îhmal nekiribû. Zîwer bi çavên bi meraq lê nihêrîbû û gava deng ji hevalê wî derneketibû, jê pirsîbû:

- Dest çawa tê?

Hevalê wî bi awakî bê hevî gotibû:

- Bi xwedê, ger weha dom bike, xerab e. Min ji te re got, bazarê ji min re bihêle. Ji te heye ku ev leyistik bi tenê bi kirrînê tê leyistin.

Zîwer bi berger gotibû:

- Ma bîst hejmarên te jî tune?

Hemoyê ku kaxiz bi hêrs kişandibû, qeherîbû û gotibû:

- Na kuro! Ma qey tu bawer nakî? Ger hebe bi te bimîne, lo!

Zîwer awayê xwestinê guhertibû:

- É baş e, keşe û keçikên nezewicî deyne, va pênc kaxizên te li ba min e, ez ê wan bizewicînim.

Hêrsa Hemo bi qedeha araqê jî daneketibû:

- Lawo, tuneye, tuneye! Ma qey tu fahm nakî?

Simaîl bi qerf gotibû:

- Bi hevdû ketin, ha!

Zîwer pê re xeyidîbû:

- Tu li karê xwe binihêre!

Dû re zîvirîbû ser hevalê xwe:

- Ka deyne, ez wan bizewicînim, lo.

Ew bi halê Zîwer keniyabû û gotibû:

- Çi xwe zewicandiye, îcar dora keşe û keçikan e!

Zîwer ji Hemo re gotibû:

- Tu li wî guhdar meke, bila heta sibehê bipeyive.

Simaîl ji wî re gotibû:

- Hevalo, dev ji wan berde, guneh in. Ma tu lê nanihêrî ku ew bi hevdû ketine?

Hemo di bin çavan re lê nihêrîbû û di ber xwe de gotibû:

- Tu ci xwedanxêr î, lawo!

Simaîl disa qerfê xwe kiribû:

- É lawo, xêr jî bi we nabe.

Zîwerê ku destê wî ji heyecanê diricîfî, ji wî pirsîbû:

- Eyna te ci bû?

Ew keniyabû û ji hevalê xwe re gotibû:

- Hevalo, guhdar bikî, îcar li ser eynê man in.

Zîwer bi hêrs:

- De ka bibêje! Divê heta ku qoz neyê gotin, eyna te ji erdê ranebe.

Ew dîsa ketibû xulqê Zîwer:

- Îcar li mahneyan digere, ha!

Zîwer bi hevalê xwe biliyabû û dev ji ceynê meynê jî berdabû. Qoz hatibû gotin bi herduyan 220 (du sed û bîst) hejmar hatibû nivîsandin. Zîwer dest bi hesêb kiribû. Ji bo vê, ji hevalê xwe pirsîbû:

- Sax û qoz çawa ne?

Hevalê wî bi awakî ji xwe ne ewle, gotibû:

- Çend saxên min hene û qoz jî ne xerab e, lê nizanim...

Zîwer hesabê xwe domandibû:

- Yê min; 40-ê pinîkêr û 60-ê keçikan. Yê te ci qas bû?

Hevalê wî dîsa li destê xwe nihêrbû û gotibû:

- Yê min jî bîstê maça û sedê began...

Zîwer:

- Bû 220. Ma 310. Ma tu dibêjî ci, em ê bikaribin derxîne? Sax yên me ne, lê zehmet e.

Ma qozê te pirr xurt e?

Mirov digot, qey hevalê wî ji qazî dilê wî rehet nedikir.

- Yaho, xurt çawa... normal e. Ger yê te jî baş be... belkî...

Zîwer di hundurê xwe de gotibû;

- Lawo, ne ji mecbûrî ba, ez nedibûm hevalê te, lê

Zîwer wek hertim vê carê jî hevoka xwe temam nekiribû. Herkesî hejmarêن xwe ji erdê rakiribûn û dest bi lîstikê kiribûn. Édî bi hemû awayî konsantreyî ser lîstikê bûbûn. Den-gêñ lîstikvanan tev li hevdû bûbû. Herkes ji aliyê xwe ve, bi awakî peyivîbû:

- Saxê xwe bikşîne. Ger nema qoz jî bikşîne!

- Bi usûl were ba min.

- Ger tu nikaribe "çaqa" wî bidê.

- Ma tu nikarî mezin bîkî?.....

Zîwer ji nişka ve piçekî rawestiyabû û ji hevalê xwe pirsîbû:

- Ma destê te sax dibe?

Dû re beriya bersiva hevalê xwe, fikra xwe guherandibû û ji hevalê xwe re gotibû:

- Qoz bikşîne!

Hevalê wî kiribû ufe uf, du hilm li çixareyê xistibû û jê re gotibû:

- Tune, welleh tune!

Zîwer nexwestibû bawer bike:

- Kuro, ez dibêjim bikşîne, dibêje tune!

Hevalê wî êdî jê tije bûbû:

- Lawo, tune! Ma em ji te re Hemo Mûsikê dibêjin? Te du dest belaş da wan, îcar nuha,

tu li saxbûna destê min digerî.

Derxistina 530-yî her çûbû zehmettir xuya kiribû. Çewtiyeke herî biçük dikaribû hemû hêviyên di warê derxistinê de têk bibira. Heyecaneke mezin ew dabû ber xwe. Heyecana yên li dorê, ji ya lîstikvanan bêtir diyar dibû. Herkes li ser lîstikê konsantre bûbû. Ji deriveyî lîstikê tu tiş nedihat fikirandin. Di mejiyê Zîwer de rengên kaxizan li bin guhê hevdû diketin. Devê wî zuha bûbû, destê wî dilerizî. Ji xwe û hevalê xwe pê ve tu kes nedidit. Bi pirsan hem xwe û hem ji hevalê xwe gêj kiribû. Zîwerê ku bi yekcarî ketibû tev, tew qedeha çayê ya ku kevaniya malê danîbû ber wî ji nedîtibû û gava bi destê xwe yê rastê kaxiza ku dê biavêta erdê bilind kiribû, destê wî li qedeha çayê ketibû û bi ser maseyê de rijandibû. Hemo devê xwe tije kiribû ku paçikekî bixwaze, lê Zîwer ji ber tirsa ku heta paçık bi-hata, wê mahta wan sar bûbûya, guh nedabû nuhbûna cakêtê xwe û milê cakêt di maseyê dabû. Herkes şaş mabû. Zîwer ji nema dizanîbû, bê ci kiribû. Simâil debar nekiribû û jê re mesela herçar kesên bi pokêr leyiztibûn, gotibû:

- Zîwer te ji wek wan herçar kesên ku bi pokêr dileyiztin, kir. Çar kesan bi pokêr dileyizt. Perekî pirr mezin di ortê de bû. Yekî got; "rest", yê din hîn difikirî. Yekî din got, terp û ket û mir. Dilê wî ji heyecana lîstikê sekinîbû. Hevalekî wan pirsî "Em çawa bikin?" Tew tu kes li termê li ser maseyê bû, nedifikirî. Yekî ji wan, ji bo ku lîstik nesekine û maht sar nebe, ji wan re got; "Heftlib û heyşliban jê derxîne, da ku em hersê bikaribin dewam bikin".

Hemû bi hevdû re kenyabûn, lê Zîwer sor bûbû û çavên wî nema kaxiz ji ditibû...

Di nav re çûbû. Tew Azad û teklîfa Azad ji bîr kiribû. Ger Azad ew şiyar nekiriba, wê hemû lîstikên wê şevê ji nû ve bijiya. Lê bi xêra Azad, li xwe hay bû. Azad jê pirsî;

- Xuyaye guhê te ne li min e. Dîsa ci bi te hatiye? Ma tu ji teklîfa min re ci dibêjî? Tu ê bê an na?

Ji bo ku Azad ew ji xeyala pinîkêr şiyar kiribû, hebekî aciz bû û di dilê xwe de got;

- Ev Azad ji nahêle ku mirov ji xwe re têra xwe bifikire.

û dû re berê xwe bi Azad vekir û got;

- Welleh, sipas. Bila bimîne rojekî din. Zîwer hîn du roj berê, li mala Hemo dersa xwe stend. Nema tê bîra min, bê me çend caran bera wî û Bûbê da. Ew wek hertim dîsa pirr qeherî û bela xwe hem di hevalê xwe û hem ji di me de da. Heta carekê kaxiz ji destên xwe avêt û got; "Ez nema dileyizim" Em hemû li ber geriyan û me asoxî ew razî kir. Lê di dawiya leyistikê de, dîsa qeherî û hertiş kir sûcê Hemo û sûnd xwar ku ew ê di pinîkê de, tu carê din hevaltiya Hemo neke.

Azad xwe negirt û avêtibû ortê;

- Ez dibêjîm, belkî ew ji leyistika we bêtir, ji gotinê we aciz bûye û nuha ji bo heyfihila-

nînê jî li her deverê li we digere.

Ew li ser vê peyvê keniya û got;

- Ez vêya dizanim, lê ji bo ku ez dilê wî rehet nekim, ez ê heta çend rojêñ din jî xwe rê wî nedim.

Anonsa trêñê axavtina wî birrî, lê piştî anonsê dîsa dewam kir;

- Kuro, ma tu nizanî bê ew çawa ye? Gava ku carekê çûk li kevirê wî bikeve û desteyekî bera mirov bide, kî dikare wî rawestîne. Ji xwe, yê wî hertim weha ye; kevirê wî tu carî bi zanebûn li çûkan nakeve, lê çûk têñ li kevirê wî dikevin. Wê carê jî gava em dibêjin; "Ka were, em careke din bileyizin, lingêñ xwe yê rastê diavêje ser yê çepê û kil dike û dibêje; "Herin ji xwe re fêrî vê leyistikê bibin û dû re werin." Welleh bi peyvê be, em kês pê nikarin.

Azad dizanîbû ku Zîwer xwe pîrê pinikêr dihesiband. Pîrê li sîrgûnê. Ji ber ku ew bi eslê xwe, ji Dêrika Çiyayê Mazî bû jî di vî warî de payeke bilind dida xwe. Heta, Derikibûna gellek kesan ger bi henekan ba jî divê ji aliyê wî vebihata tesdîqkirin. Wî tu carî qebûl nedikir ku hinekî din dikare jê baştir bileyize. Ev hêla wî ya herî qels bû. Gellek caran di leyistikê de, şiyana yê li hember xwe biçûkdîtin, dibû sebebê têkçûna wî. Lê wî ev qet qebûl nedikir û ji çewtîtiyêñ xwe bêtir, xwe li ser yên hevalê xwe konsantre dikir.

Azad lê nihêrî ku niyeta wî tuneye, weha got;

- È, tu dizanî, birako. Tu bihata, wê xweş ba, lê xuyaye tu îro ne musaît e û ya rastî, tu naxwazî dilê Zîwer û Bûbê rehet bikî. Wê gavê, bila bimîne rojeke din.

Azad xatir jê xwest û di îstasyona pêşî de daket. Dû re deriyê trêñê hatin girtin û du pîrekên ku bi bazdan, ber bi trêñê ve direviyan û negîhaştin trêñê, li ber deriyê trêñê rawestîyan û bi kerb lê nihêrîn. Lê trêna ku li gor qaîdeyan diherikî, li hîsêñ mirovan guhdar nedikir. Du alkolîstêñ bi vir de û wê de kil dibûn, ji trêñê re şûşen xwe kil dikirin... ↗

EVÎNA CIZÎRÎ Û CEGERXWÎN

Heyderê Omer

Melayê Cizîrî; helbestvanê ku di pena navâ toreya kurdî de bi nav û denge e, serkêş û pêşengê klasîkên kurd e. Dîwaneke gewre ku bi xebara Şêx Ahmedê Zivingî, şirove bûye, li şûn xwe hiştî. Di helbestên xwe de Şeyda xuya ye, û dil û cergân wî bi germa evînê, sotî xuyanin.

Cegerxwîn jî toxâ (ala) klasîkan, ta vê çerxa bîstan, bilind hildaye û xwe daye xuyakirin ku ew jî bi ber dava evînê ketiye.

Karê me jî, di vê vekolînê de ew e ku em bi kurtî, li nik evîna herdu helbestvanan rawestin, da karibin , ne tenê akama Cizîrê, li Cegerxwîn, lê xweristiya evîna wan jî, berçav bikin. Ji bo vê babetê, emê du helbestên wan, ku li bin sernava(Dil ji min bir)*, hâtine hûnandin, versînin.

Her kesê ku li wan herdu helbestan vege-re, wê bibîne ku her du helbestvanan dilber û bandûra evînê wê, dane ber xwe, lê haya wê bandorê akam numa bikin, pesnê (wes-fê) hin beşen gewdê dîlberê didin:

Bejna wê li rex mele serw e û tox e. Û li rex Cegerxwîn jî serw e û şaxê nû şivîn e.

Gerdenê wê, li nik herduwan şemal e. Dêmê wê li bal mele dur e, nedîr e, heyv e û roj e. Li bal Cegerxwîn jî roj e, ji şana hen-givîn e, sipî ye, dur e û ji rengê tavê ye. Ebriyên wê, li cem Mele nûn in, xar in, zirav in, heyv in û das in. Biskêñ wê, li bal Mele, dal in (tipa dal 'erebî), sema ne, herîr in, li dor dêm çember in , li ser dêm bela nin û şêreng in. Dîlbera Mele, xemrî por e û ya Cegerxwîn reş-por e. Ya Mele awir piling e û ya Cegerxwîn awir şûr û şêr e. Ya herduwan peyvşêrîn e, û ya Cegerxwîn newqzirav û lêvşêrîn e jî.

Dîlbera Mele bi gelempêr şox, şeng, na-zik, şêrîn, xeram, ciwan, şêr, eywanmeqem û serfiraz e. Ya Cegerxwîn jî, Şox, Şeng na-zik, şêrîn, ciwan, gewr, kaniya ava heyatê û borciwaz e.

Evîn, rewşen, (pesîn, sîfat) herduwan li nik her du helbestvanan û di herdu hel-bestan de ku bi xwe jî rewşen evîneke bi pêjn (hissî), ku bêpariya evîndaran numa dike.

Tecrûba evînê, bê hebûn û hev-evîna

herdu aliyên wê (jin û mîr) naçe serî û ga-va herdu helbestvanên me di evînê de bê par xuya dibil, bêguman, em dikarin bibê-jin, tevî ku belkî her yekî dilberek dabe ber xwe jî, tecruba wan ji ber kêmbûna lenger e, ji ber ku ew rewşen bipejn, nemaze li nik Cegerxwîn tîbûneke evînî berçav dikan û nebûna hev- evînê teqez dikan. Lewre em bawer in ku ewna û yarêن xwe negîhane hevdu. Ji ber vê, em dibêjin, tecruba wan ya evînî neçûye serî û ewna bêpar mane. Çunkê evîn, têkilîyeke ku bingehê xwe yê biyolajî li ser xwaziyeke peyatî (cinsî) vedi-ne û pêk tê. Têrkirina wê, ji bo dûzana ke-sîtiyê, pêwîst e. Lê gava evîndarêن şeyda (muteyyem), ji ber hin sedemên civakî û ayînetî nikarin wê xwaziyê bi awayekî biyo-lojî têr bikin, ewana di navbera pesnê gew-dêñ yaran re wek dêm, çav, lêv, gerden, sîng û qitikan, wê xwaziyê têr dikan û kesî-tiya xwe bi dûzan û li hev diparêzin. Lê be-lê ev têrkirina bi me'newî, derbirîneke (tee'bîr) ku li astayekî hunerî yê bilind, jê re divê. Ma gelo herdu helbestvan gihiştibûn vî astayê bilind an na?..

Helbesta Mele klasîk e. Ji 30 malikên ku pêlawaza remel (a urûda 'erebî) siwar bûne, pêk hatiye. Pêlikên wê jî ev in: Faîlatûn ('erebî), lê Mele pêlikek jê kêmkirî ye, ev yeka ne şermeke hunerî ye. Lê lezîna hêrsê wî, di vê navê de dide xuyakirin û bêteba-tiya ku tê de ji dest germa evînê dijî, eşkere

dike. Lê bêtebatiyekê tenik e û wê derbaz astayê xewrevînê nebe, ji ber ku wêneyên helbestî, li nik wî bi dûzan û lihevhâtî nin û tebata wî teqez dikan.

Şox û şengê, zuhre rengâ,
Dil ji min bir, dil ji min.
Wê şepalê, miskî xalê,
Dêm durê, gerdan şemalê,
Cebheta, biskan sema lê
Dil ji min bir, dil ji min.

Bi rastî jî, derûna mirov, ji komek hest peyda dibe û qeşengî jî ji wan hestan dikşî-ne û dilerzîne. Lewre li hember lerzîna ku wê keçika şepal, dilrevîn û biskema berdaye hestê Mele, em bi carekê mat nabin. Çunku tiştê ku dilan dihejîne, hêja ye ku çeleng be. Bi vî awayî, girêdanêñ ku di navbera destpêk, û encaman de zelal û rava li ba Mele xuya dibil.

Çarînên helbesta Mele tev bi vî awayî rêz dibin û serketina wî di penava stilê kilasîk de, berçav dikan. Di afirandinêñ hunerî de, divê durvîn wan, berdestiya naverokan bi-kîn, eger ne wilo bin, ew afirandinan len-ger û birîndar dibin û bandûra wan li xwendekaran sivik dibe. Ji ber ku hingê ner-astiya hunerî ya hunermend, tazî dixuye. Lewre, gava helbesta Mele bi kêş, rêzbend, wêne û peyvîn xwe re, lihevhâtî û bi dûzan tê, rastiya wî di evîna wî de, tevî ku belkî

yarê, lê ne guhdar bû jî, berçav dike.

Cegerxwîn jî, ev babat dabû ber xwe, lê stîl û ramanêن Mele tev li nik wî diyar in. Reh (kok) û damarêن wateyên wî, ji yên Mele dipiškivin. Lê ji dest cîhtengiyê, hemû wate û ramanêن Cegerxwîn, bidin ber yên Mele. Xwendekarêن me dikarin li herdu helbestan vegerin, da bi xwe wan bibînin. Tenê em dixwazin hin rewşen ku Cegerxwîn xwestibû wan biguhere, rawestin, da bibînin ka ji torra bandûra Mele rizgar bûye, an na.

Dîlbera Mele dêm nedîr e, ango, bi ronahî ye. Cegerxwîn ev wate birî û got “Dêmên rengê tavê”. Tenê peyv guhertî ye û wate ya Mele hîştiye, ji ber ku herdu peyvîn nedîr û rengê tavê, wateyê didin. Tevî vê ji hevoka Mele ji ya Cegerxwîn xurttir, tasttir û zelaltir e. Çunkê peyva (dêm) ji mirovekî re, bi piranî, bi kar nate. Dîsan jî gotiye”dêm ji şana hingivînê”. Ev wêne, ji herdu alîyên wate û zimên ve ne li hev e, ji ber ku çelengîya hingiv çejtî ye (zewqî) û ya dêm çavkî ye (nêrîn, dîtin). Ango rewşeke beşdarî, di navbera herdu aliyên wekhevbûnê de nî ye. Ev yeka rewnbêjiya (2) wekhevbûnê qels dike. Ji warê zimên ve jî, ya rast ew bû kû bigota (Dêm ji şana hingiv e), an (Dêm ji şana hingivîn e), an jî Dêm hingivînê). Ji ber ku (ê), di hevoka Cegerxwîn de bernavê ku li dîlberê vedige-re ye. Ü hingiv, rewşa (şana) wê ye, bi care-

kê ji çenabe ku bernavê tiştekî, têkeve rewşa tiştekî dîtir. Em bawer in ku kêşê û rêzbendê (qafîye), Cegerxwîn neçar e yê vê çewtiyê kirî, lewre ev wêne, li balê qels û sist bûye û nemaze jî daçeka ev wêne qelstir kirî. Ji ber vê yekê jî ev wêne nehîha rewanî ya ku bi perê Mele saz bûye.

Ebriwên dîlberên herdu helbestvanan, wek heyy û kevan in, lê yên a Cegerxwîn, (das) in jî. “Ebriwên wek heyy û dasê”. Hebbûna dasê, di vê hevokê de, nazikiya vî wêneyê hunerî talan dike, ji ber ku xweristiya wê ya hesinî, sîtemeke dijwar li ebriwan di-barîne û di derheqê wê keçika (Ciwan û newqzirav) de, Cegerxwîn, tawakar dike.

Biskên wan dîlberan, mîna tipa (dal) in, angó li hevgerîn in. Li rex Mele, heyâ da-wiya helbestê, li hevgerî dimînin, lê biskên yara Cegerxwîn wilo namînin, hin caran (dal) û “bûne çember bisk li dor dêm û hincaran jî “bisk li ser dêm bela” nin. Ne nehêni ye ku biskên wek (dal) û (çember) li hevgerîn in, lê yên (bela), ber jêr diheri-kin, angó yên lihevgerîn û yên bela, ne wek hev du ne. Tevî vê jî, Cegerxwîn, me li hember rengê wan biskan mat dihêle, ji ber ku rengê wan (şê) ye. “Şengulî berdan bi mestî”, lê porê wê (reş) e, “por şevê, rû rengê rojê”. Em nizanîn çawa biskên şe û porê reş, wê li yek serî bêne siwarkirin!.. Cegerxwîn, di penava rengan de, careke dîtir dikeve vê çewtiyê, ji ber ku, hin caran,

yara xwe (sipî) pêşkêş dike, “dêm sipî, xal gewr û sorê”, “rengê berfê sîng û zendê” û hin caran jî, wê bi rengê gewr, li me dimîne, “borcewazê, gewr û nazê”. Tevî ku, em nizanin herdu rengên (sipî û gewr), ji hev du ve nêzîk in, lê ji hev du cuda ne jî û bi carekê çenabe tiştek, bi her duyan, bête pesindan. Em bawer dikan ku Cegerxwîn pesnê du yaran dide.

Cegerxwîn, pirî car, di vê helbestê de, ser Mele de, pal vedide û watiyêن wî bi kar tîne. Gava ku pesnê peyvên yara xwe dide, dibêje, “peyve qendê”, lê Mele, berê gotibû “şérîn kelamê” û gava Cegerxwîn, pergala wê ya civakî berçavê me dike, dibêje, “ketme tora borcewazê” û “ez birim birca sera-yê”. Lê ev wate jî ji bal Mele birî, çunki Mele berê gotibû “Totiya eywan meqamê”.

Ev têbînêن ku me li jor berçav kiribûn, didine xuyakirin ku Cegerxwîn di bin deyñê Mele de milxwar e, di hemû wêne û watiyêن xwe de, deyndarê Mele ye û ne tenê bi pêş wî neketî, lê wate wêne û nîşanêن (remz) hunerî, yêñ Mele, di destan de lerzandî bûne. Ma gelo ci yê nepenî, di paş vê yekê de, peyda ye?!!..

Gava em bibêjin: Raman; wate, zimanekî bêdeng e û ziman jî ramanekî bi deng e, em hingê, ti tiştê nehînî aşkere nakin, ji ber ku zanyarêن civakî, ji zû ve, tiliyêن xwe dane ser vê rastiya ku, lihevhatina raman û zi-

mên pêwîst û diva bibîne. Lewre, gava ramân ne sayî û ne zelal be, an di bin mij û dûmanê de mexel be, hîngê ziman û derbirina ku wê ramanê didin ber xwe, lerzandî, û bê dûzan têñ, ji ber vê, em dikarin bibêjin wêneyê dîlberê di heşê Cegerxwîn de, ne numaye. Çunkê, hin caran pesnê wê bi rewşen tersî hevdu, dide, wek “sipî, gewr, porşev, şegulî”. Ev çewti jî, ne tenê wî ji evînê, lê ji dîlberê jî bêpar dike.

Erê, me gotibû Mele jî bêpar e, lê, bê gu-man, wî dîlberek dabû ber xwe, jê hej dikir û kela evînê, wê bêpariyê, di vê helbestê de, dirêt. Gîhaye wê, an na, ev ne ciyê pirsê ye û ne jî evîna wî sar û birîndar dike. Li-hevhatina naverok û durvê helbeste wî, neynika vê baweriya me ye. Lê mixabin ne tenê wêne û nîşanêن hunerî, li bal Cegerxwîn cî negirtine, peyv û wateyêن wî jî pirî-car, bê hevgirêdan hatine. Binêre li vê çarîna jêrîn û bide ber a ku di dû re tê:

Ketime tora keyxwedayê.

Min dema awir vedayê.

Dane dil lerzîn û ta yê.

Dil ji min bir, ahî dil.

Wate û peyvên vê çarînê, mîna aveke cûbareke biharê, hêdî û nerm, li gel hev û du, diherikin, xêza dawî, bersiva hersêyên berê ye û encameka xweristiye ku ji wan zayî ye. Lê gava em li vê çarîna ku yekser di dû ya

jorîn de tê, binêrin, bêguman, em hinekan ji hevokên wê, bê hevgirêdan û bê hevtêkilî dibînin.

Lê dema dîlber vesta
Mesrefa qehwê di destâ
Sed xwezî, min jê bixwesta.
Dil ji min bir, ahî dil.

Xêza dawî, bersiveke xweristî, ji ya yekem re, tê dîtin, lê herdu yên dîtir, bê hevgirêdan, ne li gel hev û ne ji li gel yên dî ketine wê navberê.

Ev kemasî, di du-sê çarînê din de ji, ci girtîye.

Helbesta Cegerxwîn ji, wek ya Mele, li kêşa pêlawaza (remel) suwar bûye. Lê hin caran peyvên wê li kêşê nehatine, vêca helbestvan, ji neçarî, peyvên wilo guhartine û wate qurbana kêşê hiştî, wek peyva "xwînvexwar", û gotû "xûnxwere, Teymûrê lengê- dame top û tivengê", tevî ku li gor wateya hevokê, û di vê penavê de, peyva xwînvexwar rasttir e, ji ber ku eger ravakirina sîtemê, daxwaz be, kurd dibêjin xwînvexwar e.

Kemasî û çewtiyên kêşê, di rezbendê de berçavtirîn, ji ber ku Cegerxwîn pirîcar, peyvan li gor dûzana wê, bi kar tîne, an di-guhere. Wek peyva hingivînê ku me nîşan kiribû û peyva dasê ku em bawer in ne ji bo dûzkirina rêzbendê ba, wê bi kar ne anî-

ba. Wilo ji peyva zendê ku diviya bê vî bernavê bihata " rengê berfê, sîng û zendê".

Li vê dawiyê, em dikarin bibêjin, ev çewtiyên ku li nik Cegerxwîn, di durvê helbes-tê de, bi ci bûnin û ev rewşen ne lihev ku me nîşan kiribûn, çar tiştan teqez dikan:

1- Cegerxwîn xwestibû ku nigê xwe têxe sola Mele. Lê mixabin, tevî ku ziman di dema wî de pêşketitir bû, sola Mele firehtir bû.

2- Cegerxwîn di evînê de bêpar bû; dîlber hêj niyebû. Lê birçiyê evînê bû.

3- Da wê birçibûn û tîbûnê fêr bike, pey-vêñ lêv, gerdan, sîng, sêv, (memik) newq û ramûsan pirîcar bi kar tîne.

4- Ev rewşen ku Mele bi kar anîne, kilitê evîna wî nin. Ka ew evîna mirovatî ye, an ilahî ye. (3)

*Ele'qd elcewî fî şerh diwan El şêx El cezerî. A zivingî Çapxana elsebah, çapa duwem, 1987, birê zem, rûpel 481-486


- Cegerxwîn, Kîme ez, çapa yekem, Libnan, 1973, rûpel 229-234

(1) Derbirin: tee'bîr. Ali Seydo Gewranî. Ferhenga kurdî nûjen, rûpel 138

(2) Rewanbêjî: Belaxet. jêderê berê, rûpel 484.

(3) Min lêkolinek, di vê babetê de, daye ber xwe, sernavê wê ev e: Melayê Cizîri di navbera i'sqê ilahî û evîna mirovatî de

EZ Û BAZ



Xemgînê Temê

Di vê şikefta tarî de hêşta li benda te me Bazê serbilind, hêşta tu nêçîra kevok û qumriya dikî, tu dixwezî nêçîra xwe berkom bikî ji goştê wan tirolê bêguneh, tu li derdor û sinora digerî da bişê nêçîra xwe peyda bikî û qûtê hevdemiya xwe berhev bikî, de were Bazê nikiltûj û dirêj, ez li benda te mam, di vê tarîka bê ronahî de bi hiş û ramanê xwe re dipeyivim û qala berz û bilindiya te dikim, di pêşîra vê tarîbûnê de pesna te dikim û awazê te di dilê xwe de hembêz dikim, bi bilindiya te re difirim û di hilpirikim, pêwendiya te dikim di warê serbilindiyê de, demsaliya rojê nîne, karwanê reşik û tarîtiyê li derdora min kon û çadirê xwe vedane û stûnê xwe bilind kirine, wan xewn û xeyalê min asteng kirine, dixwezin min di xewa nehişiyarî debihêlin, li benda ronahîya çavêن te me ku bişim vê tariya stûxwar ji holê rakim, bi nêrînê dûrbînî biqewtênim, nêrînê çavêن te min dispêrin piştxurbûnê, hes û hêrzê min bi hêz dike û nûra asimanî bo min diyar dike, were hey Bazê dewlemend em hevdû bipêçin bi ca-wê sipî, bi hevdû re bifirin û hevdû rizgar bikin, biçin ser zîr û ciyayê bilind bi rêsîn, babetê xwe ji bêçare û bêgavarre agahdar bikin, xêz û xemla wan ji nedîtiyê rakişenin û hilbijîerin li vê cîhana şepirze, rêzgariya te li min temâse dike hey Bazê nemir, nêrînê min ji sedsaliya windabûnê dişûyê, de were hey Bazê dûrwerîn, nêzîkî şikefta min bibe, qey tu nizane ku tarîka şevê şikefta min pêçaye bi perdeke reş, li hewîrdor bêdengî rawestaye, bes e nêçîra kevok û qumriya hey Bazê lewend, wan li şûn xwe bihêle, bila li ser dara, li nav bax û zeviya jiyana xwe berdewam bikin, çimkî ewin ku reng û xemla cîhane rûgeş dikan, lê

li derdora min mar û ejdeha qul û qewêr kolane, hin bi hin xwe nêzîkî min dîkin, dixwezin jehra dubendî di laşê min de biçînin, da di xewa bêhişyarî de bimînim, sedemê derengiya te ji min re ne diyare, metirse ji mar û ejdeha, birêse ser sînore wan, bila tîrs û xof bi wan re peyda bibe, serê wan biperçîqîne, da pêşketina wan berdewam nebe, bigere, binêre, tu bi çavê xwe yên dûrbînî bişê wan bibînê, bes e hey Bazê bargiran, were ez li benda te mam, heger ku tu di xew de mabê, rabe ji xewa xwe helicene, bê tîrs û fedî, raste goşte kevok û qumriya xweş e, lê ewane rûkê erdê geş dîkin, ewane gunehin, bêçare ne, mixabin ku tu diçe nêçîra wan, were nika min, di tenîşa minde rûne, da em biçin wan ejdeha û ziha ji nav xwe bikujin, wa nêzik dibin, sînorê min asteng dîkin, lê bi min nikarin, çimkî çavê min ronî dibin, nêrîna çavê te bi ser min de nêzik dibe, dixweze xemla xwe diyarî min bike.

Bazê serbilind, tu li kûdê wusa dereng mayî? Bêpejin dibê? Hîn bibe rasteqîne jiyanê, fêr bibe ajotina mayînê, bi berhemê min re rizgar bibe, ev çewtiyên tevgerî hêşta çareser nebûne, hilo dê bi hevdûrewan çareser bikin û bingihê wan li ber çavan diyar bikin, xeml û xêzê nûjeniyê hêşta bê çirûskin, hêşta raketinê bi hevdemiyê re, heger ez û te bi hevdû re kar bikin dê wan bersiviyaar bikin, dê wan li welatê xul-xul û gul-gulê de ramûsin, were Bazê min, wa deng û qirêñ Yezdan têñ, gazî me dike ku ji xewan şêrîn hişyar bibin, ji raketine demdirêjî, bese kat û saeta bijmêrin, li benda xeyal û hêviya rawestin, dê biçin mesajê xwe li derdora felekê arnede bikin, ku baweriya ruhbira bi min û te bêt, çimkî hêşta ewane di bêbawerîka kûrdîrokî de dijîn, hêşta di rewşa bêhêvîtiyê de rawestîne, bê çareser-kirin li qontaxê çeka meye dikin, çîma tu rawestayî di geriyana xwe de, ew geriyana bê fêde, heger tu wusa dereng bimînê dê biçim warê berdewmiya xwe, bi çol û bêlana bikevim bi pêxemberiya xwe refê teyrik û tilora hişyar bikim ji raketina dûrdirêjî, bazirganê xeyala min hişyar dibin, dixwezin dergehê şer û cengê vekin, dixwezin êriş bidin van mar û ejdehayê kevnar, pêşerojiya min hêşta di hembêza geriyanê de dijenê, nema mîna demçûnê û di nalînê, çeng û baskê te hene hey Bazê dilovan tu diçe ser çiyayê bilind û berz meye dik, lê ez di tarîtiya vê şikeftê de dijîm, zû dixwezim bi hîveronê re şâ bibim, lê pencere û kulek nînin, dixwezim bikulim dixwezim bikerifînem vê şikefta reş û tarî, da ev ziha û ejdeha di bin kuç û kevirê giran de pûç bibin, were Bazê min, ez ji weke te me naxwazim girêdayîbim bi ben û zincîra, naxwazim bibim nêçîra nêçîrvana, wan li derdora şikefta min dafik û xefkê xwe vedane, dixwezin min û te êsîr bikin û me li vê kûre erdê bi-hêlin, hilçene ji xewna bargiranî, ezê bişim alîkariya te bikim, bişim mîna te bi jorde bifirrim xwe ji min sil meke hey Bazê bilind, hêrz û hesen min ji weke yên te ne xwîna min ji ya te gerimtir e, bêhtir difûre û dikelê, laşê min i tenik nema bişê barê van hêrz û hesa hilgirê, çimko wan qonaxê dixwezin, dixwezin bi rê kevin, zagonê vê cîhana teng û asê bigu-

herin û biperçiqînin, were Bazê min em bi hevdû re vê cîhana asteng fereh bikin, van sî-norê datanîn helwişînin, da bikarin bi tevger û lebatê re xwe damezirînin, Bazê bêdeng, heger tu ji zîr û çiyayê bilind danekevê jêr, dê bême nika te ku çareserkirinê peyde bikin, çimko hêsta ez û tu ne serbest in, hêsta em bê mal û bê mewdan in, çiqasî tu eşqî serbestiyê, ez ji te bêhtir dixwezim, lê tiştekî te zêdeyî min e, ew tişt ronahiya çavêن tene, heger tu newê wan çavêن xwe diyarî min bike, dê vê cîhana biçûk paqîj û tekûz bikim.


Belê hey Bazê nemir, qet nizanim tu li kûdê dirêşê, were nik min ku ez û tu bi hevdû re xaka cîhanê bipîvin, bi hevdû re par bikin, ku bikaribin vê zordestiya cîhanî helweşînin, qata serdest û qata bindest wekhev bikin, zû ronahiyê di çavêن koran de berroj bikin, zû dengdariyê di guhê kerran de berhis bikin, bi berbang û siharê re nimêj bikin, nimêja serbilindiyê, nimêja rasteqâniyê, nimêja wekheviyê, leşkerê min û te hemî kulek û şehtin, di warê xwe de rawestane li benda min û te ne, ku bişin wan ji warê bêlebatiyê saxcan bikin, ku bibin leşkerekî hêzerast û daxwaz û armanca xwe bi cîh bînin, ez bilind û berz im hey Bazê nedîyar, dê bi tenha xwe bighim wê bilindiya xwe, çimko ez bûme hêzeke asteng û pişthesin, bê tirs û bê şermezârî dê bifirim asimanê bilind, dê binêrim û bibînim tevgeriya vê cîhana bê rêz, nema bişim bendewariya te bikim, min kat û saet winda kirin li vê ben-dewariyê, lê tu diyar nebûyê, te xwe zû veşart, çimko tu ne serbestî, ev mar û ejdeha bilindiya te ji xwe re dixebeitînin, pesnê te dikin, bi navê te sond dixwun, te ji hêza te bilindir dikin, çimko ewane bazirganiyê bi heybeta te dikin, lê tu baweriyê bi wan dikî, lê gava hêz û hêrzê te kêm dibin, te dikin nava sipîrto de û te hişk dikin, ku tu bibê xemla burc û dîwanê wan, ez bawerim ku tu nema veğerê bawer im ku îca tu ketî dafik û xefkê wan de, bawer im ku qesengiya te bûye reklama ber dergehê mexaza û megazîna, lewra nema baweriya min bi te bêt, tenê tiştekî ji te dixwezim roniya çavêن te, ku bişim tarîbûna vê cîhanê bibînim, ku bişim baweriya belengazên cîhanê rêzgar bikim, ez bi rê ketim hey Bazê serbilind.

04. 12. 1994

HEVPEYVÎN BI VEDAT TÜRKALÎ RE

Firat Cewerî

Mîna ku me di
M h e j m a r a
rî'an de anîbû zi-
man, rêzehhevpeyvî-
na me ya bi nivîskâ-
rên tirkan re berde-
wam e. Em di vê
hejmarê de bi Vedat
Türkali re dipeyivin.
Vedat Türkali yek ji
rewşenbîrên tirkan
yê bijarte ye. Ji bilî
xebatê xwe yên si-
yasî ew mîna roman-
nivîs û senarîst jî ge-
lekî navdar e û xwe-
diyê cihekî taybetî
ye. Filmên ku wî çê-
kirine hem li Tirkî-
ye yê hem jî li derveyî Tirkîye bûne xwediyêñ
xelatan. Giraniya vê hevpeyvîna me ya bi Vedat
Türkali re ji hunera nivîskarî û sînemavaniya
wî wêdetir li ser kurdan, rewşa kurdan û riyêñ
çareserkirina pirsa kurdan e.



Vedat Türkali (Foto: Nûdem)

Firat Cewerî: Mîrza
Türkali, em dizanî
ku tu li biyanistanê, li
Îngîltereyê dijî, tu
hesreta welatê xwe
dikişînî. Gelo ji bo ci
tu venagerî Tirkîye?

Vedat Türkali: Ez bi
birayerekê çûme În-
gîltereyê. Bi rastî li
Tirkîye êdî şerdê
min û xebatê nemabû. Hin karêñ min
yên biçûk piraniya
wextê min digirt.
Mîna tu dizanî li
Tirkîye tibabek
problemêni siyasi he-
ne. Ez jî mîna kevneşoresherekî nikarîbûm
li derveyî vê yekê bimama û ez tu carî jî ne-
mame. Paşê ez têgilîştîm ku êdî hin tiştêñ
bêmane zêde wextê min digirin, ez nikarim
nivîskariya xwe bidomînim. Êdî ji karê bê-

tir, mayina li Tirkiyeyê zerar gihande min. Sohbet, civîn û tiştên weha zêde wextê min digirtin. Ev yeka han jî ji nivîsandina min re dibû asteng. Paşê min biryara xwe da ku ez herim Îngiltereyê. Ji xwe zaroyên min û neviyên min jî li wir bûn. Wan jî xwestin ku ez herime ba wan, min jî biryara xwe da û ez çûm. Berî ku ez vê biryara xwe bidim, ez bi hinek dost û hevalan şewirîm, wan jî biryara min di cih de dîtin û dan zanîn ku wê ji bo min London cihekî baş be. Bi rastî ez niha dikarim li wir bi rehetî bixebeitim. Ez niha li wir, romanekê ku ez ji mêj ve li ser difikirim, dînîvîsînim.

- Roman li ser çi ye, behsa çi dike?

- Roman behsa Tirkîye ya salêن çîlî dike. Ji xwe piraniya pirtûk û romanê min li ser Tirkîye û rewşa Tirkiyeyê ne. Ger tu bala xwe baş bidî romanê min tu ê bikaribî panoramayeke Tirkiyeyê tê de bibînî. Ez bawer im ger ez vê romana xwe jî xelas bikim, mirov ê bikaribe bi hêsanî rewşa Tirkiyeyê ya heftê salêن dawî tê de bibîne.


- Tu ê hê demeke dirêj li Îngiltereyê bimînî?

- Heta ez romana xwe xelas bikim. Ji xwe biryara min jî ew bû ku ez bikaribim li wir romana xwe binivîsînim. Ez bawer im wê ev karê min hê salek du salêن din dom bîke. Yanî mirov çiqasî bi bawerî û bi biryar be jî, ne hêsan e ku mirov li gora dilê xwe

bixebite. Yanî gelek astengî derdikevin pêşîya mirov, mirov hin nivîsên din dînîvîsîne. Tu dizanî ku ez carinan mecbûr dimînim û di rojnameyan de dînîvîsînim. Mîna ku tête zanîn iro li Tirkiyeyê pirsa sereke pirsa kurdî ye. Esil ev ji mêj ve pirsa Tirkiyeyê ya herî girîng e. Berî niha bi demekê nivîseke min ya di derheqa kurdan de di rojnamê de derketibû. Heta ku ev pirsa han çareser nebe, Tirkîye nagihîje rehetiye-kê. Yanî wê ne ji kurdan re rehetî hebe, ne jî ji tirkan re rehetî hebe. Heta ji min tê ez di derheqa vê pirsê de dînîvîsînim. Di eslê xwe de divê ez di derheqa vê yekê de hê bêtir binivîsînim, lê wextê min tuneye. Wek min got, xebatêن weha jî ji bo xelas kirina romana min dibin asteng. Lê ez bawer im ez ê vê romana xwe di hundurê salek du salan de xelas bikim. Hema ku ez xelas bikim jî ez ê vegerim Tirkiyeyê.

- Te got ku tu ê piştî romana xwe vegerî Tirkiyeyê. Herweha te behsa pirsa herî gi-ring, yanî behsa pirsa kurdan ya li Tirkiyeyê kir. Gelo gava tu vegerî uelatekî ewqas bi problem û ku tu nikanibî ji van probleman re temâsevan bimînî, tu difikirî çawan jiyanâ xwe plan biki?

- Yanî gava ez romana xwe xelas bikim û vegerim Tirkiyeyê, ez ê êdî di derheqa vê pirsê de her roj di rojnameyan de binivîsînim. Yê min sîlaha min pêñusa min e. Heta ku ji min bê ez ê vê sîlaha xwe bi kar bînim. Ez dizanim ku wê ev yeka han belayê



V. Türkali (Foto: Nûdem)

jî bi xwe re bîne. Girtin heye, nizanim çi heye... Lê divê em vê jî qebûl bikin. Ji ber ku li her derê dinyayê her car wilo bûye. Her tim serê nivîskaran, nivîskarênu ku rastiyê tînin zimên bi dewleta wan re ketiye belayê. Yê ku vêya li ber çavan negire ne nivîskar e. Ez ne siyasetvan im, ez nivîskar im. Tu dikarî bibêjî, tu evqasî bi siyasetê re mijûl dibî tu çawan ne siyasetvan û. Ez wê jî dikarim wilo şirove bikim. Ji ber ku armanca siyasetvanekî hatina iktidarê ye, lê bi ya min heqê nivîskarekî û iktidarê tuneye. Yanî, ger ew xeta ku nivîskar parastiye jî were iktidarê, divê ew di muxalefetê de bimîne. Yanî divê nivîskar ne bi berçavkên iktidarê li meseleyan binihêrin, lê bi berçavkên xwe, bi berçavkên xelkê lê binihêrin. Divê ew mîna yekî ku bi problemên xelkê re mijûl dibe, derdêwan bi xwe re par ve

dike, li meseleyan binihêrin. Wê çaxê jî ew dibe muxalefet. Ji ber ku tu iktidar jî sedî sed bi ser nakevin. Lê belê hemû iktidar jî dixwazin xwe jî sedî sed rast nîşan bidin.

- *Te got ku li Tirkîyeyê pirsa herî girîng pirsa kurdan e. Gelo ji bo çi heta niha ev pirsa han çareser nebûye. Ma ev pirs berê tu-ne bû?*

- Niha, bersiva vê pirsê pir dirêj e. Min bersiva vê pirsa te dûr û dirêj di nivîsên xwe de aniye ziman. Nivîsên min yên ku di Özgür Gündem û Özgür Ülkeyê de derketine hene. Di nêzîk de ez dixwazim wan di bin navê "Nivîsên Li Ser Kurdan" bicivînim û mîna pirtûkekê derxînim.

Ger ez niha behsa van sedeman bikim, ez bawer im wê rûpelên kovara we têr nekin.

Lê dîsan jî ez ê hin tiştên biçûk bibêjim. Yanî gava em herin pirsa kurdan ya dema cumhûriyetê, yek jê divê ji aliyê kurdan ve ev pirs were nîrxandin, yek ji aliyê tirkan ve û ji aliyê Sovyet û dinya emperyalîst ya wê demê ve... Divê mirov bi van çar nêrînan li meselê binihêre. Ez bawer im gelek bûyer û sebebên dîrokî li ser hev kom bûn, çareserkirina pirsa kurdan, jinavêrakirina zilma hezar salane ya li ser kurdan deyne aliyekî, ev di dema cumhûriyetê de hê jî girantir bû. Hûn dizanin bi çareserkirneke împenalîst kurd li rojhilata navîn hatin perçeki- rin. Ez dixwazim careke din jî binê wê xêz bikim, ku ez dûr û dirêj di wan nivîsarên xwe de li ser vê pirsê rawestiyame. Lê ger ez li vir behs bikim, ez bawer im belkî rûpelên kovara we têr nekin.

Mumkun e kurd jî ne hazir bûn. Ji ber ku rewşa kurdan ya eşîrî ji vê yeka han re ne musahît bû. Piraniya xelkê li dû şêx û axan bûn. Gava danûstandinek bibûya jî ne bi xelkê re dibû, lê bi şêx û axan re dibû. Ji ber ku di navbera şêx û axan de jî berberî hebû, ew nikânîbûn di vê de bi ser biketana. Yanî gelek sebebên çaresernebûna vê bûyerê hene. Ev pirs çareser nebû. Ji xwe gava Kemalist jî hatin ser hukum, wan Tirkiye bi navê "dewlet-netewe", "netewe-dewlet" bi nav kirin. Bi vî awayî dewlet di hundurê şovenîzma tirkî de hate avakirin. Yanî ji berdêla dewleteke ji bo hevwelatiyan, dewleteke li ser hîmê şovenîzma tirkî hate avakirin. Di sînorêne dewleteke weha de ne mafêن kurdan, ne yên çerkezan, ne

yên ereban wê tune be. Ancax mafêن tir- kan hebe.

Loma jî pirsa kurdan nehate çareserkirin. Di eslê xwe de gavavêtina sazûmana Kema- lîzmê ya ber bi Kapîtalîzmê kir ku Kurdistan bibe koloniyeke Tirkiyeyê ya milî. Yanî Kurdistan ji Tirkiyeyê re bû çavkaniya ke- da erzan û cihê madeya xav ya erzan. Vê îdeolojiyê xwest ku gelê kurd winda bike, asîmîle bike, ji navê rake. Rewşa îro jî ji ber wan kirinan û wê îdeolojiyê ye. Lê belê îro ew gelê ku bi hezar salan li ser wê erdê jiya bû, gihiştiye zanebûna xwe ya neteweyî.

- *Karbîdestêن Tirkiyeyê ji bo ku kurdan asîmîle bikin, heme hema hemû medot bi kar anîn. Yanî bi şidetê çûne ser kurdan, bi rijen nerm mîna em birayên hev yên hezar salan in û hwd çûne ser kurdan. Tu dizanî ku enstitûyek bi navê "Enstituya lêkolîna kultura tirkî" li Tirkiyeyê heye. Vê Enstituyê rîzek pirtûkên ku kurdan încar dikin, der- xistin. Bi ya vê Enstituyê mileteki cihê bi na- vê "kurd" tuneye. Navê kurd ji berfê hatiye û kurd bi eslê xwe tirk in. Zimanê kurdî ne zi- manekî serbixwe ye, lê ew devokeke tirkî ye. Herweha îro jî gelek rewşenbîrên Tirkiyeyê tunebûna kurdan idia dikin. Dibêjin zima- nê kurdî tuneye, an jî zimanê kurdî bi tenê ji sî gotinî pêk tê.*

Em dibînin digel vê zilm û zorê, digel vê politîkaya încar û asîmîlasiyonê, hê jî kur- dan hebûna xwe parastine, zimanê xwe pa- rastine, heta cihekî kultura xwe parastine. Ev nêrîna me ye. Ez ê ji wan rewşenbîrên

kurdînkar bi rê bikevim, gelo bi rastî jî zi-manê kurdî ewqas jar e ku bi tenê ji sî gotinî pêk were? Tu di vê derheqê de ci difiki?

- Mixabin, ji ber ku haya min zêde ji ziman û edebiyata kurdî tuneye, ez ê nikani-bim dûr û dirêj li ser vê mijarê bipeyivim. Yanî zanebûna min ya di vê derheqê de gelekî bi sînor e. Lê ez vê dizanim, ku edebi-yateke kurdan ya geleki kevin heye, Ehmedê Xanî heye, Cegerxwîn heye... Herweha mebihîstiye ku edebiyata kurdî di zaravayê soranî de jî gelekî dewlemend e, lê mixabin min tiştek jê nexwendiye, loma ez ê nikani-bim di vê derheqê de jî tiştekî bibêjim. Rast e, ev rastiye kurd nehatine asî-mîlekirin. Tu dev ji asîmîlekirina kurdan berde, Tirkiyeyê gelê xwe jî asîmîle nekir. Yanî li Tirkiyeyê kultura îslamî heye, kul-tura Asyaya Navîn heye û gelek tiştên we-ha. Yanî em iro li Tirkiyeyê hezar perçê ne. Li gora ku em fikirîbûn, me nikarîbû nas-navek bidaya gelê xwe. Vê yeka han gavên bberapaş bi xwe re anîn. Tirkiyeyê di cihê xwe de hejmart. Ew ji aliyê kulturî ve bi pêş neket. Niha tu bala xwe bide wan wela-tênu ku ne ji çaran yekê me ne, tu ê bibînî ku ew bi her awayî di pêşıya me de ne. Ew ji aliyê demokrasî di pêşıya me de ne, ji aliyê xwendina pirtûkan di pêşıya me de ne, ji aliyê çûyina tiyatro, konser û galeriyê resim di pêşıya me de ne û gelek tiştên we-ha. Di bin sazûmaneke stemkar de, xwes-tin unîförmâ li me bikin û em yek tîp bifi-kirin. Asoya me teng ma. Asoya gelek rew-

şenbîrên Tirkiyeyê teng ma. Loma iro, ne-maza di pirsa kurdan de gelek rewşenbîrên tirkan teng difikirin. Peyveke Marx heye ku ez dixwazim li vir dubare bikim. Marx dibêje, gelekî ku azadiya gelekî din ji destê wî bistîne, ew bi xwe jî ne azad e. Yanî iro çawan ku kurd ne azad in, tirkî jî ne azad in. Loma, heta ku li Tirkiyeyê pirsa kurdan çareser nebe, ne pirsa tirkan ya kulturî, ne pirsa demokrasî, ne pirsa mirovî, bi kurtî li Tirkiyeyê tu tiş çareser nabe. Her tiş bi pirsa kurdan ve girêdayî ye.

- Te ji edebiyata kurdî ya klasîk navê Eh-medê Xanî û Cegerxwîn da. Ji derveyî vê jî, nemaze ji aliyê xwende û têkoşerên kurd ku mecbûr man welatê xwe terk bikin û koçî Ewrûpayê bikin, iro edebiyatek pêk tê. Em navê “edebiyata kurdî ya sirgûnê” li vê di-kin. Di nava vê edebiyata kurdî ya sirgûnê de gelek berhemên hêja; mîna roman, çîrok, helbest, lêkolîn, piyes û hwd. bi kurdî derkë-tine û derdikevin. Gelek ji van berheman hê-dî hêdî werdigerin zimanên biyanî jî. Ji ber ku tu bi xwe jî li Ewrûpayê dijî, ez bawer im wê hebekî haya te jê hebe, lê ez bawer im piraniya nivîskar û rewşenbîrên tirk ji vê ye-kê bêhay in. Ji bo ku diyalogek di navbera nivîskarên kurd û tirk de çêbibe, an jî pirek danûstandinê di navbera wan de ava bibe divê ci bête kirin? Di vê deheqê de tu pêşni-yazên te hene?

- Niha ku ez li xwe mikurr werim, digel ku ez li Ewrûpayê dijîm, zêde haya min ji

edebiyata kurdî tuneye.

Berî niha bi çend mehan di rojnameya Özgür Ülkeyê de nivîseke min ya bi navê "Lihevhelalkirin" derketibû. Min di wê nivîsa xwe de ji Sendîkaya Nivîskarên Tirk re pêşniyazek biribû. Min ev pêşniyaza xwe ji mêm ve bi riya nameyan ji hevalên xwe yên nivîskar re şandibû. Lê belê, ji ber hin hînbûyinên xwe wan zêde guh nedan vê pêşniyaza min. Niha li Tirkiyeyê sazgehên nivîskaran mîna Sendîkaya Nivîskarên Tirk û PEN hene. Ez bawer im ji bo ku mirov bibe endamên wan divê mirov hevwelatiyên Tirkiyeyê be. Lê çawan be formulek dikare jê re were dîtin û kurd jî bibin endamê van sazgehan. Ez bawer im, hemû problemên ku hene pêşî ancax di navbera kurd û tirkân de çareser bibe, ew dikarin problemên xwe çareser bikin. Ev dikare polîtik be, hunerî be, edebî be; yanî di her warî de hevkariya me pêwîst e. Ger em vê hevkariya xwe bi derengî bixînin, em bi girîngiya wê nizanibin, ji gelê kurd re jî wê guneh be, ji gelê tirk re jî. Ez bawer im, ji me pê ve, yanî ji me herdu gelên ku bi hezar salan bi hev re jiyyate pê ve, wê tu kes, tu hêz nikannibin me li hev bînin. Ger em baweriya xwe bi hêzin din bînim, em ê li gelê xwe xiyanevê dikin. Rojava pirsgirêkîn me çareser nake. Rojava pirsgirêkîn me ji bo çareser serkirina pirsgirêkîn xwe bi kar tîne. Ev wîlo ye, di huner û edebiyatê de jî wîlo ye. Ji ber vê yekê, pêşniyaza min a vekirî ev e: divê em pêşî di eynî rîkxistinê de bicivin, wek mînak di Sendîkaya Nivîskarên Tirk

de, di PEN'ê de û hwd. Ev yek, ya dudan, ev bi taybetî dikeve ser milêne we, divê hûn bêî ku hêrs bibin û li ber xwe bikevin, berdewam danûstandinên xwe bi van rîkxistinê nivîskarî re çêbikin û li ser xwe agahdariyan bidin wan. Ev dikare bi riya broşuran bibe, bi riya civîn û konferansan bibe; lê digel vê jî wê ji aliyê wan ve gelek astengî derkevin, lê divê nivîskarên kurd ji bo van danûstandinan bi ïnad bin û qet hêrs nebin. Ger em pêşî baweriya xwe bi pêwîstiya çareserkerina vê yekê bînin, hingî mirov dikare gelek formulên cuda bibîne.

- *Gelo ev ji aliyê hin nivîskar û rewşenbîrên kurdan ve şas neyê fêhmkirin. Dikare wîlo were fikirandin, ku divê siyasetvanên kurd jî dev ji rîkxistin û partiyên cûda berdin û werin di partiyên tirkan de bixebitin?*

- Bi destûra te be ez dixwazim dîsan behsa Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê bikim. Ya pêşî ew ne li gorî navê xwe ye, yanî navê wê şas e. Navê wê Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê ye lê bi tenê mirov bi nasnava tirkî dikare bibe endamê wê. Ya rastî ew ne Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê, lê belê ew Sendîkaya Nivîskarên Tirk e. Divê gelên din jî yên li Tirkiyeyê dijîn, bikaribin bi nasnava xwe bibin endamê sendîkayekê, an jî yekîtiyeke nivîskaran. Divê ew bikaribin li zimanê xwe, li berhemên xwe xwedî derkevin. Nizanim, min bi te da fêhmkirin.

Lê îro SHP partîyeke tirkan e, DYP partîyeke tirkan e, kurd jî digel gelek astengî

yan dikarin di nava van pariyan de bixebeitin, lê belê heqê wan heye ku ew partiyên xwe jî ava bikin. Ez ji wê re tiştekî nabêjim.

Lê di bingeh de şâsiyek heye. Navê sendîkaya me Sendîkaya Nivîskarên Tirkîyeyê ye, lê bi tenê tirk dikarin bibin endam, ji bo endambûna kurdan, zehmet e. Divê em li ser bingehê demokrasiyê Sendîkayeke Nivîskarên Tirkîyeyê ku kurd, çerkez, ermenî û hwd. bikaribin bibin endam û xwe tê de bibînin ava bikin. Lê ger hûn bixwazin yekîtî an jî sendîkayeke nivîskarekî kurd dide naskirin, ew nivîskarekî kurd e. Na, tu dîsan rabî bibêji, na Wele tu tirk î, çenâbe. Yanî ger nivîskerek dibêje, ez kurd im, ji bo çi tu ê wî mecbûr bikî ku ew bibe tirk? Yanî divê ew bikaribe bibêje, ez kurd im, bi kurdî dinivîsinim, lê ez endamê Sendîkaya Nivîskarên Tirkîyeyê me. Yanî mirov di sendîkayê de dikare maseyên cûda ava bike. Mîna maseya yên bi tirkî dinivîsin, yên bi kurdî dinivîsin, yên bi ermenîkî dinivîsin û hwd.

- *Niha, mîna kurd, mîna nivîskarekî ku bi kurdî dinivîsîne, yek dikare bibe endamê vê sendîkayê?*

- Ji xwe pêşniyaza min jî ew e, ku kurd bikaribin bi nasnava xwe ya kurdî bibin endam. Ji mêj ve ye ez vê diparêzim û vê yekê bi hevalên xwe yên nivîskar re munâqeşe dikim. Min berî niha bi salekê du salan ji serokê duwem re nameyek nivîsand. Pêşniyaza min ev e. Îcar wê Sendîkaya Nivîskarên Tirkîyeyê vê yekê qebûl bikin, qebûl nekin, kî nêzîkî fê fikrê hene, ez niza-

nim. Ev pêşniyazeke min kiriye, lê gelo nivîskarên kurd di vê derheqê de çi dibêjin, divê mirov li wê jî bifikire.

Gava min di vê derheqê de ji serokê duwem yê sendîkayê re name nivîsandibû, wî di bersiva xwe de gotibû, em li eslê endaman napisin, min jî di rojnameyê de nivîsand ku divê mirov li eslê wan bipirse. Ger yek bi kurdî dinivîsîne û xwe mîna nivîskarekî kurd dide naskirin, ew nivîskarekî kurd e. Na, tu dîsan rabî bibêji, na Wele tu tirk î, çenâbe. Yanî ger nivîskerek dibêje, ez kurd im, ji bo çi tu ê wî mecbûr bikî ku ew bibe tirk? Yanî divê ew bikaribe bibêje, ez kurd im, bi kurdî dinivîsinim, lê ez endamê Sendîkaya Nivîskarên Tirkîyeyê me. Yanî mirov di sendîkayê de dikare maseyên cûda ava bike. Mîna maseya yên bi tirkî dinivîsin, yên bi kurdî dinivîsin, yên bi ermenîkî dinivîsin û hwd.

Di dema xwe de li Tirkîyeyê gelek rojnameyên ermeniyan derketine, gelek nivîskarên jîr derketine, lê ev polîtikaya me ya şoven ev hemû încar kirine. Min tiştek bihîst, ku berî bi salan piyesake nivîskarekî ermenî ku li Stembolê rûdiniş, li Londonê leyistiye û suksîyek mezin jî kiriye, lê haya me ji nivîskarê wê tune ye. Bi ya min ev hemû berhemên hevbeş yên welatê me ne. Bihêlin bila mîrik bi kurdî binivîsîne, bihêlin bila mîrik bi ermenîkî binivîsîne, bihêlin bila mîrik bibêje ez kurd im, lê ez dixwazim bi tirkî binivîsinim.

- *Mirov carinan wilo difikire, ji bo ku dânuştandina nivîskarên kurd û tirk xurttir bi-*

be, diyalogek di navbera wan de dest pê bibe, mirov foneke wergerê ava bike. Yanî berhemên kurdî wergerînin tirkî û berhemên tirkî jî wergerînin kurdî. Gelo tu vê nêrînê çawen dibîni?

- Pir baş e, pir baş e. Lê tu dizane ku nivîskarên tirk di nav feqîrî û belengaziyekê de ne. Ew nikanin li ser berhemên xwe bijîn. Ji bo ku ew bikaribin jiyanâ xwe bido-mînin, ew mecbûr in ku ji derveyî nivîskariyê karekî din bikin. Niha li Swêdê gelek îmkanêne we hene. Loma, normal e ku pêşniyazeke weha ji aliyê we ve were kirin. Min her xwestiye ku romanekî min, pirtû-keke min wergere kurdî û gelê kurd wê bixwîne. Ez dizanim ku gava pirtûka min wergere kurdî wê di aliyê madî de zêde fêdeyekê negihîne min, lê ji bo ku ez dixwazim dengê xwe bigihînim gelekî ku ev hezar sal in em bi hev re dijîn, gelekî tadeyiya me gihîştiyê û me zulm lê kiriye, wê hingî rehetiyekê bide min. Ev pêşniyaza te pêşniyazeke baş e, lê belê ka kî ê wê fonê peyda bike? Ger hûn li bende bin ku wê Tirkîye foneke weha ava bike, vala ye, çenabê. Lê ger foneke weha peyda bibe, berhemên kurdî wergerin tirkî û berhemên tirkî jî wergerin kurdî, bi ya min gaveke pir girîng e.

AGAHDARIYEK JI BO ABONEYÊN NÛDEMÊ

Aboneyê/aboneya hêja

Heta niha bi piştgirî, bi dilsozî û bi abonetiya we Nûdem weşana xwe berdewam dike. Em gelek spasdarên we aboneyê kevin in ku we abonetiya xwe ya 1995'an nû kiriye. Herweha em spasdarên aboneyê nû ne jî ku bûne xwendevanên Nûdemê û bi xwe daxwaza abonetiya Nûdemê kirine. Lê hin aboneyê me -bi taybetî aboneyê Swêdê- bêî ku navêne xwe li karta abonetiye, beşa **Avsändare (namn och postadress)** binivîsinin, heqê abonetiya xwe ya 1995'an ji me re şandine. Em ji we -yêne ku mafê abonetiya xwe şandine lê navê xwe nenivîsandine- lava dikin an bi du rêzan, an jî bi telefونekê me haydar bikin.

MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVİSİNÉ

Mayakovski

Werger: **Süleyman Demir**

Helbest, ji ciyê ku pêşketin lê dibe derdikeve û loma jî xwedî naverokeke kûr û giran e.

Ez bi xwe, ji rêza “ez tenê bi rîyekê de dirim”, xwestin û ajîtasyona ku êdî bila qîzik bi yê helbestvan re seyranê bikin jê derdim. Diyare hinek bêzar bûne! Rebeno. Lê divê mirov malikan wilo dagire, wilo dagire, divê malik bikaribin bikin mirov di kooperatîfan de li hevdû bicivin.

Bêguman pirtûkên xwendegehiya kevn, mirov di derheqa zaniyariya nivîsandina halbestan de, fêrî van tiştan nakin. Hew şîklê nivîsandinê yê dîrokî didin nasîn û li gora adetên kevnar dajon. Wê gelekî rasttir ba heger ku mirov bigota ew dibêjin, “mirovan çawa helbest dinivîsandin”.

Heger ez bi rastî bêjîm, ez hîna jî nikarim besavenda tam û besavenda tam ya ceprast ji hevdû derxim û ez ê tu caran jî nikaribim ji hevdû derxim. Ne ji bo ku willo gelekî sext e û mirov nikare xwe fêr bike, lê ji ber ku min di karê xwe de tu caran guhê xwe nedaye wan û bikar jî ne anîne.



Heger ku hûn malikên bi qalibekî wilo di helbestên min de bibînin jî, ew hew ji bo daxwaz û pêwîstiya rîyeke tesîrkirinê ne. Ji ber ku gelek caran mirov li tiştên

tamsar, mîna "Seranserê çemê Volga, dêya me ye" rast tê.

Min gelek caran xwest xwe fêrî vê bikim û min demekê xwe fêrî hemûyî jî kir, lê min dîsa ji bîra kir. Ev tiştên wilo di pirtûkên xwendeghehiyê de ji % 90 in, lê di berhemên min de hûn li %3-an jî rast nayêñ.

Di karê helbestvaniyê de hew çend qâideyên bi gelempêrî ku rêya destpêkirinê nîşanî mirov dikin hene. Ev qaîde jî wek di satrancê de, bi merc in. Gavêñ pêşî hemû kêm zêde wek hev in. Lê di gevêñ bi dû re de, mirov êrîşan amade dike. Mirov nikare wan êrîşen bi hosteyî di rewşike baş de, di lîstika bi dû re de jî dubare bike. Hew ew êrîşen ji nifşkê de yê hember mirov şas dike.

Di helbestvaniyê de jî ahenga ku mirov bikaribe ji nifşkê de biafirîne wilo ye. Ji bo ku mirov dest bi karê helbestvaniyê bike, ew êrîşen serketî ci ne?

A yekemîn: Dema civatê vatiniyek eşkere kir ku çareserkirina maqûl hew bi afirandina berhemeye helbestvanî ye. Li ser daxwaza civatê. (Wê balkêş ba heger ku lêkolîneke xusûsi biba, bê tiştên li ser daxwaza civatê hatine afirandin li gor rastiyê ne, yan na.)

A duwemîn: Bê kemasî naskirin ya jî têderxistina bê çîna we (ya jî beşa mirovên ku hûn berdevkiyê jê re dikin) ci ji we daxwaz dike, yanî armanc.

A sêyemîn: Materyal. Peyv. Bêyî ku na'bêr têkeviyê de divê embar û koxika serê mirov bi her babet peyvên pêwîst, peyvên

ji hêla maneya xwe de giran, peyvên li sûkan ne pirr û ne erzan, peyvên giranbuha ku ji nû de hatibin dîtin, peyvên nûjen û ên ku ji nû de hatine çekirin, bê dagirtin.

A çaremîn: Pêwîstiyêñ ji bo vê serpêhatiyê ne û wasiteyêñ xebatê ne. Babet babet pêñûs, teqtîlo, telefon, kincêñ bedew ji bo ser lêdan, duçerx ji bo mirov karibe xwe bigihîne redaksyonan, maseyeke serrast, şemsî ji bo mirov karibe di bin baranê de jî binivîsîne, malek ku mirov karibe bi kêmeşî çend gavan tê de biavêye û ji bo mirov tê de kar bike, ji bo ku materyalêñ ji bo derêñ dûr pêwîst in rê bikin, divê pêwendiyêñ mirov bi babetek buroya nûçeyan re hebe ûwd. Ji bo hinekan qalûn û cixare jî pêweîst e.

A pêncemîn: Fêrbûn û metoda bikaranîna peyvan. Aheng, pîvana malikan, allîteration, wêne, bi hesab û bi tedarik bikaranîna peyvan, hiskirin û texmîna rast, encama dawî, nav û ser nav û not, bi carekê re şexsîne û piştî fêrbûna bi salan dîbin malê mirov yê şexsî.

Numûneyek: Vatiniya civakî- heger mirov peyvan bide kilameke ku wê li ser xetêñ êrîşkirnê bibe ya leşkerê sor. Armanç- ku li Yudenîç xin. Materyal- peyvên di ferhenga leşkeran de ne. Wasite- pêñûs e. Pîvana malikê: Şastûşka bi aheng e.

Encam:

Kevoka min fanêre şandiye
ji bo ez germ û dilşad bibim
gîrrêz bi dev û bêvila wî ketiye
êdî Yudenîç ji Petrograd direve.

Ev malika nû ya çarrêz xweşikbûn û li-

hevhatinekê dide şastûşka. Rewşa me ya nû malikê dike pêwîstiyek, hunermendiya helbestvanî dide wê û nûjen dike.

Dema mirov şastûşkakê dinivîsîne, ji bo ku bikaribe tesîra pirtirîn bike, divê mirov ew babet ahenga ku nehatiye bihîstin bikar bîne. Divê têkiliya herdû rêtzen pêşî bi herdûyên bi dûre tunebe. Navê navê wana, rêtzen piştgiriyê ne.

Heta bi van qaîdeyên gelemerî yên bin gehîn, mecalên ji xebata ku heta aniha di derheqa lêhûrbûn û nirxlêkirina helbestvanî de bûye, mezintir dide.

Mirov dikare qeweta di berhemê de, tiştên ku tê de hene û pîvana helbestê li vir wek tiştên ku tarifê pêktînin hisab bike.

Ma tu daxwaziya civakî heye?. Erê, du beşen di tarifê de. Armanc? Du beş. Aheng? Ev jî beşeke din. Alliteration? Nîv beş. Ü di dawiyê de jî beşek ji bo rîtma ecêb, ev jî wek ku ji bo mirov karibe bi otobusê here, divê mirov lê siwar bibe.

. Heger du helbestvan hebin, ji bo numûne, yek ji Yalta be û yê din jî ji Alaska be. Ez eşkere dibêjim ku ez ê çend qurûşen zêdetir di helbestên yê Alaskayî bidim. Lê divê rexnegir bi vê gotina min nekenin. Bi merca ku herdû jî wek hev baş bin, ez zêdetir didim.

Ez tê difikirim! Ewê ji Alaska diqefilê û divê ji xwe re kurkekî bikire û hibra wî bi pêñûşê ve dibe qeşa. Ê ji Yalta, li dereke bi darêñ palmiye ku mirov lê bê helbest jî dikare bijî, dinivîse.

Ev ji bo hêjayiya helbestan jî wilo ye.

Helbestên Demyan Bednîj bi rastî jî pêwîstiyên rojane famkirine. Armanc rast û rê hatiye gotin-hewcedariya karkir û gundiyan e, peyv bi awayekî nîv gunditî ne (bi ahenga ku bi rêya mirinê de ye hatiye bikaranîn) û metodeke bingehîn tê de heye.

Helbestên Krûçyonîş ji alliteration û dengen ku li hevdû nakin pêkhatine. Armanc, kirina alîkariya helbestvanê pêşerôjê ye.

Ez ê bi awayekî metafizîk lê nenerim û nekevim dû bê ji Demjan Bednîj û Krûçyonîş kî baş e. Helbestên wan xwediyyê taybetiyên cuda ne. Herdû babet jî dikarin bêyî ku bi hevdû re qâşê bikişînin, hebin.

Bi baweriya min berhemên helbestvanî yên baştırin, berhemên ku li ser daxwazên civatê têñ nivîsandin in. Heger Komîntern helbestekê dixwaze û armanc serketina çîna karkir e. Wê demê divê helbest bi peyvîn nû ku ji hêla naverokê ve dagirtî ne bê nivîsandin û hemû kes wilo binivîsinin. Divê li ser maseyeke bi normên MTM xemilandî bêñ nivîsandin û bi balafiran ji redaksyonan re bêñ rêkirin. Ji ber ku kar û xebata helbestvanan di nav tevaya afirandinê me de ciyekî girîng digirin, ez dibêm divê bi balafiran bin. Di rastiyê xwe de lêhûrbûn û kontrolkirina helbestan, ji awayê ku min xwest ku li vir eşkere bikim bêtir sergêjekê dixwaze û tevlihevtir e.

Ez ramanêñ xwe bi zanabûn kin û hêsan dikim, karîkaturîze dikim. Ez vêna, ji bo ku bikaribim rewşê zelaltir eşkere bikim dibêjim. Ji ber ku pêwîst e di karê edebî yê

nûjen de, tiştê bingehîn ne nirxkirina berhemên çapbûyî ya li gora kêfa yekûyek mirovan be. Divê mirov pêvajoya afirandinê bi awayekâ baş fam bike û baş lê bikole.

Bi vê nivîsê armanca min ne ku ez li serwêne, ya jî metodênu ku di vê derheqê de amade ne rawestim. Ez dikim ku pêvajoya afirandina helbestvaniyê bi xwe eşkere bikim.

Mirov çawa helbestan dînîvisîne?

Karê di vê derheqê de, gelekî zû, berî ku mirov bi daxwaziya civatê haydar bibe dest pê dike. Amadekariya ji bo karê helbestvaniyê, her pêşdetir dikeve. Helbesteke baş, di demeke diyar de, hew heger ku mirov baş bûbe xwediyê amadekariya helbestvanî, dikare bê çekirin.

Aniha ji bo numûne (ez ê wan tiştên ku ji nifşêde di serê min re derbas dibin bini-vîsim) gelek babet aheng û lîstikên bi peyvan di serê min de dirin û têne.

(Ber bi rengê ezmanê pakspî yê) krêm
(bilind dibin bircênu tûj li) (Kreml).

(Li Roma, li Fransa pêda bike) malekê
(heger mirov bixwaze bijî wek yekî) bohem.

Ya jî:

(Hinek rîh) biskêner nerm têdane
(di wan şevan de) hezîranê
ûhw. ûhw.

Ji bo numûne ez pirr ji vê malika Emerîkanî hez dikim, lê ji bo ku xweştir bibe, divê mirov ji nû de bi rûşî ava bike.

Lê dilkevirê Hannah
mêyeke har li Savannah

mêyeke har li Savannah.

Ez bi lez di ber afişekê re derbasbûm. Ev ahenga pirr beloq li ber çavên min ket:

Gelo Flora Low li ku dijî?

Flora Low? Li qata jér dijî.

Ya jî bi munasebeta boyaxa Lyamîna, febrîqeyeke boyaxê:

Boyaxkirin- jankêsiya dêya min e
û Lyamîla bi xwe dêya min e.

Temayêñ eşkere û girik di hişê mirov de, carê cî bi hevdû diguherin:

1. Barana li New York

2. Gewendeyeke li Paris li Bulvara Capucine ye. Ew spehî diyar e û ji ber ku bi çîmekê ye, gelek li wê digerin. Dibe ku tramwayê çîma wê birri be.

3. Yekî extiyar li ber deriyê toalêta resturanta mezin li Hessler li Berlin.

4. Ew tema mezin di derheqa Oktober de. Mirov nikare bikar bîne heger ku mirov li gundan nejiya be. ûhw.

Ev amadekârî hemû di serê min de ciwandî ne, lê min ewen ku bi taybetî sext in, li ciyekî nivîsandine.

Ewê çawa bêñ bikaranîn, ez hîna nizanîm. Lê ez dizanîm ku wê hemû bêñ bikaranînin.

Wextê min hemû bi vê amadekariyê dire. Ez rojê ji 10 heta 18 saetan li van tiştan xerc dikim û hertim jî dimeşim û carê yekê ji wana di ber xwe de dixwînim.

Karê ku ez li ser van amadekariyan dikim, min pirr dilebikînin. Di 15 salêñ nivîskariya min de, ciyê ji %90 ramanêñ bingehîn ên helbesten min, awayê formulekirina

wan, aheng lêkirina wan, wêne pêdakirin û allîtterationa ji bo wan, tên bîra min.

Kuçe...

Kuça A(Tramweyên ji Bircasucharev
diçin deriyê Sret. 1913)

Baraneke bi jan çavan diterifîne—

Şev baş...(Dêra Strastnoy, 1912)

Pisikmisikên reş û lawaz hemûyan bifirtkîn
(Li Kuntsevo, 1914)

Ji bo parastina me amade ye

Hêla çep. (Erebeçiyê li rixitimê, 1917)

Rezilê dera han d' Anthés (Di tirênenê de
li nêzi Mítîşçî. 1924)

ûhw. ûhw.

Ji bo afirandina helbesteke baş, ev “defte-
ra notgirtinê” yek ji wan mercên bingehîn
yên serketinê ye.

Bi piranî mirov hew piştî mirina nivîskaran
di derheqa van tiştan de dinivîsine. Hemû bi salan li ciyekî di nav kerşê de dimînîn.
Piştî mirina wî, wek “berhemên ku
nêvcî mane” tên çapkîrin. Lê ew tiştîn wilo
ji bo nivîskarênen reben pir giranbuha ne.

Helbestvanenê ku nû dest pê dikin, di afirandina tiştîn wilo de, ne serketî ne; hîna
gelek tişt bi serê wan nehatine û bê tecrûbe
ne. Mirov kêm caran malikên baş di hel-
bestîn wan de dibîne. Loma jî helbestîn
wan bê xwê ne û bê sedem dirêj in.

Helbestvanekî ku nû destpê dike, çiqasî
zîrek be jî, nikare bi carekê re helbestek baş
binivîsine. Ji hêleke din de jî, ji berhemâ
yekem nûnjentir e, ji ber ku bi amadekariya
jiyanê hatiye avakîrin.

Pîvana nivîsandina min, rojê 8-10 rêz in.

Loma jî ji bo min bi xwe, hew amadekari-
yeke baş, mecalâ pê re gihana afirandinê
dide min.

Dema ez nûhatî bûm, min serê xwe pirr
bi karê xwe diêşand. Min newêrabû peyv û
gotinên ku min texmîn dikir wê di helbes-
tîn min yên pêşerojê de ji min re pêwîst bi-
bin, bigotina. Dema tiştîn wilo dihatin se-
rê min, ez bêzar, cirnexweş û dilteng di-
bûm.

Sala 1913-an, dema ez ji Saratov vedigeri-
yam Moskova, ez di tirênenê de bi jineke ci-
wan re axivîm. Ji bo ez bikaribim bikim ku
bi min bawer bibe ku ez bi wê re rastim,
min jê re got ez ne zilamek im, lê ez “ewre-
kî di şalde me.” Piştî ku min wilo got, ez
pê hisiyam ku ew gotin dê pirr baş li hel-
bestekê bê. Heger ku wêna ev gotin di hişê
xwe de bigirta û li derinan bigota, min ne-
ma karibû wek tiştîk xwe bikarbînim. Ti-
sekê ez girtim. Ji bo ku ji bîra bike, min ew
nîvsaltet axivand. Piştî ez baş têgihiştim ku
gotina min ketiye guhekî wê û di guhê din
re derketiye, ez hinekî bêhnfreh bûm.

Piştî du salan pêwîstiya min bi gotina
“ewrekî di şal de” ji bo sernava helbestekê
çêbû.

Dema min ew helbest ava dikir, ez du
rojan li ser dilovaniya gotinên ku xortek dê
bikaribe ji delala xwe re bêje ramiyam.

Wê çawa jê hez bike û biparêze?

Şeva sisêyan, êş di serê min de bû û bêyî
ku ez tiştîk biramim, ez ketim nav nivî-
nan. Bi şevê definisyon di hişê min de çare-
ser bû:

Bedena te
ez ê jê hez bikim
û bifirkînim
wek hezkirina yekî leşker
ji bo çîma wî ya din
dema şer wî seqet kir
û bê hiştin.

Ez ji nav nivînan çeng bûm û bi çavên xilmaş zû rabûm ser xwe. Min di reşê de bi darikekî derbikan yê şewitî li ser pakêta xwe ya cixaran “çîma wî ya din” nivîstî û ji nû de ez ketim xewê. Dema bû sibeh, ez dor du saetan ramiyam bê min ji bo formeke çawa “çîma wî ya din” li ser pakêta xwe nivîsiye û ci karê çîmê bi xwe li vir heye.

Ahengeke helbestvanî ku mirov dikare texmîn bike, lê dîsa heger ku mirov jî nikaribe pêda bike, jiyanê li mirov dike jehr. Di rewşike wilo de, ez bi xelkê re diaxivim, lê ez tu tiştekî fam nakim, ez xwarinê dixwum lê ez nabînim bê ez ci dixwum, ez nikarim razim, rêszen helbestê di ber çavê min re her diherikin û dirin.

Bê guman xortên ku profesorê xwe derbas dikan hene. Lî bi pirranî me wek Şen-gelî serê xwe bi hunermendiya helbestvanî ne êşandiye. Ha ji we re numûneyek, anonsek ji rojnama Charkov, “Proleter”.

“Mirov çawa dibe nivîskar? Bersiva vê ya rast, heger ku hûn pûleke bi 50 kopekan ji me re bişînin, digirin. İstasyona Slavyansk. Kuça Stêrkadonet, Box II.”

Ev jî dikare bibe?

Ev helwest, tiştekî ji şoreşgeriyê bi wirde ye. Dema rojnamê ev qeşmerti dikir, pirtû-

kek biçûk jî wek hejmara taybetî ku navê wê “Mirov çawa bi pênc dersan dibe helbestvan” belav dikir.

Divê helwesta mirov ya di derheqa helbestvaniyê de, wek pêwendiyêن mirov ên bi pîrekê re bin. Pasternak wek dahiyekî bi çar rêzan ev gotiye.

Wek şanovanê melbend ku drama Shakespeare jiber kirîye

ji wê çaxê de ye ez te ji serî heta neynûkan dizanim


û ci dema ez li kuçen bajêr digerim
tu di hîse min de ye, ez te dixwînim.

Di beşa nivîsê ya din de, ez ê bi mînakekê eşkere bikim bê ji bo ku mirov bikaribe helbestan binivîse, mirov çawa dikare van amadekariyan pêşdetir bixe. ↗

(Ev weregera ku ji swêdî hatîye kirin wê bidome)

MELE SEÎDÊ KURDÎ

(1873-1960)



Kurdperwerî ne tenê berpirsyariya şoresger, rêxistin, kesên jar û yan jî ya xwendevanan e. Ev berpirsyarî ya hemû kesan e ku xwe Kurd dihesibînin û ji bo kîrina kurdperweryê jî her amade ne. Kesên wisan, divê bila çi dewlemend bin an jar û perşan bin, an oldar û tiral bin, an jî bila derwêş û bê war bin; yanî çi kesên ku xwe Kurd dizanîn, bi zimanê kurdî dipeyîvin û ji çi çîneke Kurdan bin, kurdperwerî her barê ser piştâ wan e û li gor bîrûbaweriyê xwe her li pey vê doza pîroz dimeşin, li gor heyînên xwe yên madî û manewî susrex dîkin, her dişixulin û berxwedanê dîkin, ta ku tê de serkeftî dibin an jî na-bin. Piştre ew kesên wisa, çi gava ku di warê fizîkî de ji ser ruyê dînyê biçin jî, navê wan her û her di nava cergê nete-weyê wan de dimîne û wê her jî bimîne.

Lê mixabin hin caran mêtjû li hin kesên kurdperwer ni-heqî dike û di xwe de cihê sezayetiya wan kêm dihêle. Ji ber ku di van çend sedsalên dawî de pirê carançaxê ew kel û fûrên ku li Kurdistanê rabûne, naveroka wan ne bi des-tên xwedîyê meslehetê hatine nivîsandin, erê ew bi des-tên nerastîyê û kesên dekvan hatine nivîsandin. Ji ber hindê jî, gelek nerastî û çewtî daxistine nava rûpelên mêtjû û wisan bi nîfşen nûhatî dane bawerkirin. Ew kiryarên wisa ku hîç lê nayêne lêborandin, wê di nêz de rojek bê ku mêtjû bi xwe dê wan dad bide û tawanê ku ji wan re rewâ ye jî bide.

Bêguman, yek ji wan kesên ku heqê wî di mêtjû de hatiye wendakirin, an jî kêm hatiye dayîn, Mele Seîdê Kurdî

Zeynelabidin Zinar

ye, ku bi navê gundê xwe yê Norsê hîn menşûrtir bûbû.

Lê tawanê mezintirîn ev bû ku piştî 1925-an gava zimanê kurdî ji aliyê Komara Tirkiyê ve hate qedexekirin, Kurd hemû bi derbekê ji pêşîya xwe, ji ziman û çanda xwe, ji bab û bapîrên xwe, ji leheng û fêrisen xwe yên navdar hatin birrîn û her ku çû jî, ew tev bêgav hiştin ku bi zimanê bîyanî bipeyîvin û her bi wî zimanî jî bixwînin. Lê welatparêziya kurdî çendî ku li ber xwe da û dest bi serhildanan jî kir, mixabin ew tev bi sosret hatine rûxandin û Bakûrê Kurdistanê wêran kirin. Piştire jî kîjan hikûmeta Tirk dema hatiye, her wisan li eynî hovîtiyê û li eynî rûreşiyê domandiye. Û piraniya kesên navdar ên wek Mele Seîdê Kurdî jî, li pêşberî mafêni Kurd ên rewa kîrine mortal û bi şûrê “bisilman”tiyê serê wan jêkirine. Ji ber hindê, îcar li Kurdistanê demek hat ku piraniya Kurdên xwene-dayên zimanê Tirkî, welê têgihan ku bisilmantiyê ew xistine vê rewşa xirab û her ku çû li pêşberî kesên nola Mele Seîdê Kurdî bêzîtiya xwe zêdetir kirin. Ne tenê li pêşberî Mele Seîd, di binê perda “komunîzm”ê de ew dijîtî ji kesên mîna Şêx Seîd, Seyîd Riza, Qazî Mihemed û hwd jî her berde-wam dibûn.

Îcar ev mesele wek mesela ku dibêjin: “Xwediyê malê û diz bi hev hisiyane” çêbû-ye. Kurd êdî gelek lêkolîn û légerîn kirine û dikin, bi xwe û bi hovîtiya dijminan ser-wext bûne. Lê bi giştî hêjî baweriyeke rind kame nebûye û li hin deveran hêjî ew rik û

zikreşîya ji hovîtiya hovan ku xwe bi cih kîribû, carcaran şopa xwe nîşan dide.

Belam çendî ku hewce nake ez bi dirêjî li ser Mele Seîdê Kurdî binivîsim, ji ber ku li ser wî pîrozê nemir ci baş û ci jî na, gelek caran û bi gelek zimanen hatiye nivîsandin. Tenê ji bo libîranîna xwendevanan, ez ê bi kurtî ji xwendevanê NÜDEMê re behsa jiyana wî bikim:

Mele Seîdê Kurdî, di 1293-yên Mişextê de ku hevberî tarîxa Zaynê dike 1873, li gundê Norsê hatiye dînyayê û di 1960-î de jî di mişextiya li bajarê Rihayê (Urfa) de çûye dilovaniya Xwedê. Piştî binaxkirina laşê wî yê pîroz bi şevekê, leşkerên Dewleta Tirk gora wî vekirine û laşê wî bi helîkopterekê birine Diyarbekir û ji wir jî bi balafî-reke cengî birine (Li gorî gotinan) avêtine Deryaya Sipî.

Navê bavê Mele Seîdê Kurdî, Mirze ye û yê diya wî jî Nûrê ye. Ew hetanî nehsaliya xwe di malê de, li cem bavê xwe maye. Piştire çûye xwendinê, li medresa Taxê feqetî kiriye û di pey de çûye li gundê Pirmîzê xwendiye. Ji wir jî çûye li gelek medrese-yen Kurdistanê geriyaye; wek medresa Hîzanê, Bidlîsê, Norşenê, Koxê, Şêrwanê, Sêrtê, Cizîrê, Mêrdînê û di dawiya dawîn de jî li Bazîdê bûye şagirdê barîgeha mamooste Ehmedê Xanî û jê xêr û xweşîya ol û nijadê wergirtiye.

Lê ev zemanê xwendina Mele Seîdê Kurdî di medreseyan de, tev li dora çend mehan domandiye û wekî din zîrektî û tîjî-fehmiya wî ya zêdetirîn, ew gihadine ra-


deya herî berz a di zanistî û têbîniyê de. Ji ber hindê jî, ew hêj di temenê 15-16 salan de bû, nasnavê Bedîuzeman ji aliyê xelkê ve bo cenabê wî rewa hatiye peji-randin.

Bedîuzemanê Kurdî ne şex bû ku xelkê destên wî maşî bikira, ne axa bû ku zordesî li xelkê bikira, ne bazirgan jî bû ku xelk bixapanda û pê dewlemend bibuya. Ew Kurdek bû û kurdperwere-kî oldar bû. Nexe we helbet mafê wî jî hebû ku wî ol-dartiya xwe bikira

û li welatê xwe jî xwedî derbiketa.

Îcar em ê li vir berê xwe bidin belge û berhemên heyî ku li ser Mele Kurdî hatine nivîsandin, yan jî ku wî bi devê xwe gotine. Ka ew ci tînin bîra mirov û di derbarê wî de me bi ci rengî dide sêwirandin:

- Mele Seîdê Kurdî di temenê 14-15 salan de bû dest bi nivîsandina berheman kiriye û heta roja dawîn, li dora 150 hebî berhem afirandine.



Mele Seîdê Kurdî

- Mele Seîdê Kurdî gava li Mêrdînê bû û hêj di temenê xwe yê 15-16'an de bû, dest bi doza kurdî kiriye.

- Mele Seîd di rojnameya *Kürt Teavün ve Terakkîyê* de weha nivîsiye: "Ez ji bo garantikirina çarenûsa Kurdan, ji van herdu xalan pê ve zêdeyî du tiştan nabînim: 1- Yekîtiya Netewî, 2- Bi xwendina olî re pêşvebirina teknîk û pîse..."

- Gava serokê Serhildana Kurd Şêx Seîd xeniqandine, Mele Kurdî

gotiye: "Ez ê bi destên xwe heyfa kekê xwe Şêx Seîd hilînim..."

- Mele Kurdî di pirtûka xwe ya bi navê "Şû'alar" de gotiye: "Şêx Seîd û hevalên xwe, şehîdên heqîqî ne."

- Mele Kurdî li pêşberî qetîlama Dêrsimê nefreta xwe eşkere kiriye û gotiye: "Ev yek wehşet e!..."

- Mele Kurdî, li Wanê pirtûkeke matematîkê bi zimanê kurdî nivîsiye.

- Gava Kurdî ji ber Tahir Paşa yê waliyê Wanê reviyaye û çûye Rojhilata Kurdistanê, li dijê wî komeleyek damezirandiye.

- Dema leşkerên Çar bi ser Bakûrê Kurdistanê ve hatine, Kurdî bûye amirhêzek û di Eniya Pasînê de şer kiriye.

- Kurdî digel şagirdên xwe, di berfê de çûye Mûşê û ji wir duwazdeh top anîne Bidlîsê, li pêşberî leşkerên Rûs şer kiriye.

- Mele Kurdî hêj di 1910-an de, gava ku çûye Stenbolê, ji paşayê Osmanî Evdilhemîdê Duyemîn daxwaz kiriye, ku li Wanê unîwersîteyekê avabike. Lê mixabin rejîma Osmanî ew bi dînîtî tawanbar kiriye û avêtiye tîmarxaneyê, piştre jî xistiye gihtîgehê.

- Di 1911-an de, li Stenbolê gava Kurdî avêtine tîmarxaneyê, weha gotiye: "Wextê ku azadî bi dînîtiyê hate gêrrandin, îstibda da jar jî tîmarxaneyê kir xwendegeh."

- Gava Mele Kurdî di girtîgehê de bû, Çavdîrê Parastinê çûye cem wî û lê teklîfa zo lîreyî meaş kiriye. Wî jî gotiye: "EZ ne parsekê meaş im. Eger hezar lîre be jî, ez qebûl nakim. Çimkî ez ne jî bo xwe hatime vir, ji bo miletê xwe hatime... Ev tiştê ku hûn didine min, texlîtekî berrtîlê ye..."

- Mele Kurdî di gaziyeke xwe de gotiye ku wî xistine tîmarxaneyê, piştre jî ew xistine girtîgehê û dû re ew mişext kirine. Lê wî tu leke neaniye ser şerefa Kurdan. Weha gotiye: "Gelî Kurdan! Min tîmarxaneyê qebûl kir, lê ji bo ku kurdîtiyê lekedar nekim, min daxwaza Padîşeh, dana meaş û qencîyen şehane qebûl nekirin..."

- Gava doktorê dînan (psikolog) hatiye

cem Mele Kurdî, Kurdî gotiyê: "EZ li çiya-yê Kurdistanê mezin bûme. Tu vê rewşa min a tund bi pîvana Kurdistanê bipîve, lê bi teraziya Stenbola medenî ya peljen me-kêse."

- Mele Kurdî ji doktorê tîmarxaneyê re gotiye: "Eger lêboktî, şalûztî, nahwandina weke ya pişîkan û ji mafêن kesyetî re bigorîkirina mafêن giştî ku li gorî aqil û mentiqê bêne hesibandin, tu bibe şahid ku ez dest ji vî aqilî berdidim û bi dînîtiyê jî di-pesinim..." Piştre wî li axaftina jê re ev jî zêde kirine: "Tiştê xerîb, wergirtina min e. Amaca ku ez vê wergirtinê li xwe dikim û bi piranî jî ku (mirov) jê re ne ahengdar in ev e ku ez, dûrbûna ji amaca dînyayê, tika-ya li banîna di layê wê toreya ku li welatê min dibihure, tersîtiya tewr û rewşa min a ku ji ya kesên din cihê ye, hiskirina tebîbtî û nijada min di pêwendiyêner derve û hindur de ye ku ez her û her bi vê riya han eş-kere dikim."

Piştî ew axaftina wan ku wisan bi ardarî domandiye, Mele Kurdî vê gotinê jî bo doktorê dewleta Tirk nehêvişandiye: "...Li wir jî cirriya û ez ketim tîmarxaneyê. Niha jî, va ez di girtîgeha binçav de me. Bi kurtî eger daxwaza gotinê bê xwestin, ne hûn êdî dikarin hewqas pînevantî bikin, ne jî ez êdî li vê yekê tême lefandin." Dîsa li axaftina xwe domandiye: "Hem gava ez li Kurdistanê bûm jî, min rind hûn dinasîn. Lê ev ha-we hemû, gelekî rind rûçikê we yê rastîn bi min daye fêmkirin. Xasma Tîmarxane, ku vê binetarê gelekî rind bi min daye bişkaf-

tin. Ez ji bo van hemû bûyerên ku bi serê min ve hatine, bo we spas dikim. Lewra bi rastî jî, diviya ku ez di derheqê we de xirab bifikiriyama, lê ez delal û rind difikirîm.”

Piştî gelek serpêhatî û berxwedanêngiran, di dawiyê de Siltanê Osmanî daxwaza Mele Seîdê Kurdî ya ji bo avakirina unîwersiteyekê li Wanê pejirandiye û Siltan M. Reşadê Pêncemîn jê re 21 zêr hazir kiri-ne. Mele Seîd jî bi bez û lez çûye Wanê û li keviya Golê dest bi avêtina xîmê unîwersita xwe kiriye. Lê mixabin Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest pê kiriye û ew xîm nîvco maye, ta roja îro jî her wisan dimîne.

Îcar ez hêvîdar im ku wê di rojekê nêz de, ew amaca ku bi Mele Seîdê Kurdî re çûye gorê, ji aliyê hemwelatiyêñ wî ve li Wanê bête cih, da ku giyana pîroz bi şadiya xwe bimîne.

Nivîskarê gorbîhişt Mele Evdirehman Norsî, di pirtûka xwe de behsa Medreseyaya Mele Seîdê Kurdî ya li Wanê kiriye û weha nîvîsiye: "...Gava hinek diketin medreseyaya ku Bedîûzeman lê ders dida, bo naskirina wê pir zehmetî dikişandin, ku ka ew der xwendegah e yan jî perwerdegeha şer e!" Û gelek tiştîn weha yên din jî nîvîsiye...

Li gorî gotina kekê héja Malmîsanij, di salêñ 1908-1912'an de, gelek nîvîsîn Mele Seîdê Kurdî li ser Kurdish hatine weşandin. Wî di binê sernavê "Kürtçe Bir Yazısı"yê (Nivîseke bi Kurdi) de, gotiye ku, ew gazi-ya navdar a ku Mele Seîdê Kurdî bi zarava-yê kurmançî nîvîsibû û ji hemwelatiyêñ xwe re pêşkêş kiribû, di rojnameya "Kürt

Teviün ve Terakki"yê, li Stenbolê, nimre: 1, (22 Teşrin-i sani 1324/11 Zilka'de 1326 [1908], s. 7) de hatiye weşandin. Min jî ew nîvîsa balkêş a ku sernavê wê bi zimanê tir-kî ye, bi awayê hebûna di pirtûka Malmîsanij de, li jêrê nîvîsi:

"Lisanımız Kürtçe: Bediüzzaman Molâla Said-i Kürdî'nin Nesayı:

Ey gelî Kurdan, îttifaqê de quwwet, îttihadê de heya, di biratîyê de se'adet, hukûmetê de selamet heye. Kabika (?) îttihadê û şirîta muhebbetê qewî bigrin da we ji bîlayê xilas ke. Qenc guhê xwe bidenê; ezê tiştekî ji we ra bibêjîm: Hun bizanin ku sê cewherên me hene, hifza xwe ji me duxwazin. Yek İslâmîyet, ku hezar hezar xûna şehîdan e buhayê wê dane. Ê duduwan însaniyet, ku lazim e em xwe nezera xelqê de bi xizmeta 'eqlü, cwamêranî û însanîyetîya xwe nişanê dunê bidin. Ê sisiyan, millîyeta me ye ku meziyetê da me; ê berê ku bi qencîya xwe sax in, em bi karê xwe bi hifza millîyeta xwe, ruhê wan qebra wan de şad bikin. Piştî wê, sê dujmûnê me hene, me xirab dikan. Yek feqîrî ye. Çîhl hezar hemalê İstenbolê delîlê wê ye. Ê duduwan: Cehalet û bêxwendinî ku hezar ji me da yek "qeze" nikarin bixwînin, delîlê wê ye. Ê sisiyan: Dujminî û îxtîlaf e ku ev 'edawet quweta me wunda dike, me jî musteheqî terbiyê dike û hukûmetê jî ji bêînsafiya xwe zulm li me dikir. Ku we ew se kir, bizanin çara me ew e ku sê şûrê elmas bi destêñ xwe bigrin, ta ku em her sê cewherên xwe ji destêñ xwe nekin! Her sê dujminê xwe, ser xwe rakin. Û şûrê 'edî, me'arîf û xwandin e. Ê duduwan: Îttifaq û mu-


hebbeta millî ye. Ê sisiyan: İnsan ê bi nefsa xwe şuxla bike û mîna sefilan ji qudraeta xelqê hêvî neke û pişta xwe nedî ti wesîyeta. Paşê (125) xwandin, xwandin, xwandin û destê hev girtin, destê hev girtin, destê hev girtin.” **Mele Seîd.**

Belê, xwendin û xwendin û xwendin!.. Xwendin, her û her ji Mele Kurdî re bûbû kul û kovan. Ji ber hindê jî çêbûye ku wî hergav dixwest da unîwersîteyek li Wanê, şaxekî wê li Bedlîsê û şaxek jî li Diyarbekrê bêne vekirin. Lê sazûmana wê demê, ew, li pêşberî wê daxwaza pîroz bi dînîti tawanbar kiriye û tîmarxane û girtîgehan jê re kîrine wargeh û müşextiyê jî lê kirine kinc...

Malmîsanij di pirtûka xwe de nivîsiye ku, di pirtûkên Mele Seîdê Kurdî de gelek texrîbatêñ mezin hatine kirin û ji wan gelek mînak jî rûqalê mirovatiya mirovan kîrine. Ew pirtûkên Mele Kurdî gava ji aliyê Tirkan ve hatine wergerandin bi tîpêñ latêñ û di navbera salêñ 1960-1978'an de ji nû ve ku çap kirine, hemû li gorî daxwaza nîjanperestiya tirkî û li dij daxwaz û mafêñ kurdayetî tekûz kirine. Belam ew texrîbatêñ ku hatine kirin, niha wan pirtûkên Xwedê yên berî Qur'ana pîroz ku ji pêxemberan re hatibûne hinartin, tînin bîra mirov.

Di hemû pirtûkên Mele Seîdê Kurdî de, yên ku ji aliyê Tirkan ve hatine wergerandin bi tîpêñ latêñ, bê cudañ di hemûyan de bêjeya “Kurd” bi “Hemşerî, himal...” nivîsîne. Navê “Kurdistan”ê, bi “Rojhilat” û “Rojhilata Anatoliya”yê guhartine. He-

voka “Qewmê Kurd”, bi “Qewmê Şerqê” guhartine. Navê “Seîdê Kurdi”, bi “Seîdê Norsî” nivîsîne. Paşnavê wî ji ku “Kurdi” bû, bi “ustad” nivîsîne û bi sedan texrîbatêñ wisa yên din...

Rastiya van gotinêñ li jorê, di pirtûka bi navê “Jiyana Bedîüzeman” ku di 1919-an de ji aliyê biraziyê wî Ebdurehman Norsî ve hatîye nivîsandin û di 1993-an de ji ku ji aliyê Weşanxaneya Nûbiharê ve çap bûye, xweş diyar dibe. 

HÎZAR

Heta duhî ji encamê
şîmatiya çerxî û
hestên sist û hîzrêñ behî
ev hîviya dibû barove û
di kujekpêlêñ xwe diwerpêçan
gundî, şoresh û spêdehî!
Kesêñ duser
ji barovê re dibûne palpişt
li ser sîngê vê rindê
ava zelal dikuzirand û
ji gelalîşka jehir dipeşî
... har dibû lehî!
Li ser kursîka bûkîniy
ji rondikêñ swîr
davêñ hîzarê dibûne tîr
bi cergê gencîniyê diketin
her çipika xwîna şîrîn
dibû pêleka ewrê res
barana wî
li ser mijîlankêñ elindê
dibû kevî û hişk dimehî!

Dîsan çerxî
berevajî xwe guherî.
Hîvî rêvingê siyar e û
hestên pêşvero çeper in,
vê hîzarê
davêñ wê ji xwîna xwe ristin.
Tevinkerên evî tevnî
kûr dinêrin


ji cîhanê re
evro serkêş û rêber in.
Girnijîn û bişkurînêñ
hîzara sipî
li beramberî tacâ Mîrî
serbest û azad diçerin!

Kezeb qetiya
dest û deron li min ariya,
çîma xanêñ evî dilî
evroke jî şerenîx e
... ji hevdu dixon?!

Piraniya xanêñ mezin di kulafe ne
lawaz û bêçaran diguron.
Pence sîxur
hîzrêñ paşdirr
zax û hêza mîraniyê ji cerga dişon.

Evro qeralê me birs e
ber bi kêşwerê Efrîqa
sehma serê min ew tirs e
bo çareseriya arîşa evan xana
xemlandina
sûretê şermîn û xuhdayî
kenya du lêv û didana.
Nuhîzarê gazî û pirs e:
Paşvemayo!
Here pêşwaziya elindê û bêjê:
Ji mêj e rêving im
piştiyê min serxwebûn e
dem e dê çînim vî tovî
peyy sivik e û buha qurs e
buha qurs e.

Naci Taha Berwari



MAMOSTE BÊRENG

Di nav mazata bajarê Hawarê de Mamoste Bêreng bang dikir: Çiroka herî dawîn têye frotine! De werin Hawarîno, werin! Nerxê çiroka min pîr gran e, lê li mezata Hawarê gellekî arzan e.

Dengê Mamoste di nav dengên keran, gayan, çelekan, ciwanan, peyan û pîran de wenda dibû û tenê di nav çend gavêñ dorhêla wî de dihat bihîstîn. Ew li ser tenekeyekî vala yê rûnê nebatî daniştibû û li ser maseya li pêş wî çend pirtûkêñ kevin û rûpelêñ di nav dosiyan de, di bin telîsekî kevin de, hatîbûn veşartin.

Li dû taştiyan du xortêñ bi simbel li pêş maseya Mamoste rawestiyan. Li dû niherîna li pirtûkêñ kevin ku bi pirranî yêñ helbestan bûn, yekî ji wan bi dengekî qebe gote Mamoste, ku ew dixwaze pirtûka wî ya dawîn bibîne. "Min negot pirtûk, ezbenî, min got, çiroka dawîn," got Mamoste bi dengekî nizim. Wî dosiyek ji ser maseyê rakir û da dest xort. Xort bi rûpelêñ di nav dosiyê de niherî û ew raber hevalê xwe kirin. Baş diyar bû ku xwendina herdulan jî ne yeke rêk û pêk bû, û ji ber ku çirok ne wek pirtûkan, lê li ser kaxiza arzan bi daktîloyeke kevin hatîbû nivîsandin, wan bêyî ku bi drêjî lê binîherin, ew çekirin ser maseyê û yekî ji wan got:

- Ev karê qeşmeran e, ne pirtûk e, heval!
- Min negot pirtûk e, min got çirok,...

Berî ku Mamoste gotina xwe bi seri bike, xortê din dest bi axiftinê kir:

- Yêñ wek te ji me re nabin. Ev çi ye. Tu çîma tiştekî baş nadî gel? Belkî jî tu bi mebest wisa dikî. Te berê hel-

Şahînê B. Soreklî

bestên weqa rind dinivîsandin, wek helbes-
ta "Lêxin." Eger te ji bîr kiriye, ez wînim
bîra te:

De lêxin bavo lêxin
Çavên neyaran derxin
Şoreşa me bi rê xin
Axa û xayinan dûr xin.

Hemî şêr û piling in
Hawariyêni bi deng in
Tev de boke û lewend in
Wêrek û serbilind in.

Xortno rabin dîlanê
Rakin tîr û kevanê
Tev de biçin meydanê
Bo xatirê dewranê.

Mamosteyê ku di rûyê xwe de sor û piz
bûbû serê xwe ber bi erdê daxist û bîstekê
bêdeng ma. Xortê helbest xwendî dosiya
ku berê di destêni wî de bû car din rakir, dî-
sa pê ve niherî û got:

- De ev çi gû ye. Hezar rûpelên wisa jî
nagihêni helbesteke rojêni xortaniya te. Ha,
ev helbesta te, helbesta "Lêxin," dikare sed
xortî li êgir biqelibîne....

Mamoste serê xwe rakir û bi dengekî bi
hestêni xemê dagirtî got:

- Ka bide min wê dosiyê. Zatî kesek ni-
zane bixwêne jî. Ez tenê ji bona derbaskirina
katê dinivîsinim. Eger we xwest, ez ê
beşekî çîrokê ji we re bixwênim.

Xort dosiye çekir ser maseyê, çend goti-

nên ku di nav zirrîniya kerekî de nehatin
bihîstin kirin û li gel hevalê xwe bi rê ket,
bêyi ku fersendê bide Mamoste Bêreng, da
ku beşekî çîroka xwe ya dawîn ji wan re
bixwêne.

Wê êvarê Mamoste hemî helbestêni ku
wî di xortaniya xwe de nivîsandibûn şewi-
tandin û xweliya wan kir tûrekî. Di ber-
banga sibeya roja din de ew ji mala xwe
derket û berê xwe da gundê ku bavê wî lê
melletî kiribû. Bi rê ve ew ber bi goristana
Hawarê fertîlî û çû serilêdaneke gora jîna
xwe. Ber xêtir ji jîna xwe bixwaze, wî kor-
tikek li ber serê gora wê kola û xweliya hel-
bestêni xwe tê de binerd kir.

Gundê bavê wî lê melletî kiribû êdî bûbû
bajorokekî. Mamoste hêvî dikir, ew ê bika-
ribe li wir çîrokêni xwe bifroşe û xwe idare
bike. Da navê xwe bide bihîstin û çîrokêni
xwe bi xelkê bide nasîn, wî ji melleyê ciwan
yê bajarokê Xemxwarê tika kir, ku bila rê
bide, da ew çîrokeke xwe êvarekê di odaya
wî de bixwêne. Ji ber ku bavê Mamoste di
mizgefta melleyê ciwan de berê melletî kiri-
bû daxwaza wî hat pejirandin û rê ji bo wî
hat dayîn ku ew roja îniyê li dû nimêja ya-
siyan çîroka xwe ji mîvanêni melleyê ciwan
re bixwêne.

Bîst û yet mîvan û nasdarêni Melle Hu-
sêni li dû nimêja yasiyan di odayê de besdar
bûn û li dû belavkirina çayê ji Mamoste
hat tikakirin ku bila dest bi xwendina çîro-
ka xwe bike. Mamoste dosiyek ji tûrê xwe
derxist, spasiya melle û besdaran kir û dest
bi xwendina çîroka xwe ya dawîn kir:

"Bajarokê Brixlegg(Bríkslêg) di nav mijê dawiya payîzê de wenda bûbû. Li rawesteka trênenê tenê Sêwî û çar kesên din ji trêna ji Viyena dihatî daketin. Ev yekemcar bû ku Sêwî dihate devera Tirol. Wî li çep û rastê xwe niherî û hema kir ku destê xwe bavêje çenteyê xwe da bi rê keve, dema ku dengê Maria ket guhêñ wî. Bi kêfxweşî Sêwî ber bi wê liviya, lê dema nêzikî wê bû xwe ragirt. Ji tîrsa segê li gel Maria, ew ne-wêribû bêtir ber bi pêş biçe."

Li vir mîvanekî Melle Husêñ mamoste rawestand û gotê:

- Şora te bi şêkir dibirrim, Mamoste. Te got "seg." Seg ci ye?

- Seg kûçik e, ez benî, kotî ye.
- Madam werg e, ci ra nabêjî kûçik?
- Seg jî eynî tişt e.

Hema Mamoste dixwazt çîrokê bidomîne, dema du kesên din bi hev re xwaztin biaxifin:

- Tirol li ku ye?
- Tirol li Otrîşê ye.
- Otrîş li ku ye? hat dengekî din.
- Otrîş welatekî li Ewropa ye. Jê re herweha Austria û Nemsâ têñ gotin.
- Jinêñ wir ser xwe nagirin? hat dengekî din.

- Na, pirr caran ser xwe nagirin, lê Maria keç bû, ne jin. Keçen me jî berê ser xwe nedigirtin.

- Neûzû billah, hat dengekî din.
- Dibêjin jinêñ wir doxînsist in, Mamoste, werg be?
- Bawer nakim, weqa doxînsist bin, ezbe-

nî. Li herderê nuha doxînên naylon têyên bi karhanîn. Doxînên bi ben li vir jî nemane.

- Min bihîstiye, ku jinêñ wir jî, wek peyan, şebqeyan didin ser serêñ xwe, da ku bi peyayêñ ew dixwazin re biçin nav daristanan û li stuyêñ hev siwar bin.

Li vir hindek jî yên besdar keniyen. Mamosteyê ku rûyê wî nuha sor bûbû, bêyî ku dengê xwe bilind bike, wisa li axifgerê dâwîn vegerand:

- Rast e. Li darisatanan jî şebqeyen xwe dixin bin qûnên xwe. Dema karê xwe bi seri dikin, nema êdê wan şebqeyan bi karînin. Wan dixin nav tûran û didin rêxisti-neke xeyrî, da ku li welatekî cîhana çarem bidin belengazekî wek te.

Mamoste dizanibû ku ev gotina wî ne di cîh de bû û bêyî usûl bû. Herweha pê hesiya ku ew ê baştir bûya eger destpêka çîroka wî jî bo civateke wisa bi şêweyeke din dest pê kiribûya, lê şasitî carekê bûbû. Wî hêze xwe kir, rabû ser xwe û bi lez ji hundir çû der. Heta Melle Husêñ derket derive, da wî vegerîne, ew di şeva reş de wenda bû. Ciqa Melle bang kir jî, Mamoste lê venege rand.

Wê şevê Mamoste li çolê raziya, di feydeke nêzikî rê de, rîya ku dê roja din ew bigî-handa gundê Laşanê, şûna ku mala xûşka wî lê bû.

Ew bûbû bokeyê çîroka xwe ya dawîn. Dema wî li rawesteka trênenê nêzikî li Maria kir, wê kêreke tûj ji beriya pardisonê xwe derxist û pê segê biçûk serjê kir. Sêwî veci-

niqî, lê maria keniya û gotê, bila netirse. "Li welatê we berxan ji mîvanan re serjê dikin," wê got, "min jî çi berx nedîtin. Ez ê segê xwe yê li ber dilê min gellekî bi nerx ji te re serjêkim. Sêwî li hatina xwe gellekî poşman bûbû û berî tiştekî din bibêje du polîs ber bi wan hatin û ew bi tawana kujtina seg girtin. Maria ji kenan lal bûbû. Sêwî hewl da bibêje ku wî seg nekuytiye, ku ew ji bo axiftina li ser nebûna mafên merovan li welatê wî hatiye Brixlegg(Brîkslêg), lê bêyî çi sûd. Polîsan gotin, wî tade li mafên segan kiriye û divêt bête girtin. Polîsan gotinê, li gor qanûna herêma Tirol, yê segekî bêyî sedem bikuje, divêt rojêni jiyana xwe di girtîgehê de derbas bike.

Dengê teqîna tifingan ji kaşê li ew haliyê rê ew ji xewnê vegerand feydê. Giyanê wî bi tevahî dilerizî û ew nema êdî dikaribû razê. Gelo li kês kê kî dikir kemînê? Drêj nekir, dengê teqîna tifingan hat birrîn û Mamoste li rojêni xortaniya xwe vegeriya, çû bajarê celeng, Viyena, di çayxaneyên wê de daniş, li baxçeyê Schönbrunn(Şonbrûn) geriya, di mala xwendekaran de rastî Dorîsa almanî hat, li gel wê rabû ser burca kiliseya Stephan(Ştêfan) Dom,... Gelo çi bi serê Dorîsê hat? ew diponijî. Gelo zewicî be, gelo çend zaroyen wê hebin, gelo ew hêñ wî bi bîr tîne,...? Wî xweziya xwe bi wan rojan hanî, rojêni xwendekariyê ku merov geh birçî, geh têr derbas dike û li ber xwedê digere, bila zû derbas bibin, lê dû re li derbasbûna wan poşman dibe. Di wan salan de xwendekar li welatê xwe vedi-

geriya. Tew pirsa daxwaza mafê penabertiyyê li holê nebû, nedihat bîra kesekî. Mayîna li derive, li dû kutakirina xwendinê şerm bû, divabû merov li welatê xwe vegeriya,... Di quncekî dilê xwe de, Mamoste poşman bû ku wî çi caran hewl neda, da ku biçe û li wir mafê mayînê bixwaze, lê wî dê çi bikira, qederê riya jiyana wî wişa nivîsandibû. Nuha jî, bi vî umrî, wî nedixwazt ji nû ve dest pê bike û xwe bike penaberekî biyanî.

Li şûna bêderan bi dehan peya, jin û zarakîn gund civiyabûn. Di navbera wan de sê peyayê bi rîh li ser erdê daniştibûn. Yek ji wan xwediyyê meymûnekî sorî mezin bû; yekî din xwediyyê marekî bû, marekî sorî piz yê ku li pêş xwediyyê xwe kokel bûbû; û yê sêyem xwediyyê hurçekî bû, hurçekî reşî bi heybet. Zaroyan bi çavêni tiji meraq û tirs li her sê peyan û lawirêni wan diniherîn. Peyakî çarem dest pê kir li êldefiyê xe, peyakî pêncem dest pê kir, geh li ser lingê çepê, geh li ser yê rastê baz bide û zaroyan û xortan dest bi çepikan kirin. Dengê êldefiyê hêdî-hêdî bilind bû, yê xwe li ser lingekî çedikir dest pê kir biqîre û zarokan dawî dan çepikan. Peyayê yekem zincîra meymûn ji dest xwe berda û meymûn dest pê kir bireqise. Peyayê duyem zurneyek ji paşûla xwe derxist û dest pê kir puf zurneya xwe bike. Marê wî xwe ji kokiliyê vereşand, ber bi jor hilda û dest pê kir laşê xwe bi şêweyeke hunerî bilivîne. Peyeyê sêyem qayışa hurç ji dor stuyê wî vekir û hurç

dest pê kir li hember meymûn, li ser herdu lingên paşin baz bide. Yê êldefî lêdixist xwe xist navenda civînê û di nevbera her sê lawiran de bi lez ziviriya. Dengê êldefiya wî heku çû bilintir bû, herweha qîrîna wî. Hurçê reş har û hartir bû û ji nişka ve çeplek avêt meymûnê sor û guhekî wî xist nav devê xwe. Qîjînî bi meymûn ket, xwe ji pêş hurç bada û ji paşiyê de xwe avêt ser pişta wî. Mamûn dest pê kir bi qîlên xwe yên tûj pişta hurç bigeze. Orîniya hurçe, qîjîniya meymûn, dengê êldefiyê, qîrîna xwediyyê wê û dengê zurneyê li nav hev ketin. Gundî bi çûk û mezinên xwe ve bê-deng û bêliv man.

Ji hemî rojên salâ û ji hemî kata rojê Ma-moste di vê bîstê de gihîşt gundê Laşan û ber bi şûna bêderan çû. Ev bûbûn heft sal wî xûşka xwe û gundiyyên vî gundî nedîti-bûn. Di ev rewşa li holê de wî nedizanibû çi bike, lê wekî merovekî bêyî tevdîr ber bi pêş biçe, ew ji ket nav gundiyyên temaşevan. Gihîştina wî tenê bala xwediyyê mar kişand, yê ku bi dîtina wî re meqamê zurneyê şas kir û dest ji lêxistina wê berda. Bi dawîhatina dengê zurneyê re lêdana êldefiyê û qîrîna xwediyyê wê ji nizim bûn. Baş diyar bû ku meqamê li holê ji hev diket, atmosfér sar dibû. Drêj nekir mar dîsa kokel bû, meymûn ji ser pişta hurç daket û hurç li ser kîleka xwe veket. Vê yekê gundî xeyidan-din; û zaroyan dest pê kirin keviran bavêjin her sê peyan û lawirên wan; û dayêni bi za-royen xwe serbilind dest bi zilxitan kirin; û peyayêni bi kirinên zaro û jinêni xwe kêfx-

weş dest pê kirin bikenin; û xwediyyê meymûn, ku nuha aşkere bû ew di çavê çepê de kor e, şûjinek ji beriya xwe derxist û di çavê xwe yê rastê re kir; û çavê wî riijiya, qîrîniya wî xwe gîhand asîman; û xwediyyê hurç çefiya xwe ji serê xwe danî û xist stuyê yê kor, bi amanca ku wî bifetisîne; û yên temaşevan dest pê kirin bi dengekî bilind bikenin, ji ber ku serê xwediyyê hurç gurrî bû; û xwediyyê mar rabû ser lingekî û xîje ser xwediyyê hurç kir; û her kesî dît ku lingê wî yê rastê ji jor çongê re qut e; û kenê yên beşdar bî-lintir bû; û meymûn car din dest pê kir bi qîje, hurç dîsa dest bi orîniyê kir û mar ji nû ve rabû ser doça xwe; û meymûn xwe avêt ser pişta hurç û ew bi qîlên xwe yên tûj û drêj gez kir. Xwîna sor ji nav qîlên wî dirijiya; û mar xîje meymûn kir û pê dada; û hurç lepek avêt mar, beşekî wî xist nav devê xwe û ew ji hev qelişand; û meymûn ji ser pişta hurç ket û dest pê kir can bide; û herdu beşen marê sor li ser xweliyê dilipitîn; û hurç sikran dikir; û zarokan dest bi alahêyê kirin; û dengê lîlelîla zilxitan rabû cem xwedê; û peya kenîyan û kenîyan û kenîyan.

Ji nişkan ve qîrîna jineke beşdar da ser hemî dengên li holê. Jin yeke bi du canan bû. Navê wê Rocan bû. Rocan nuha li ser erdê vedigevizî, bi nalîn û qîrîn, bi girî. Di navbera meymûn û hurç û mar û xwediyyen wan yên brîndar de Rocan li ser erdê virde-wêde diçû û dihat. Çar pîrejinên qelew xwe gîhandin wê û yekê bi pîlê rastê, yakê bi yê çepê, yekê bi lingekî û ya din bi yê

din girtin; û jineke pêncem kiras ji ser zikê Rocanê rakir. Jina avis her diqîriya, lê qîrîneke ku hindik dima perdeya guhan qul bike; û bi rakirina dawa kirasê wê re baş diyar bû ku di zikê wê de şerekî mezin heye. Pîrejinan dest bi hawarê kirin, ciwanjinan dest bi girî kirin û zaro bi çavên mezin ber bi pêş hatin û peya ber bi paş çûn. Drêj nekir du dergûş ji nav seqen Rocanê hatin derxistin, yek li dû yê din, û herduyan bi hev re qîrîneke sist ji xwe hanîn der, di nav xwîna daya xwe de, û qîrîna wan nebû du duyan; û pîrejinan ew mirî rakirin û bi girî gotin, "Xwedê, ev ci bêtar e?!"

Herdu zaroyan di zikê diya xwe de hevûdin mest kiribûn. Di gellek şûnan de bedenên wan yên biçûk mor bûbûn û ji bêvilên wan xwûn rijiyabû.

Ber ro biçe ava Rocan û herdu zaroyêن wê li goristana gund binax kirin. Mêrê wê di girtîgehê de bû, brayekî wê li çiyan şervanê azadiyê bû, yek li lesgeriyê bû û dudu li bajarên dûr bûn. Xûşkeke wê reviya bû, kesekî nedizanibû li ku ye û du xûşkên din li gundên dûr zewicî bûn. Diya wê li dû zayına xûşkeke wê miribû û bavê wê ber kurtedemekê xwe bi dar xistibû.

Kesekî li hersê merovên bi rîh nepirsî. Roja din dema gundî ji xew rabûn, kesek li şûna bêdernan tunebû, ne jî ci şopên lawîrên mirî li wir mabûn.

Xûşka mamoste giriya, dema wê brayê xwe li dû heft salan li pêş çavên xwe dît, zaroyêن wê hatin destê xalê xwe û bavê wan herdu çavên wî ramûsan. Wê êvarê xelkê

gund bi mezin û çûkêñ xwe ve li wê malê ciwyian, bi xêrhatina Momoste kirin, li halê wî pirsîn û li deng û behsêñ Hawarê meraq kirin.

Gundê Laşan jî nema gundê berê bû. Li wir jî êdî pîvanên "şaristaniyê" yên wek traktoran, patosan û motorsîklan dihatin dîtin, herweha têlvizyon. Li wir jî xortan li nasnameya merov dipirsîn û dixwaztin bîzanin, ka ji rengan merov rêzgir û piştgirê ci rengî ye, lê Mamoste nikaribû bersîva wan bide, ji ber ku hîskokêñ wî hildihatîn. Li dû dîtina bûyera li şûna bêderan cih girîtî hîskokêñ wî dest pê kiribûn hilêñ. Xelkê gund hêñ ci hîskokêñ wisa nedîtibûn, ne jî bihîstibûn. Hîskokêñ wî weqa pirr dihatin, ku wî nikaribû bi şeweyleke zelal biaxi-fe.

Li dû xwarina şîvê, peyakî ji nişka ve got:

- Mamosteyê feqîr! Min tiştekî wek vê olexanê di jiyana xwe de nedîtiye. Min nu-ha hîskokêñ rêben jîmarin. Panzdeh li ser hev hatin.

- Na, na, te piçekî zêde kir, got xortekî.

- Ma tu fedî nakî, xarzê! Ne rîhêñ min spî ne; ma ez derewan dikim? got kalê.

Yekî din:

- Hey virxûn, tu şerm nakî gotina Apê Hemze dibirri?

Yê xort:

- Apê Hemze dibêje panzdeh hîskok li dû hev hatin. Min jî jîmartibû, sêzdeh bûn.

Yekî din:

- De zirar nake, lo. Bêhna xwe fireh bi-

kin. Werin em ji nû ve tev bijimêrin.

- Ha ev yek, du, sê,...
- Bûn çend?
- Bûn çardeh.

Kurê Hemze:

- Bavê min jî got panzdeh. Ev kûçikbavê bêterbiya bavê min di nav cim'atê de derewîn derxist. Lawê qûndeyê, eger ez te îşev nekujim, bira diya Ferdo jina te be.

Xort:

- Ez ê di jin û maka te nim, kurrê qeh-pê.

Kurê Hemze:

- Lawo, ez ê xirrê cîhanekê di jin û maka te ve kim,...

.....

(Başdır e bêtir neyê gotin. Bi kurtî, wê şevê serê çar merovan şikiya, lê ji bo xatirê Mamoste herdu haliyan pejirandin, ew ê dest ji hev berdin. Herdu halî ji nêzikî ve digihîştin hev û meriyên Mamoste bûn).

Berî herkes biçe mala xwe, Mamoste hewl da biaxife û di navbera hîskokên xwe de ji wan re wisa got:

- Xem nake - tiştek nebû - Em jî - meriyên - Afxaniyan in - Em jî - wek wan - ci-yayî ne. Em jî - wek wan - xwedan - şexsiyet in - serbilind in - serbixwe ne - û ji hevûdin re - danayinin - Kesên ciyayî - her wisa ne - Ji şer hej dikin - De piçek xwîn riiyiya - Ma ci bû?!

Ji beşdaran yekî jî wisa got:

- Nale li xwînê were, xwîn ne tiştek e. Ci heyf e, namûsa hevûdin hanîn çar panxirotan.

Yekî din:

Yên hev in, zirar nake. Kesekî xerîb namûsa wan nedaye ber kevir û kuçan.

Mamoste:

Te rast got - Namûs namûsa - wan e -

Yên hev in - Tiştek nebû -

- De êvara we bixêr be,...

Sê rojan li dû gîhiştina Mamoste du zirxiliyan û kamiyoneke tiji leşger xwe gîhandin navenda gund. Li şûna bêderan bîst û şes leşger ji wan daketin, berên reşâş û tifingên xwe dan jor û gulle ji wan barandin. Dû re ji gundiyan daxwaz kirin ku gulleyên vala bibînin û nerxê wan bidin. Li dû ku hemî gundi, bi zar û zêcan û jin û pîran ve li şûna bêderan hatin civandin, û li dû ku nerxê gulleyan ji wan hat stendin, serleşgerekî devmezin bi alikariya mîkrefonekê van go tinan ji xwe derxistin:

"Sê rojan berê, li vê şûnê xwîn riiyiya. Meymûnek, hurçek û marek hatin kujtin; hersê jî lawirên bêtawan. Tew meymûn ci-nawirekî biyanî ye û li welatê me mîvan e û hurç yekî parastî û jimarkêm e. Hûn ji ber xwe ve şerm û fedî nakin. Hûn merovîn bêwûjdan in. Hûn kesên bêşaristanîne. Hûn kesên kujer in. Di dewleta me de qanûn xwîna hurçekî, meymûnekî û marekî bêtawn jî li erdê nahêle bêyî ku kujerên wan bide cezakirin. Hêtu dibêjî qey ev cerîmeta têrê nake, jineke we, bêyî şerm û fedî, li ser xwîna lawirên bêtawan dizê û hûn herdu kurên wê vedîşêrên bêyî ku fer-

sendê bidin dadmendekî dewletê da ku wan ji bo li hevûdinxistina di zikê daya xwe de bide mehkemekirin. Hûn ê bibê-jin, herdu law mirî ji diya xwe bûn. Ev gotina we jî xuya dike ku hûn bi tiştekî nedizanin, ku we qanûna dewletê fêhm nekiriye. Pisporêن me dikarin ifadeya zaroyên mirî jî bigirin. Li milê din, ma haya ev da ya bêyî terbiya ji şerê di zikê wê de cih girtî nebû? Çima wê dewlet agahdar nekir?! Eger ew dayeke bi berpirsiyartî bûya, wê dê alîkarî ji pisporêن me xwaztibûya. Heye ku wan herdu zaroyên wê li hev hanîbûna û dawî dabûna şerê di navbera wan de, ji bo xatitirê istiqrara herêmî.

Li vir Mamoste nikaribû devê xwe girtîbihêle û bêyî tevdêra gotina xwe bike, got:

- Qumandar beg, ez jî li vir bûm û min bi çavêن xwe dît, ku lawiran bi hev girtin û wan xwe bi xwe hevûdin kujtin,... Bi texmîna min, şerê di navbera wan'de bû sede-ma li hevûdindana herdu brayên dergûş,...

- Ho, ho, hele binihêrin. Di nav me de mamosteyek jî heye. Tew belkî ji Ewropa hatibe û dikêye ku me fêrî demokrasiyê bike. Bigirin kurê qehpeyê û bavêjin kamyonê.

Tiştê mathîştinê ew bû, ku hîskokên Mamoste li vir rawestiyan. Kêfxweşîya Mamoste bi rawestandina wan da ser xem-gîniya ji bo girtinê. Di sê rojêن derbasbûnî de hîskokên wî bi şev û roj, heta di xewê de jî, domandibûn. Xûşk û zavayê wî, gundiyan, heta şeniyêن gundên cîran, ci di tûrên wan de di derheqê rawestandina hîskokan

de hebû rijandibûn, bêyî ci sûd. Xûşka wî, tew boxîr û xwê jî di teweyekê de şewitan-dibûn, deriyê mitbaxê li ser wî girtibû û bang li Şêx Gêlanî û li Şêx Xidir kiribû, lê ew jî bêyî ci sûd, hîskokên Mamoste her domandibûn, ta vê bîstê.

(Em ê ji vir rasterast biçin roja Mamoste Bêreng tê de ji girtîgehê hatî berdan, bêyî ku kata xwendevanan ya kêm wenda bikin û bi drêjî behsa tiştîn leşgeran hanî serên gundiyan bikin. Xwendevanên haya wan ji tiştîn wisa niye, bila bi kerema xwe li rapo-rexistinênen mafênen merovan bipirsin, yan li rojnamene ku tê de bi firehî behsa bûyerên wisa tête kirin binihêrin).

* * *

Mamoste li dû derbaskirina sê hefteyan di girtîgeha bajarokê Tunez de hat berdan. Du sedemên serbestberdana wî hebûn. Yekem, hat îspatkîrin ku peywendiya wî li gel bûyerên li gundê xwûşka wî cih girtinî tunebû û ev bûbûn pênc sal wî xwe wek merovekî bêreng dabû nasîn. Sedema duyem jî ew bû, ku li dadgeha Tunez dor tunebû. Divabû ew neh mehan di girtîgeha ku tê de cih tunebû de bimîne da ku dor were mehkemkirina wî. Şansê wî jî yê sê sed û bîst û neh segan gellekî baştir bû, segên ku ber kurtedemekê, bêyî mehkemekirin, ji halîyê hêzên taybetî de hatibûn kujtin. Van segan li gel bi sedan ker bêxwedî ma-bûn û ji ber şewitandina gundên xwediyênen wan reviyabûn. Li gel ku seg ji keran jîrtir û zanatir in jî kesek li wan xwedî derneketi-

bû, lê yên li keran xwedî derketinî pirr bûn. Wisa ji seg hatin kujtin û ker ji mirinê filitîn. Mamoste hema hindik mabû car din têkeve belayeke mezin, dema wî di çayxaneyeke bajêr de gotibû, "merov li keran xwedî derdi Kevin, ji ber ku ker bi her kesî re dabin dostên ji bo xatirê xwarinê, lê kesek li segan xwedî dernakeve ji ber ku seg dostên baş in, lê zû bi zû û bi her kesî re nabin dost." Vê gotinê serêşyeke mezin ji wî re hanîbû holê, lê ber kesek tiştekî wîne serê wî ew ji bajêr reviyabû.

Hema bi çend kilometran ber derbaskirina ava çêm, da ku xwe bigihîne gundê Mirinpêşê, Mamoste ket kemîneke şervanine ciwan, yên ku wekî başiqan li serên kaşan û di newalên di navbera wan de diçûn û dihatin. Dema Mamoste tê gîhişt ku ew ne lesger, lê ciwanên şervan in, ew gellekî kîfxwêş bû, xwe da nasîn û got ku berê wî li Mirinpêşê ye. Ji şervanan du ciwanên çekdar ew dan pêş xwe û gîhandin serdarekî xwe.

- Tu kî yi? Bi ku de diheriye vê şevê got serdêr bi zimanekî qebe.

- Navê min Mamoste Bêreng e. Ev bûn sê hefte di girtîgehê de me. Ez ji gundê Hawarê me û berê min li Mirinpêşê ye.

- Çima navê te Bêreng e û li Mirinpêşê ci karê te heye?

- Dewletê û rêxistinê rengereng ez neçar kirim, da ku navê xwe ji Rengîn bigucherim Bêreng. Berê min li Mirinpêşê ye da ku li wir mamostetiyê bikim.

- Ma çima di nav gel de mamostetiyê

nakî?

- Gel bi zimanê min nizane.

- Hey ajan. Em te baş dinasin. Tu dijiminê gelê xwe yi.

- Xarzê! Ez çawa dijminê gelê xwe me? Çawa be ji, min xebat kiriye ji bona vî gelî. Min pirtûk nivîsandine, ez di meşen şoressgêran de, ber bêrengbûnê, meşiyame, ez gellek caran hatime girtine, min...

- "Xarzê" mebêje ji min re. Te tiştek ji ji gelê xwe re nekiriye. Çavêن xwe veke, li min binihêre. A nuha guleyên me tunene ji bo te, lê em dikarin cîhanê ji bo te bikin zindan,...

Mamoste nema guhên xwe dan ser gotinê xortê di şevreşiyê de bi heybet. Li dû bîstekê, wî xwe da hev û got:

- Xorto! Şerm li gel te nemaye. Umrê min bi kîmasî du qat û nîvan li yê te ye. Di rewseke normal de, tu ê nikaribî li gel min wisa biaxifi, lê di bin saya şervaniyê de, di ev şeva tarî de, û di ev rewşa min ya bêbav de, te xwe li serê min ji serdarekî leşgeran bi heybetir kiriye. Rastî ji ew e ku tirsa min ji te ji ya serlesger bêtir e,...

Serdêr destê xwe xist yaxeya wî û xwazt lêxe, lê xwe ragirt û bi heyecan gotê:

- Dijmin dest avêtiye namûsa gelê min. Eger birayê min be ji, ez ê çavêن wî derînim.

- Min tiştekî xirab nekiriye û namûsa wî gelî ya min e ji,...

- Te tiştek ji ji gelê xwe re nekiriye,...

(Bila xwendevan biborîne, lê da ku ev kurteçiroka pirr drêj nebe, em ê axiftina

Mamoste û xortê serdar jî ta dawiyê nedomînin. Zatî domainina wê jî bêyî sûd e. Bi kurtî, xort Mamoste serbest berda, bi şertê ku ew car din li nivîsandina helbestan vegere, yan bi kîmasî bêrengiya xwe bido-mîne û ta roja mirinê tiliyên xwe neke çi tîşikan. Xort tew bi qîret derket û ji du şervanên ciwan daxwaz kir ku wî bigihînin çêm).

Bi berbangê re Mamoste xwe gîhand ew halîyê çêm û erdê azad maç kir. Mest û birçî wî xwe gîhand gundê Mirinpêşê. Li kê-leka gund bi hezaran merov ketibûn rîzê. Di destêن wan de tûr û tas hebûn û karmendine li dor kamionine rengspî ew tûr û tasêن wan tiji dikirin. Dema Mamoste nêzikî li wan kir, bi sedan kes ji rîzê derketin û ber bi wî reviyan. Mamoste xwazt bireve, lê ji ber ku weqa westiyabû di şûna xwe de rûnişt. Merovêن ji rîzê reviyanî li dora wî gîhiştin hev û dest pê kirin pirsan ji xwe bibarînin. Mamoste matmayî guh da ser gotinêن wan lê tênegihîst, ka ew çi dibêjîne. Li dû kurtedemekê dengêن wan hemiyan bû yek deng, bû wek dengê komike lîstikvanêن şanoyekê. Wan bi hev re, bi dengekî digotn:

Me watek din divêt, bêje em çawa biçin,
Me bihuştek nû divêt, ku pere bo me bidin.
Em hemî têkoşer in, li Ewropa digerin,
Ger Ewropa ne pêkan bêt, bo Emrika jî derin.

Bêje bo me, de bêje, ka rîya çûnê l' ku ye,
Ger kesek me bibe wir, dolar ji bo wan heye.
Bes e zulm û zordarî, em ê bibin penaber,

Bes e şer û riswatî, em dixwazin biçin der.

Mamoste bi çavêن tiji mat û tirs li wan fertîlî û got:

Min sond exum bi yezdan, hayim le rîga niye;

Êsta tenya ew ezanim, ke zikim zor bîrsî ye.

Dilsar û bêhêvî yên li dor Mamoste civiyabûn ber bi paş çûn, da car din têkevin rîzê. Ji ber ku yên di rîzê de manî nepejirandin şûnêن wan car din bidin wan û daxwaz kirin ku bila biçin paşıya rîzê, li çend şûnan şer derket û piçek xwîna din rîjiya, lê berî ku gotinêن namûsê bêyên kirin karmendêن rîexistinêن xeyrî ew ji hevûdin veqetandin.

Hêن Mamoste difikirî ka ew çi bike, dema ku du kesen çekdar ber bi wî hatin û ew li gel xwe birin. Çekdaran ew gîhandin navendeke lesgerî û dan dest çekdarine din yên ku ew kirin odayekê û derî li ser girtin. Li dû dora çar seetan deriyê odaye vebû. Du çekdarêن din ew kirin navbera xwe û birin odaya serdêr. Mamoste bi kîfxweşî merheba li serdêr kir û got:

- Bêguman şasitiyek bûye sedema girtina min, ebbenî. Min mirin da ber çavan da ku xwe bigihînim ev herêma azad. Ez ji ber lesgeran direvime. Bi rî ve çekdarine şervan ez girtim û bi ajaniyê tawanbar kirim. Hema hindik mabû min bikujin. Li vir jî çekdarine we ez girtim. Ez nedizanim ji bo çî!

Berpisiyêr gotina wî xist mîzînê, cixareyek pêşkêşê kir, jê re vêxist û got:

- Wisa diyar e ku tu di derbarey rewşa

me de baş ne agahdarî, yan heye ku tu bi mebest xwe wekî xeşîm raber dikî. Li vê hevîrkê rengê kesk ne rengekî li gor meraq û daxwaza me ye. Te jî kurtikekî kesk li xwe kiriye. Çima?

Mamoste keniya, kurtikê xwe ji xwe danî, li ser maseya serdêr danî û bersîva wî wisa da:

- Biborîn, ezbenî. Ev kurtik yê zavayê me ye. Kurtikê min rengê xwe spî ye, ji ber ku ji mîj ve ye min dest ji hemî rengan berdaye, lê rîza min ji hemîyan re heye, yên leşgeran ne tê de. Xûşka min ew şuştibû, lê berî ku li min bête vegerandin leşgeran ez li gund girtim.

Berpîrsiyêr ji çekdarekî xwazt da ku kurtikekî rengzer wîne. Li dû hanîna kurtik, berpîrsiyêr ew da Mamoste û gotê:

- Ha ji te re kurtikekî zer. Bila diyarî be ji bo te. Careke din li vê deverê tiştekî rengkesk bi kar neynî, yan erê, em ê di daya te, biborîn, em ê nikarîbin te bibexşînin.

Mamoste spasiya serdêr kir, destê wî ramûsa û xatir xwazt, li dû ku soz da, ew ê ji vir û şûnve tenê rengê zer bi kar wîne.

Sê rojan li dû vê bûyerê Mamosteyê rîya xwe ber bi başûr domandî car din ji haliyê sê çekdaran ve hat girtin. Wî wisa texmîn dikir ku çekdar eynî çekdar in û sedema girtina wî eynî sedem e. Loma, wî ji wan re got, ku ew sond dixwe, ev sê roj in wî rengê kesk bi kar nehaniye. Ev gotina wîne tenê wek devdrêjî, lê herweha wek ihanet hat hesibandin û bû sedema du-sê kulmîn bi hêz ku xwîn bi devê wî xistin.

Li dû derbaskirina çar rojan di girtîgehê de, girtî derxistin pêş berpîrsiyarê wê deve-rê. Mamoste bi zimanekî xweş silav da û bi hurmet li pêş wî sekinî. Xuya bû ku serdar merovekî xwende bû. Wî di cîh de tê derxist ku ev kesê li pêş wî merovekî zana, yan qe nebe, nîvzana ye. Wî jî wek serdarê din cixareyek pêşkêse Mamoste kir, jê re vêxist û dest bi axiftinê kir:

- Wisa diyar e ku tu merovekî zanyar î. Te ji bo çi ev kurtikê zer li herêma kesk li xwe kiriye?

Mamoste piçekî bi ser xwe de ponijî û gotê:

- Ezbenî, li min biborîn. Rengê kurtikê min kesk bû, lê li herêma din ew ji min girtin û yekî zer dan min. Ez ji haliyê din hatim herêma azad û ji bo min çend roj di-vên da ku xwe fêrî rengên herêmê bikim.

Serdêr derseke di warê siyasetê de da Mamoste û kurtikekî kesk dayê. Li dû ku Mamoste soz da, ew ê car din rengê zer bi kar neyne, ew hat berdan.

Ber Mamoste bi dûr keve, serdêr bang kir:

Ji bîr neçe, eger careke din rengê zer bi kar bînî, em ê di dayika te, biborîn, em ê nikarîbin te bibexşînin.

Sê rojan li dû vê bûyerê, Mamosteyê rîya xwe ber bi rohilat domandî du carê din hat girtin, carekê ji haliyê rengsoran de û carekê ji haliyê rengreşan de. Li dawiya dawiyê Mamoste biryar girt, ew ê bêyî kurtik rîya xwe bidomîne, lê ew dîsa hat girtin. Vê carê çekdarine ew bi rêznegirtina ji erf û


adetên îslamî re tawanbar kîrin. Li dû der-baskirina çend rojan di girtîgeha wan de, ew car din hat berdan. Çawa be jî, ew ji bo xatirê rengan nehat kujtin.

Li dû çend hefteyên dijwar li herêma azad Mamoste dilsartir û xemgîntir bû. Ci kar û wezîfe ji bo kesên mamoste nebûn. Tenê ji bo çekdaran û qaçaxciyan kar hebû. Wisa, wî biryar girt, ew ê jî bibe penaber, lê çawa?! Da ku bibe penaber divabû pereyên wî hebûna. Wî biryara xwe girt ku car din ber bi paş vegere, da ku biçe mala xwûşka xwe, perene ji zavayê xwe deyn bike û dû re li rêya penabertiyê bipir-se.

Şansê merovan carekê dikare baş be, du caran dikare baş be, heye ku tew sê caran

dikare baş be, lê ne her car. Berî ku ava çêm derbas bike, ew li kulemoza bi hezaran leşgerên di bin aleke sor de ber bi başûr di-hatinî rast hat. Dora du sed leşger ji tabûrê veqetiyân û dan dû wî. Wî ciqa hewl da, da ku ji ber wan bireve jî, ew li dû pênc se- etan hat girtin, helbet li dû ku leşgeran alî-kariya helîkopteran xwaztin. Ev bûn çend hefte Mamoste girtî ye. Gellek êşkence jî xwar, rebeno. Çima? Leşger bi îsrar jê daxwaz dikine, bila şûna hevalên xwe yên şervan diyar bike. Ji bo rojnameyên welêt jî, berpirsiyarên leşgerî dibêjine, wan serda-rekî mezin yê şervanên li dij dewletê bi dest xistine. 

SYDNEY: 4/95



HOZAN Û MUEYID TEYIB

Carnan Televizyon û rojnameyên kurdî li Îraqê hevpeyvîn li gel min dikirin. Yek ji pirsên wan yên edetî ew bû: kîjan ji hozanvanêن xurt bi dilê we ye? Bersiva min herdem ev bû: Hozanvan Mueyid Teyib û Ebdilrehman Mizûrî li cem min serkêşen hozanvanên xurt in. Lê deme rojname çap dibûn û şerîten televizyonê nîşa bîneran didan, ev pirsâ ha qet di hevpeyvînê de dernesidiket. !!! Min ji hinde biraderên niyîskar û hozanvanan pirsî: Erê gelo, hûn nabêjin min, çîma bersiva min ya wê pirsê bi tenê li rojnaman naêt çapkiranê û ji şerîten televizyonê dîsan ew bi tenê tê qutkirin? Gotin: Çinkî navê Mueyidî li rîza neyarêne rîjîmê tê li qelemdanê!!!

Dema ez surgûn bûm û hatim Ewrûpa, Seydayê Mueyid li Swêdê ji kereme xwe kasêtek hozanên xwe ji min re şand. Wê kasête dil li min xweş kir û birînen dûriyê ji welêt hebek tena kirin.

Vê dumahiyê hozanvanê bilîmet dîwana hozanên xwe bi navê “*Stiran û befîr û agîr*” ji min re kir diyari û bi pos-tê gehîşt min.

Dîwan ji çil hozanan pêk hatiye û van nêzîkan li Kurdistan Federal çap bûye.

Hozanên dîwanê mina birûsiyên werzê biharê eku şirreqênê ji asmanan dihînin, çîrîskên agrîn jê dipeşînin, jîor da dihêن xwar, kel û telaran dişewitînin û bi serêk de tînin, kavîl û wêran dikin, mîna bîvelerzan erdi dihejînin, humrîn û gurmînên tîrsê û lerzê têxîn dilan. Tava baranê biharê eku lêmestan li çiyan pêk dihînin, der û ber û keviran li berahiya xwe radimelin, mirinê û fenayê li dor û deran diçînin. Bayê biharê sibê zû eku canî li gîhandaran xweş dikin û lesî lê peyt diken, di ser mîrg û çîmenen kesk dibore, xunava li ser lêvan maçî diken, takêñ kulîlk û adarokan sor û sipî, zer û şîn û mor dihejînin.

Haviz Qazî

Dema min berhemê nayab yê hozanvanê xort Mueyedî xwandî, min hest kir bi wan birûsiyan, bi baranan, bi maçen şinebayê sibê, bi adarok û kulîkên biharê, bi ax û daxên dayikên cegersotî, bi şînî û tazîyan, bi zîmar û behîyan, bi henasa gerdanên xilfîn sedaran, bi xem û kovan û keserên bîjînan, bi giryan û rondikên sêwî û bê xudan, bi nale nala birîndarên kîmyawî û topêngiran, bi armancêng her mayin xewin û xuzyîkên bi dest ve nehatî, bi rûbarêng xûna pak a sekîdan ewa erd û kevir û axa pîroza welatî pê hatî reng kirin, di riya serfirazî û xoybona Kurdan de, bi çalakî û mîraniya xortan dij zordaran, bi nîgarêng degmen û dîmenêng xweristî yêng welatê spehî û şîrîn, bi kevalêng hunerî, bi gundêng wêran, bi daristanêng şewitî, bi kaniyêng der lîgirtî, bi hîzr û boçanêng mirovatî û însanî, bi aşiqêng aştîxas, bi mirîdêng paşeroja geş, bi...bi...hwî.

Her peyveke hozanvanê dahêner, tîrek e diberdet dilê stemkaran, cerg û hinavan li dijminêng beseriyetê disojin û serî li milletê qehreman berz û bilind dîkin. Her rêzek wolkanak agirîn e. Xezeb û nefret û kînapîroz di dilê xebatkaran dikelînît dij zulimkar û dagirkaran. Her hozanek tifeke diket nav çavêd serşorêng faşî û pêlaveke didante serê xizmetkar û xwefiroşen kurd.

Ev jî çend nimûne ji dîwana hozanvanê hêja, bi me xweş e bo xwendavarân bikin diyarî:

Hozanvan di zîndana xwe de, bo diya xwe distirît û bi geşbînî didîrte rojêng ayin-de û dibêt:

Bergê paşî yê

pirtûka

Mueyid

Teyib, Stran


û befîr û agîr

ku li

Kurdistanê

bi tipêng erebî

çap bûye.



Lê daykê

Her ho nabît

Zîndan, her mala min nabît

Şînî, her karê te nabît

Bihara me, her di zikê hûtî da nabît

Sibe dîwarêt xirole dê herifin

Qeyd û zincîr, dê herrişin

Qamçiyêt reş, dê bin bizot.

Leşê xudanê xo sojin

Dê hême ve û dê rezgar bîn

Ez ji dîwara û

Tu ji xerîbiyê...

Li cihekî din, dîya xwe wesyet dikit ku neket girî gava caba sêdarkirina wî digehtê û dibêt:

Sibe.. dayê

hêsta tarî

Berî roj bête vî warî

Berî hêlin vala bibin

Berî pale hişyar bibin

Min û sêdarê jivane...

Sibe dayê

Pêlava min
 Ji taca Mîrî bilindtir e
 Daweta min
 Ji hemî govenda xoştir e
 Bejn û bala min
 Ji biharê bi xemiltir e
 Evca çewa dê key girî
 Sîngê xo yê temet derya
 Dê vequû
 Pirça xo ya wek befrê
 Dê veçîrrî
 Ne dayê, ne
 Nekkey nekey
 Cil û bergêt xo reş nekey
 Dergehê kolkê me yê xoş
 Bo xem û nîhara vekey...

Di hozana “E'şq û agir” de, pesîna hêz û
 şîyana milletî dike û çawan-eku tê serî-
 dikare sikir û çeperên dujmin ji bin bibe:

Lê 'şqa te
 Di dilê min de agir e û
 Agirî dixeçît
 û dilekê tijî agir
 Eger peqî
 Ew ci şeve
 Dê xo girît
 Yan ci helatê reşe
 Dê rê li vî agirî birrît...

Di hazana “Newroz duhî û evro” de,
 bewerek mukum bi hêza milletî heye û dibê-
 je:

Niha... niha
 Li her şarekî
 Li her gundekî
 Ejdehayek pê dixurritin
 Lê negotin:
 Li her şarekî
 Li her gundekî

Bi hezara rêncber û cotyar û palene
 Hemî cotyar û pale jî
 Ewro çekoç û Kawe ne...

Hozanvan li vir behsî xoregirtina welatî
 dike û îmanek bê sînor bi serketina milletî
 heye:

Ne ezbenî
 Neke kenî
 Welatê min, ne rûbare
 Li nav deryayê berze dibît
 Welatê min, ne bihare
 Hevîn dê hêt û çîrmisît
 Ne, welatê min çiya ye
 Çiya ji cihê xo na livit.
 Befra me jî
 Her ya ketî û
 Her dê kevit...

Li vir pesina xebat û çelengîya “Barza-
 nî”yê nemir dike û têxte berçavan û dibêje:

Ho ew kesê
 Li ser rextê Birnoya boy û
 Di zînî da şîr vexarî
 Ho ew kesê
 Bihost... bihost axa welatê min pîvay
 Çiya... Çiya çeperê xo te lê danay
 Ho ew kesê
 Xilfa sêdarê qetkirî
 Serê sê Mîra şorkirî
 Araz birrî...

Eve kurte boçoneka di nav dinya hozan-
 vanîya Seyda Mueyed Teyib de. Dîwana
 wî, şakareka ter û rind û hozanên bi nirx û
 rûmetdar di kitêbxana kurdî de zêde kiriye.
 Em şanaz û serbilindîn bi hozanvanê xwe
 yê behredar û hîwadarîn berdewam be di
 bizava xwe a pîroz de. ↗

LI BENDA GODOT

Zehra Ipşiroglu / Wergêr: Şefik Kaya

Heke em bixwazin Godot (Godo) bidin ji-yandin, divê em wî ji Beckett azad bikin”.


Çend sal berê, serekê “Theater an der Ruhr”ê Roberto Ciulli “Li benda Godot” bi şirovekiri-neka balkêş da leyistandin. Wî, bi van gotinê xwe wê valahiya di navbera nivîsevan û berhemê de dihanî zimên. Dema ku nivîsevan berhemâ xwe dinivîse, ew peyamekê yan jî peyamnan pêşkêş dike. Ji ber vê yekê, di navbera nivîsevan û berhemê de girêdanek çêdibe, lê carinan jî berhem ji peyama (mesaj) nivîsevan azad e û bi serê xwe xwendiyê peyam û jiyaneke ye. Ev yek jî dibe sebebê ku carcaran valahiyek dikêve navbera nivîsevan û berhema wî/wê. Ango dibe ku xwendevan ne wê peyama ku nivîsevan xwestiye bide, ew peyamên welê cuda, ku nivîsevan bi xwe nefikirî ye û mebesta nivîsevan ne ew e, fêm bike. Dîsan dibe ku xwendevan fikrên ku ne di bîra nivîsevan de bûn jî bîhîne zimên, dîtinêni li dijî dîtina nivîsevan bîhîne û bîbîne. Peyamên li dijî wê peyama ku nivîsevan xwestiye bide, bifikire. Xwendevan di vî warâ de azad e, lê ev azadî ne azadiyeke bêsinor e. Xwendevan bi nivîsevan ve girêdayî nîn e, lê bi berhemê ve girêdayî ye. Lew pêwîst e ku xwendevan şirovekiranina xwe li gorî kifşeyen di berhemê de, bi pêş ve bibe. Ev azadiya ku me got berhemên hunerî dike xwendiyê pirrmanehiyê, bi taybetî berhemên klasîk, yên ku bi barê pirr-

manehiyê ve barkirî ne û li gorî dem û çaxan ji şirovekiranîn cuda cuda re jî vekirî ne. Ev dîtinêni dema me, yên di derheqa Shekspeare (Şekspîr) de ji dîtinêni sed sal berê pirr cuda ne. Lew, problema şirovekiranina li ser klasikan bi çavekî nuh dihê rojevê. Di vî warî de em, ni-mûneyên herî eşkere û balkêş li Ewrûpa Rojava dibînin.

Ev valahiya di navbera nivîsevan û berhema wî/wê de, jihevdûrbûna wan û cudayetiya di navbera peyama nivîsevan û peyama berhemê de, di berhemêni dema me de dihê kêm kirin.

Dîtinêni di derheqa şanogeriyê û nivîsên nuh de, li gorî yên klasik, peyameke zêde kifşkirî tune. Lew, em nikarin bibêjin, Beckett di “Li Benda Godot” de welê dibêje. “Li Benda Godot” ji xeyal, şirovekiran û fîkrîn xwendevan ên cuda re vekirî ye. Abstrakî û valahiya ji bo şirovekiranê taybetiya nivîsarên modern e, ew bi zanîn cih didin abstrakî û valahiyê. Ev şîklê ji şirovekiranînuh re vekirî, azadiyeke fireh dide fikir û xeyalîn xwendevan.

Di leyistika “Li Benda Godot” de, mirov bixwaze, nexwaze temâseker ji xwe dipirse, “ma ev serekleyistikvanen şanoyê, Vladîmîr û Estragon li benda ci ne? Madem ev rawestin di jiyana wan de çu guhertinan çenake, ev rawestina wan ne bêmane û bêaqılı ye ?”. Di dawiya leyistikê de jî kifş nabe, gelo Vladîmîr û Estragon ji vê rewşa rawestinê xelas dibin an na. Rast e, herdu



Samuel Beckett (Foto: Lütfi Özkök)

jî, ji çûyinê re amade ne û dibêjin, "em herin" lê, heta perde dihê daxistin jî mirov dibîne, ku ew hîn jî li cihê xwe rûniştî ne. Ew valahiya di-vê ku ji aliyê xwendevan/ temaseker ve bête da-girtin, di vir de naveroka berhemê dihîne zi-mên.

Beckett, parastina vê leyistikê bi vî şiklî dix-west. Wî, xwestiye vê leyistikê bi şiklekî ku ji şî-

rovekirinê nuh re vekirî be, bi taybetî di şanokiri-nê de biparêze.

Di salêن hefteyî de, de-ma ku ez bi pirtûka xwe "Uyumsuz Tiyatro da Gerçeklik" ve mijûl dibûm, li Berlinê bûm. Di wê demê de, Beckett jî di tiyatroya "Schiller" de Godot dileyistand. Min çend caran firsenda lénê-rîna leystikê dîtibû. Hîn jî li bîra min e, ku çawan ew hûrûkûr li ser guher-tinê piçûk, li ser demên bêdengiyê radiwestiya. Ew pirr dixebitî ku ji ke-nê sivik re şiklekî peyda bike. Wisan xuya bû, ku wî nedixwest zêde renge-kî absrakî bide leystikê. Di şirovekirina şanoyê de, bi naveroka nivîsarê ve girêdayî dima, ango nexwestina wî ya dagirti-na valahiyê di nivîsarê

de, firsendê dida temasekeran da bikaribin li gorî dilêñ xwe xeyalan deynin û bifikirin.

Dema ku cara yekem ev leyistik hate leyis-tandin, bi rengekî provaktîv û bi zîrekiyeke nedîtî ve hatibû fêm kirin. Di vê leyistikê de dest-pêk, xalêñ pirsgirêkan û di dawiyê de zencîreye-ke bûyerên dramatîk tune bûn. Wê tenê rewşekâ, rewşa rawestinê û neguhêrbar dihanî ber

çav. Şanoger jî, ji şexsiyeta kesên ku bi zencîreya bûyerê vebihêne girêdan dûr bûn. Vê leyistikê, ew dîtinêna heta wê çaxê, yên di derheqa şanogeriyê de diroxandin, beravajî dikirin. Hêla wê ya biyan ew bû, ku temâşekerên xwediyê firikir û serpêhatiyê şanogeriyê şaqiz dihişt.


Gelo bi rastî, peyameke (mesaj) nivîsevan ji wan re hebû yan jî wî henekêna xwe bi temâşekeran dikir ?

Teorîkerê şanogeriyê Martin Esslin, di pirtûka xwe "Absurd Drama" yê de, bi taybetî li ser rewşa temâşekerên rewşenbîr, yên ku di derheqa şanogeriyê de xwediyê serpêhatiyan in û li ser li dijî derketina wan radiweste. Ew li ser xaleke balkêş disekine: Leyistika "Li Benda Godot" di girtîgehekê de didin nîşandan. Girtî, di bin tesîra vê leyistikê de pirr dimînin. Ji ber ku pirraniya wan di jiyana xwe de şano nedîtibûn û ew cara yekem bû, ku wan leyistikêk didît. Ew bi leyistikê re, bê pêşhukmî, raserterast peywendî datînin û pê re dijîn. "Godot, ji bo wan azadî û serfîrazi bû, lew ew bi xwe jî fena Vladîmîr û Estragon radiwestiyan".

Şirovekirinêna cuda, yên di derheqa "Li Benda Godot" de êdî tu kesan ecêb nahêle. Ew cureyê şanogeriya ku armanca wan rastiyekê bihînin zimên bûn, êdî kevin bûne.

Şanogeriya dema me sînorêna dramatîkiyê derbas kiriye, riya cureyênuh, yên bi şiklekî cuda, ku ji şirovekirinêna nuh re vekirî ye, daye pêş xwe.

Ji ber vê yekê, "Li Benda Godot" wê riya pêşevaniyê "avanguardist" ku bi salan parastibû, wenda dike. Sebebekî din jî yê leyistika "Li Benda Godot" ew e, ku di vê leyistikê de, ji salen hefteyî ve heta niha, pirraniya şirovekirinêna



*Li Benda
Godot bi
wergera
Firat
Cewerî di
nava
Weşanên
Nûdemê de
li
Stockholmê
derketiye.*

di derheqa fikra nivîsevan de, bi fikra valahiyê ve girêdayî mane. Temâşekerê ku ji bo dîtina "Li Benda Godot" diçe, êdî dizane ew dê bi ci re rûbar bibe.

Serek R. Ciulli digot, "heke em bixwazin Godot bidin jiyandin, divê em, wî ji Beckett azad bikin". Ev gotin xwediyê maneyeka taybetî ne.

Di ser leyistina Godot, ya cara pêşîn re sal derbas bûne û vê leyistikê êdî pêşevaniya xwe wenda kiriye, ketiye şiklê leystikêna klasik. Bi vî awayî, fena leyistikêna klasik, di vê leyistikê de jî valahiyek dikeve navbera nivîsevan û berhemê. Armanca Beckett eşkerekirina peyamê ye. Îdareker, li gorî kifşeyen di leyistikê de riyekê dire, ji wir û pê ve, temâşeker di bin tesîra şirovekirina xwe de dimîne, ji ber vê yekê, dibe dijî dîtina Beckett. Li gorî gotinê Ciulli, divê îdareker ji Becket bête azad kirin, da bikaribe ji leyistikê re nêrînen nuh bihîne. Li gorî lênerîna îdareker, ya di derheqa Godot de, dê şirovekirinêna cuda bihînen zimên. Bo nimûne: Heke Godot bi Yezdanî bête qebûl kirin, an jî weka hêviyeka bêdawî bête qebûl kirin, wê çaxê dibe ku

hêla wî ya metafizîkî bête rojevê. Di aliyê din de, heke mirov qirdikiya Vladimir û Estragon biajo pêş,ango neaktîviya wan ya di jiyanê de, pûçkirina jiyanê, telefkirina temen divê bête zimên.

Ciulli, di şirovekirina xwe de, xetekê dikişîne binê cudayetyî: Percîqandin-percîqîn, hêvî-bê-hêvîtî, bext-bedbextî, şîn-şahî, livandin-rawestan û bûyerên fena mirin û jiyanê. Heke mirov li ser .livandinê bingehîn raweste, ev leyistik bangî hêza xeyalêna temâşeker dike. Li benda besdariya fîkrêñ wî/wê ye, bêî ku rewşa abstîrakî xera bibe.

Lê, guhertinê piçûk ên di leyistikê de û şirovekirinê Beckett yên di derheqa Godot de, bi awayekî kifşe dihê veqetandin.Taybetiya vê leyistandinê ew bû, ku kenê sivik hatîye kêm kirin. Di aliyê din de jî ew xalênu ku di leyistikê de rawestinê sivik dikin, hatin kirin.

Ji ber vê yekê, mirov dikare bifikire, ku şirovekirina Ciulli, şirovekirineka bêhêvî û bişê e. Ev perspektîva idareker, ya ku ji jiyan û serpê-hatîyen wî afiriye, normal e. Ez vê yekê ne tenê heqê wî dibînim, li gorî baweriya min girîng e jî. Ji ber vê yekê, ew dîtinêni di derya mesûniyete de jiyandina nivîsevan, bi esfanekirina nivîsevan û parastina neguhêrbariya metnê êdî li paş mane. Idareker kijan riyê heldibijêre bila helbijêre, li dijî nivîsevan an jî digel dîtina wî, yan jî dîtinêni li gorî dîtina nivîsevan peyda bike û bi pêş ve bibe, pêwîst e dîtina xwe ya serbiwxê bi pêş ve bibe. Heke ne welê be, leyistik di nava qaliban de dimîne û "dimire".

Ez dixwazim hinekî jî li ser terma şibandinê rawestim, lew hîn jî maneya term (peyva) "şirovekirin" şêlû ye. Gelek caran terma (peyva) "şirovekirin"ê û ya "şibandin"ê têkilî hev dikin.

Di şirovekirinê de, idareker û dramaturg li gorî bîr û baweriyêne xwe, dikarin di metnê de guhertinê piçûk û kurtkiranê çebikin. Anglo dikarin li dijî nivîsevan û peyama wî derkevin. Lê pêwîst e ku bi metnê ve girêdayî bimînin.

Lî gorî nîşanên ku di nivîsarê de ne, derkevin, li riyên nuh bigerin û şirovekirinê xwe bi pêş ve bibin.

Lê, di şibandinê de, leyistik ji ber leyistikeke din dihê girtin, an jî bi tesîra leyistikekê, leyistike din, ji nuh ve dihê amade kirin. Anglo tişteku em di vir de dixwazin li ser bisekinin nivîsareke nuh e. Kesê ku di bin tesîra leyistikê de dimîne, dikare leyistikeke nêzî wê leyistikê, yan jî yeka jê dûr amade bike !", ji bo vê yekê tiştekî berbiçav e. Şensoy, hêla leyistikê ya abstirakî û şanogeriyê derdixe pêş. Ew, nepêwistiya demê û ya pisporan, karekterên ku helbijartiye, danîna peywendiyan, leyistikên di nav leyistikê de, rewşa rawestinê, dîtinêni Beckett, di bedsîstemekekê de nerehetî û aciziyyen mirovan, bêî ku zehmetiyê bikişîne, dihîne ber çav.

Lew di jibergirtina Şensoy de, Godot, gangoxetiyê, bêînsîyatîviyê, şetiya mirovan û feydedîtina ji bêçareyiye wan û kedxwariyê eşkere dike.

Cu girêdaneka "Oxir be, Godot" û "Li Benda Godot" bi hev re tune. Lê, ew di bin tesîra leyistika "Li Benda Godot" de maye, dîtinêni xwe fireh kiriye û bi alîkariya hunerê şanogeriyê leyistika xwe dewlemendit kiriye.

(Ji tirkî hatîye wergerandin, Gösteri hej. 151)

GIRTÎ

Husêن Dozen

Di şeveke Newroza 1988'an de, li Hambûrgê xortekî Zaxoyî pirtûkên kurdî difirotin. Qalindbûn û qapaxa pirtûkekê ji wan bala min kişandibû. Ez berê jî di çend kovarê kurdî de pêrgî navê nivîskarê wê hatibûm. Piştre hat bîra min ku sê pirtûkên wî yên helbestan jî çap bûne. Min texmîn kir ku wê ev pirtûk jî helbest be, lê gava min rahiştê û rûpelên wê di ser hev re qulipandin, min dît ku ew bi pexşanê (prose) hatibû xemilandin. Pirtûk 346 rûpel bû û hemû kurteçtrot bûn. Hema min li ser lingan destpêka çend çirokan xwend. Kurdiya wan ya şêrîn ez weke qilçixekî girtibûm û bi xwe re herikandibûm. Zimanê wan wek herikîna çemekî bê sekin bû. Navê wê pirtûkê "GIRTÎ" bû. Nivîskarê wê Firat Cewerî bû. Pişti wê şeva Newrozê bi çar salan, li Stockholmê şeva piştgiriya rojnameyeke kurdî hebû. Berî ku programa şevê dest pê bike, ez û çend dostêن xwe, yên ku me bi salan hevdu nedîtibûn, li ser kursiyêن li pêşıya salonê rûniştibûn. Sohbe-

ta me li dar bû. Di nava wan hevalan de ciwanmêrekî ku min ew nas nedikir, hebû. Di destpêkê de ew bêdeng bû. Di bin çavan re li der û dora xwe mîze dikir, lê guhêن wî li civatê bûn. Gava gotin hat ser zimanê kurdî û weşanên kurdî li Tirkîyê, tiştekî ku min nedipa, bû. Wî zilamê ku hetanî wê çaxê tenê guhdaî dikir, bi awakî ji xwe bawer, bi kurdîyek xweş û bi dengekî nizim weha digot: "Wilo nabe. Divê mirov here. Gava mirov biçe li Diyarbekirê, yan jî li cihekî din kovareke kurdî derxe, wê kesêن ku bi kurdî dinivîsinin, li dora wê vehewin. Em ê bi vî awayî bikarîbin zimanê kurdî bi pêş bixin û ji edebiyata kurdî ya modern re bibin alîkar." Xwediye van peyvan ji Firat Cewerî pê ve ne kesekî din bû. Piş re ez têgihîstim ku Firat Cewerî wan rojan haziriya derxistina kovara NÜDEM'ê dikir. Lê mixabin, planêن wî yên li Diyarbekir derxistina kovarê neçû serî. Di bihara wê salê de NÜDEM li Swêdê derket. Bi hejmara duwemîn re F. Cewerî

xwest wê bibe Tirkîyê û wî ew hejmar li Ankarayê derxist. Lê mixabin, NÜDEM piştî wê hejmarê mecbûr ma ku weke hemû pêşiyên xwe vegere surgûnê. Ew niha, her ji sê mehan carekê, di bin berpirsiyariya F. Cewerî de li Swêdê derdikeve.

* * *

Di edebiyata kurdî ya nivîskî de pexşan pir kêm e, geşbûn û pêşketina zimanekî jî bi wê tê pîvan. Gava meriv van tiştan tîne ber çavan, qîmeta nivîskarên wek F. Cewerî û kurteçîrokên wî eşkeretir dibin. Herçî helbest in, kesên weke Mele Ehmedê Batê-yî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî ji me re gelek klasîkên bi nav û deng û bi kîrhatî hiştine.

Lê pexşane?

Mixabin, ji bo pexşana kurdî mirov nikare eyñî tiştî bibêje. Cara pêşî kurteçîrokek Fuadê Temo bi navê "Çîrok" di sala 1913'an de, li Stembolê di kovara "Rojî Kurd" de hatiye weşandin. Bi tevayî Erebê Şemo wek pêşengê pexşana nûjen û romana kurdî tê qebûl kirin. Çiqas kêm bin jî, ji salên bîstî û vir ve gelek mînakên edebî yên pexşanê hatine afirandin.

Di van panzdeh salên dawî de gelek kurteçîrok û romanên kurdî yên modern li surgûnê hatine weşandin. Mirov dikare nivîskarên van berheman di edebiyata kurdî de wek nivîskî nû bi nav bike. F. Cewerî jî yek ji wan e.

Osman Sebrî, yê ku digel helbestan gelek berhemên bedew dane pexşana kurdî, di

hevpeyvînek bi F. Cewerî re weha dibêje: "Ezbenî, çîrok ji helbestan başfir in. Çîrok bi zimanê raste rast tê nivîsandin. Helbest ne welê ye. Vêga gelekan ji xortêne me çavêne xwe berdane nivîsandina helbestan... divê nivîsêne raste rast bêne nivîsin."

Di vê çapa duduyan de guhertinin biçük di "Girtî" de hatine kirin. Ji ber ku çîroka bi navê "Xewna Orhanov" di pirtûka nivîskar ya bi navê "Kevoka Spi" ku li Tirkîyê hatîbû weşandin de cih girtibû, di vê çapa Girtî de ew tune ye. Jê pê ve ji ber pirbûna rûpelên pirtûkê, nivîskêr "Zoro Axa" jî jê derxistiye. Lê ji berdêla wan çîroka "Barkêşen Biçûk" ya ku di sala 1983'an de mîna du besan di kovara Enstituya Kurdî ya Parîsê Hêvî de hatîbû weşandin, li vê çapê zêde bûye.

Wek ku nivîskar di pêşgotina çapa yeke-mîn de, 1986, diyar dike, ku kurteçîrokên vê pirtûkê di navbera salên 80-84'an de hatine nivîsandin û piraniya wan di kovarênen kurdan yên wan salan de hatine weşandin. Hin ji wan di radyoyan de hatine xwendin, grûbêni tiyatroyan li ser hinan ji wan xebitî ne, hinin ji wan jî bi alîkariya mîmosta Şukur Mustefa bi tîpên erebî di kovarênen kurdî yên Iraqê, mîna Beyan û Karwan de derketine, çend heb ji wan jî bi swêdî di kovarênen swêdiyan de hatine weşandin. Niha jî, li Almanya, rohilatnasek alman wan werdigerîne almanî û wek pirtûk ji çapê re amade dike.

Nivîskar di van çîrokan de bi awakî re-alîzma civakî, bi piranî jîyana zarokên kur-


dan aniye ziman. Qehremanê wî tîpêñ re-alîst in. Navêñ van zarokêñ ku em di kurteçirokan de pêrgî wan têñ Ferzend, Îbo, Kotan, Osman, Bozan, Çeto, Temo, Nû-jîn, Guri û hwd. Ew carna nexweş in, di nava nivînan de ne, dê û bavêñ wan nikarin wan bibin ser bijîşkan, ew carna boyaxkerêñ solan in, ku ji ber çawîşen belediyê direvin û dikevin ber tirimpêlan, ew carna barkêş in, carna li bajarêñ mezin cigarefiroşen cigarêñ biyanî ne, carna jî ew li Kur-distanê pêşengêñ serîhildanan in.

Nivîskar wan zarokêñ ku li welêt bê maf, poz bi lîçik, çav bi şelêq û çîm tazî ne, dide xeberdan û wan û mezinan dixe dialogê. Cewerî bi hostayetiyeñ mezin fikir û hîsêñ zarokan radixe ber çavêñ xwendevanêñ xwe. Ew mirov bi xwe re dibe dinya zaro-kan ya taybetî. Lê ew bi vê jî namîne; ew rewşa welatê wan û feqîrî û neçariya dê û bavêñ wan jî bi tehrekî edebî vedibêje. Bêî ku ew gotina xwe di nav sloganêñ siyasi de bifetisîne, bi bûyeran re riya çareserkirina pirsgirêkên jiyana qehremanêñ xwe jî diyar dike. Wî ev tişt di kurteçirokêñ "Ciwange-yê Temo" û "Serîhildana Zarokan" de bi awakî pir eşkere daye xuyakirin.

Hevaleke min a ku "Girtî" xwendibû û pir jê hez kiribû weha digot: "Firat Cewerî di piraniya kurteçirokêñ xwe de bêî ku tê-keve nav polîtikayê, bêî ku ew hewl bide ku dilê kesekî bi xwe bişewitîne, ew jiyana kurdan, rabûn û rûniştina wan nîşanî xwendevanêñ xwe dide."

Kurdiya kurteçirokan pir paqîj e. Wek

*Girtî,
Firat
Cewerî,
çapa
yekem
1986, çapa
duwem
1995.
Weşanêñ
Nûdem.*



ku Şahînê Bekirê Soreklî jî diyar dike: "Zimanê ku Cewerî di çîrokêñ xwe de bi kar tîne, zimanekî zelal û hêsan e." Nivîskar di vegotina xwe de nalukume. Ji ber ku bûyerêñ wan jiyana kurdan ya rojane ne, tu qalibêñ zimanê biyanî di wan de tune ne. Bê kesen der û dora Nisêbînê çawa dipeyivin, nivîskar qehremanêñ xwe bi wî awayî dane xeberdan. Di cihêñ ku nivîskar hewceyî peyivin din bûye, ew ji zaravayêñ kurdî yên din girtine û bi hostayî bikar anîne. Ez bawer im dê di pêşerojê de, gelek ji van çîrok-kan ji mamosteyêñ ziman û edebiyata kurdî re bibin materialêñ dersê. Ne bê sedem e ku rohilatnasa alman Petra WURZEL di pirtûka xwe ya dersên kurdî ya bi navê "Kurdisch in 15 Lektionen" de kurteçiro-kek Firat Cewerî a bi navê "Lawikê Nex-weş" çap kiriye.

Bê şik divê mirov rewşa wan salêñ ku ev kurteçirok hatine nivîsandin jî bide ber çâ-

van. Gava di sala 1986'an de "Girtî" li Swêd çap bû, weşanên kurdî qels bûn, ni-vîskar kêm bûn, xwendevan ci bigirin tune bûn, îmkanêñ berhemêñ bi kurdî bi sînor bûn. Nivîskar ew bi îmkanêñ xwe yên şexsî, lê bi çapeke bedew dabû çapkiran.

Firat Cewerî bi xwe dibêje ku ew "di sala 1959'an an jî di sala 1960'ı de, li gundekî Dêrika Çiyayê Mazî, li beriya Mêrdînê" hatiye dînyayê. Di zaroktî û xorxaniya wî de sê tişt hene ku qet pêxîla wî bernadin: Feqîrî, tadeya dewletê û derketina pêşî ji gund û bajêr û dû re jî ji welêt, ango xerîbî. Gava mala wan ji gund bar dike û diçe Wêranşar, Firatê biçûk sê salî ye. Li Wêranşar rewşa malbatê a aborî nebaş e. Piştî salên 1960'ı li gundê wan reforma erd çedîbe. Malbata Firat jî vedigerin gund. Li gund perçak erd para wan jî dikeve. Firat di dibistana gund de pêrgî kirinêñ karbi-destêñ biyanî tê: "Di dibistanê de ji bo her gotineke kurdî me cezayêñ peran dida. He-ta car caran em newêribûn li malê jî bi hev re bi kurdî bipeyiviyana." Rojekê jî ew dibîne bê çawa leşkerên tirk digirin ser gundê wan û hemû zilamêñ gund li meydana gund kom dikan û li wan dixin. Nemaze gava ew di cama pencerê re dibîne ku Apê Hecî lêxistinê dixwe, Firatê biçûk hêrs di-be. "Apê Hecî li gund pir bi qîmet bû. Biçûk û mezinan xatirê wî digitin. Gava ew danêñ êvaran diçû ber siya dîwêr, hemû kes ji ber wî radibûn." Firat bi zaroktiya xwe jî xwe dipirse, ka gelo leşker nizanin ku ew Heciyê rîspî "Ewqasî di nava gund

de bi qîmet û xwedîxatir e."

Piştî salan nivîskar Firat Cewerî hîsîn xwe yên wê rojê weha tîne ziman. " Ez çi-qas fikirîbûm, min tu sedem ji wê zilma wan re nedîtibû. Lê kîn, nefret û girekî ecêb di dilê min de çêbûbû. Dilê min ji ber van hê jî diperpite."

Di salên hefteyî de malbata Firat diçe li Nisêbînê bi cih û war dibe. Kêfa Firat pir ji Nisêbînê re tê. "Hebûna trênen, nêzîkbûna Qamîşlokê, herikîna çemekî mezin di nava bajêr de û darêñ li sûka wê çikandî" Firat zû hogirî xwe dikin. Ew li wir li gel xwendîna dibistanê, carna di çayxana bavê xwe de kar dike, carnan jî di firnan de nanopêjiyê dike.

Di sala 1974'an de Firatê nûgihiştî ji bo xebatê diçe roavayê Tirkîyê. Ew li bajarêñ wek Îzmir û Manîsayê dimîne. Piştî salan ew ê ecêbmâyî bimîne ku "nêrîna kurdayetî û welathezî li wan bajaran pê re çê dibe."

Wê demê xwenasîn li welatê Firat belav dibe, tevgera rizgarîxwaziyê geş dibe. Firat Cewerî jî vedigere welêt û tevlî wê dibe. Di sala 1980'ê de terka welêt dike, di ser Sûriyê re diçe Almanya û ji wir jî xwe davêje "Welatê sar, yê ku ji salê carekê roj lê naçe ava, Swêdê."

Jê pê ve jiyanâ surgûnê ji bo Firat Cewerî dest pê dike. Lê ew li wir bi jîrî û bi enerji-yek pir mezin hemû dijwariyêni jiyanâ xwe ji bo nivîskariya xwe di berhemêñ xwe yên edebî de baş bi kar tîne. Ew di salên pêşî yên surgûnê de bi pereyêñ ku bi "Ked

û xwêdana eniya xwe” qezenc dike pirtûkên xwe dide çapkirin. Lê ew li surgûnê ji ji kurdan bi dûr nakeve. Mirov carnan Firat Cewerî di nav rûpelên kovar û rojnameyên kurdî de li mala Apê Osman Sebrî, carnan li mala Celadet Bedirxan bi Rewşen Xanim re, carnan jî li ba Apê Mûsa Anter rûniştiye û pê re çayê vedixwe, dibîne.

Firat Cewerî li welêt dest bi nivîsandinê kiriye. Di sala 1979’ân de, wî zilma dewle-tê ya wê demê, di gotareke bi tirkî de li ser navê komela ku ew di komîta wê ya karger de bû, di rojnameyekê de di-weisîne. Jê pê ve wî hew bi tirkî nivîsand. Diyar e ku di destpêkê de Cewerî di bin tesîra Cegerxwîn de maye: ”Di sala 1977’ân de pirtûkeke helbestan ya Cegerxwîn ketibû destê min. Wê pirtûkê dilê min şâ kiribû, hêvî dabû min, zimanê min bi min şérîn kiribû. Ew pirtûka Cegerxwîn bû sedema nivîsandina min ya bi kurdî.”

Firat Cewerî jî bi helbestan dest bi nivîskariyê dike, lê her ku diçe ew bêtir meyla xwe davêje ser kurteçîrokan. Ji ”Girtî” pê ve, di sala 1992’ân de pirtûkeke wî ya din ”Kevoka Spî” li Ankarayê derdikeve. Di kurteçîrokên vê pirtûkê de, nivîskar li ser jiyan, fikir û hîsên ronakbîrên kurd yên li surgûnê radiweste. Di gelekan ji wan de di-jîtiyên di jiyanâ wan de derdixe pêş. Di cihnan de jî nivîskar bi tinazî rexnan li wan digire.

Firat Cewerî bi van herdu pirtûkên xwe isbat kir ku zimanê kurdî di warê pexşanê de baş dikare bête bi kar anîn.

Karê ku Firat Cewerî û nivîskarê din yên kurd dikin, ne hêsan e. Ji aliyê diravî ve ew her tim di xisarê de ne. Lê jana wan ya mezintirîn xela xwendevanê kurdî û tunebûna rexnegirê edebiyata kurdî ye. Jê pê ve rewşa welêt ya kambax wan tim tîne ser sînorê polîtikayê. Û ev pirsên jêrîn hîna jî di rojeva rewşenbîr û nivîskarê kurd de ne, ew li hêviya munaqêsekirinek bi dostanî ne: ”Çawa meriv dikare mesajeke cîvakî, çandî, siyasî têxe nav qalib û kirasê edebiyatê?... Çawa meriv dikare jan û eziyeta ku kurd ji mêj ve ye dikişîne, bi awayên edebî û bi stîl û estetîkên bedew, stîlîze bîke û rengekî nû bidiyê?” (M. Uzun)

Nivîskarê Alman yê bi nav û deng Hermann Hesse kesên nivîskar dişibîne saetê. Di nameyek xwe de, ya ku wî di sala 1931’ê de ji hevalekî xwe yê komünîst re nivîsandibû, weha dibêje: ”Bivir her bivir e, mirov dikare bi wî yan daran biqelêse, yan jî seriyan... Lê saetek yan jî barometrek bi kêrî tiştin din tê. Ku mirov bixwaze bi wan dar û seriyan biqelêse, bêî ku kesek ji wan tu fêdê bibîne ew ê xera bibin.”

Ez bawer im ku peyvîn H. Hesse ji her kesî bêtir ji bo kurdan xwedî maneyên pir girîng in. Kurdish gelek caran ji ber tunebûna saetan karêن xwe bêwext kirine. Ku ew bivir û saetên xwe tevlî hev nekin, ew ê her du jî bêtir bi kêrî wan bêن. ↗

NÛREDÎN ZAZA

Û

KURTEÇÎROKÊN Wî

Nûredîn Zaza, yê ku di nav koma hev-karên Hawarê de yê herî xort bû, ji-yana wî jî mîna ya pir ronakbîrên kurd tra-jîk; lê bi rûmet, pîrhêl, rengîn, bi tecrube-yan tijî û dewlemend derbas bû. Wî ji we-lêt bêtir dûrî, xerîbî û sirgûnî dît. Hê di-deh-yanzdeh saliya xwe de mecbûr dimîne, digel kekê xwe Dr. Nafiz cih û warê xwe terk dike, ji ber zilm û zora tirkan, ji ber ta-qîbkirin û stemkariya polîsên wan nake-der, riya azadî û rizgariya xwe di revê de dibîne. Ew û kekê xwe Dr. Nafiz baz didin û derbasî Sûriyê dibin. Ew pêşî diçin Helebê, paşê jî bi alîkariya hin kurdên nas û welat-hez li Şamê bi cih dibin.

Nûredînê biçûk û kekê xwe demekê ji hev diqetin. Ji ber ku kekê wî doktor bû û welathezekî dilşewat bû, ji bo ku ew alîkariya kurdan bike, wan derman û derzi bike; ya girîngitir jî wan ji nezanî, belengazî, perî-şanî û bindestiyê rizgar bike, berê xwe dide beriya Cizîrê û li wir di nexweşxaneyekê de wek bijîk û di nava gel de jî wek mamoste-yekî azadiyê dest bi xebatê dike.

Nûredînê Biçûk, lê yê ku niha di dibista-na fransizan de xwendîye û xwe gihandiye, bûyêrên Tîrkiyê roj bi roj taqîb dike û dilê

wî her ji bo gelê wî lêdixe. Loma, bombe-barandina dewleta Tîrk ya li ser Dêrsimê tehmûl nake, ji bo protestokirina van kiri-nêñ dewleta Tîrk, bi hin hevalêñ xwe re (ku paşê di bin navê Hêvî de komeleyekê ava dikin) li sefaretêñ hin welatêñ Ewrûpa-yê digerin, ji bo piştgiriya gelê kurd û lidij-derketina ordiya hov, ji wan alîkariyê dax-waz dikin.

Nûredîn Zaza li gelek welatan digere. Pê-şî Sûrî, paşê Iraq, Lubnan û Siwîsrê... Ew di vê gera xwe de, an jî di vê ji-yana xwe ya sirgûnê de gelek tade û neheqiyê dibîne. Ew di zîndanêñ kûr û tarî de hesreta çîrûs-kek roj dikişîne. Ew ji-yana wî sirgûnê, tade û neheqiyâ ku lê dibe wî hê bêtir li xebatê gurr dike. Ew bi mamosta Cegerxwîn re dibe yek û bi helbestêñ wî, ku wê demê ji bo kurdêñ razayî zengilê şiyarkirinê bû, pê xelkê ji xewa nezanî û kirêt şiyar dike; bi Osman Sebrî re, ku ew jî weke wî mecbûr mabû, welatê xwe terk kiribû û li Sûriyê bi cih bûbû, yekemîn car, di sala 1957'an de bingehê Partiya Demokrat a Kurd (P.D.K.) datînin. Berî lidarxistina Partiyê, ew li Ewrûpayê, di sala 1949'an de bi hin hevalêñ xwe re "Komela Xwendekarêñ

Kurd Li Ewrûpa” ava dîkin û berpirsiyariya wê jî hildigire ser milên xwe. Bi avakirina vê komelê re gelek êrîş têne ser Nûredîn Zaza. Ev êrîş ne bi tenê ji welatên dagîrker, herweha ji komunîstên dogmatîk yên welatên dagîrker jî dihatinê. Van celeb komunîstan Nûredîn Zaza bi nasyonalistî súcdar dikirin û xwe jî bi ûnternasyonalistî didane pêş. Lê, ew ûnternasyonalistiya wan, hindik ba jî, dîsan gelê kurd jê destekewtî nedibû û jê bi qasî misqalekî fêde nedidît.

Nûredîn Zaza di sîrgûnê de her sîrgûn dibû, xwe nedida dest, dîlî û bêdengî nedipejirand; her li ber xwe dida, her dixebeitî... Wek mînak; li Sûriyê partî danî, li Swîsrê komele ava kir û rojnameya bi navê “Dengê Kurdistan” derxist, li Bêrûdê berpirsariya radyoya kurdî, ku bermaya Mîr Kamiran Bedirxan bû, girt ser milê xwe.

Vî ronakbîrê kurd ê bi rûmet, tu carî li ber zîlm û zorê, neheqî û pîkoliyê serî dananî. Lê mixabin, kansera kambax pençê xwe avête vî camêrê rûspî, seriblînd, zana û têgihiştî û li xerîbiyê serê wî danî. Vê zerara mezin dostêن kurdan xemgîn û dijminêن wan jî dilşa kir.

Dr. Nûredîn Zaza heta bi wefatkirina xwe jî li Swîsrê dima. Ew li wir bi jineke swîsrî re zewicî bû û bavê lawekî bû. Ew li welatê xwe yê sîrgûnê doktora xwe li ser “Herikîna Personalist di ramana filosofê fransiz Emmanuel Monnier” de dike û ji bili xebatêن xwe yên milîtanî û siyâsî jî gelek bend û nivîsêن bi kurdî, erebî û fransizî dinivîsîne û pirtûkeke helbestan bi navê


“Şerê Azadî” çap dike. Du pirtûk jî bi fransızî “Contes et Lé gendes du Kurdistan” û “Ma vie de Kurd” derxistine. Romaña Ereb Şemo wergerandiye, destana kurdî “Memê Alan” digel pêşgotineke dirêj û bedew amade kiriye û hê jî gelek tiştên wî yên neçapkırî hene.

Lê, digel hemû tiştan, digel xebatên wî yên siyasi, nivîs, bend û pirtûkên wî jî, dîsan ji bo min tiştên herî balkêş li ba Nûredîn Zaza, çîrokên wî ne. Ew di aliyê nivîsandina çîrokan de xurt, têgihiştî û li gorî dema xwe nûjen bû. Hê di bîst û du saliya xwe de gava çîroka wî ya yekemîn “Xurşîd” di kovara Hawar, hejmar 27, 15 Nîsan 1941’ê de derketibû, ez bawer im dê pir kêfa xwendevanê Hawarê hatibe.

Ev çîroka wî ya ku di bin navê Nûredîn Üsiv de hatiye nivîsandin, di derheqa peyakî bi navê Xurşîd de ye. Xurşîd dewlemen-dê Gund e. Rojekê jî vî dewlemendê Gund re lawek çêdibe. Ev camêr ji bo navê lawê xwe diçe mala meleyê Gund. Mele peyakî welathez e û navê wî Cemşîd e. Ew vî navê xwe yê şîrîn diyarî lawê Xurşîd jî dike. Xurşîd bi vê yeka han pir dilşa dibe û bi kêfx-weşî jî ba melê dide rê û diçe malê.

Piştî şanzdeh salan, ji bo ku lawê Xurşîd, Cemşîd, bi serfirazî dibistana xwe xelas dike, bavê wî ji bo dayina mewlûdekê dîsan diçe nik melê. Mele dîsan bi rûkenî Xurşîd qebûl dike û ji bo serfirazî û zîrektiya lawê wî mewlûdeke kurdî dixwîne.

Piştî heşt salên din, vê carê jî Xurşîd ji bo



Keskesor,
kurteçirokên

Nûredîn

Zaza,

Weşanên

Nûdem,

1995.

mehra lawê xwe diçe mala Melê. Mele bi kêfxwesi mehra wî jî dibire. Heya berî ku kurê Xurşid, Cemşid, bi dû destikên keştiya xwe di avê werdibe û difetise, Xurşid wek xortekî bextiyar e. Ew dilşa ye, bi hêvî ye, xurt û li ser xwe ye. Lê piştî windakirina kurê xwe, yê ezîzê ber dilê xwe, Xurşidê weke ciyayekî dikeve, kal dibe, rû lê diqer-miçe, pişt lê ditewe û por û rih lê spî dibin. Ü bi wî awayî diçe ba melê, bi stûxwarî wê nûçeya reş digihînê. Meleyê ku hem zane ye û hem jî welatbez e, Xurşid teselî dike, ew bi zanebûna xwe û Xurşid jî bi malê xwe bi xorten Gund re dixebeitin, xwestina Cemşid tînin cih, wan didin xwendin û daweta cil xorten hêja û miletperwer, digel ku Xurşid di sergovendê de ye, çedikin.

Di hezîrana 1941’ê, di hejmara 29’ân de jî bi navê “Derketî” adaptationeke Nûredîn Zaza heye. Ev çîroka ku bi bêhnekê tête xwendin û weke helbesteke bedew diherike, li ser derketiyan e.

Derketî; ew kesen ku ji welatên xwe derketine, terka welatê xwe kirine, bi çol û çepelan ketine û ji xwe re li dûriyê li starekê geriyan e. Mirov di vê kurteçirokê de dibîne ku dûrî çiqas xweş be jî, dîsan mal, yanî welat xweştir e. Xwarin, lixwekirin, vexwarin, xweza û stranên welêt bi mirov xweştir û şîrîntir in.

Di eynî hejmarê de, yanî di hejmara 29 ya 10’ê hezîrana 1941’ê de çîrokeke wî bi navê “Gulê” heye. Gulê mîrê xwe, yê ku bêl dilê wê ye dikuje, paşê bi qiralê ciyan, Qoçoyê Pola re derdikeye ciyê. Gulê jineke bejinzirav, spehî, şîrîn û mîrxas e. Lê di çavê gundiyan de jineke qehpik, bênamûs û xerab e. Qoçoyê Pola ku gelek xerabî û rebirri kiriye, ji bo ku êdî li hemberî dijminê gelê xwe şer bike, di hizûra gundiyan de sond dixwe.

Nûredîn Zaza hatina Qoço wilo salix di-de:

“Gundî di mîvanxana Reşo de rûnişti-bûn û daxiftin. Dijmin ji gund bi tenê qanaxekê dûr bû, nixta gundê Şadiya di nêzîk de wê biketa axa bay û kalan.

Herkes diponijîn û li çarekê digeriyan. Ezman girtî bû, bandevêkê ji reşîya şevê re hîn bêtir tirs dida. Di vê gavê de derî bi şidet vebû; qiralê ciyan, Qoçoyê Pola bi heşt mirovên xwe ve kete hundir. Cilêwan şil bûn, av di tivingên wan de dihate xwarê. Gunidyan gişan da ber qîran: Poloyê kurd, sergevazê ciyayê Kurdistanê, fermo”.

Qoço bi cil gundiyan ve li hemberî dijmin kemînê vedigirin û bi hêrs û rik li

hemberî dijmin şer dikan. Gulê radihêje xencerekê û demekê winda dibe. Paşê gava di reşayiya şevê de ji hember tê, gundî û Qoço wilo têdighîjin ku Gulê ew xistine xefka dijmin; loma gundî Qoço hêrs dikan û Qoço jî berê tivinga xwe bi Gulê vedike û bi hêrs berdidiyê.

“Berikê wek qîrekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrîşim raxiste erdê”.

Lê paşê gava zora dijmin dibin û li gund vedigerin, di malekê de tiştekî ecêb dibînin.

“Serê zabitê dijmin ji laşê wî hatibû birîn û xencer bi xwîn bû... Di kulma zêbit a guvaştî de gurzek porêن Gulê ên zer pêl didan”.

Gava qiralê çiyan Qoçoyê Pola vê mîrxa-sî û binamûsbûna Gulê dibîne û bi rastiye dihese, rohnî di çavan de namîne, radihêje xencerê û bi bayê bezê derdikeve û nema xuya dike.

Çiroka “Keskесor” jî di derheqa serîhdana Şêx Seîd de ye. Ev çiroka ku bi forma kesê yekemîn hatîye nivîsandin, xuyaye bîranîneke Nûredîn Zaza ya zaroktiyê bi xwe ye.

Nûredîn zarok e, diçe dibistana tîrkan. Tam di destpêka biharê de ye. Yanî gava êdî zivistan cihê xwe ji biharê re û sarî jî ci-hê xwe ji germê re dihêle, Nûredîn guherti-nekê di mirovan de dibîne, tiştin dibin. “Gelo ev çi ye, çi dibe?” Nûredînê xwendevan ji xwe dipirse. Lê paşê ji çûyin û hatina mezinan, ji tevgera wan, ji rabûn û rûniştî-

na wan, ji peyv û gotinên wan têdigihê ku şerek dike dest pê bike; şerê kurdan, serîhdana wan li hemberî dewleta tîrkan. Têko-şerîn kurd demekê baş li ber xwe didin, xwe ji ber êrşen dijmin diparêzin û paşê jî dijmin ji bajarê xwe derdixin.

Zaza vê yeka han wilo salix dide:

“Esker top mitralyozên xwe berdidan û direviyan. Mezinên bajêr yên ko berê berberî bi hev re dikirin, li hev dihatin û çek didan mirovên xwe”.

Şerkerên kurd yên ku ji bajêr derketibûn û dabûn ser pişta dijmin, millet bê sebir li bendî vegera wan e. Dû re gava pêjna hatîna wan dikan, “Hatin, nêzîk bûn, kurd hatîn” dibêjin. Ev yeka han zû di nava bajêr de belav dibe, her kes pê dihesin “Xort û mîr bi çekêñ xwe ve, hin bi dehol û zirne, hin siwar, hin peya; bi hezaran û bi dengê her bijî kurd! Her bijî Kurdistan! Her bijî serbestî!” ve pêrgî şervanên xwe têñ.

Xuya ye ev azadî û kêfxweşîya millet zêde dom nake. Dijmin bi hemû hêza xwe ve digere ser wan; kêfxweşî û dilşahiya wan li wan dike dûjeh, wan şerpeze dikan. Yanî wê azadiya ku wan ji bo kurtedemekê bi dest xwe xistine, bi hovîtî ji wan distînîn.

“Ala rengîn, şan û rûmeta me çirandin, avêtin ber lingên xwe, pêlê kirin û li şûna wê ya xwe, ya xwînxwaran danîn. Ziman û stranên kurdî bend kirin û tirsek dijwar xistin dilê xelkê”.

Çiroka bi dû vê de jî ya bi navê “Stêrk” e. Stêrk çirokek evînî ye, ji “Les Étoiles”, D’alphonse Daudet adaptation e. Ez dika-

rim bêjim ku ev çîrok yek ji çîrokên bi kur-dî ya herî xweş û bedew e ku min xwendîye û jê hez kiriye. Ev çîroka ku gelekî nêzîkî realîzmê ye, lê di eynî demê de pîr romantîk e, di derheqa şivanekî û keça axê, Mijganê de ye. Di derheqa evîna wan de ye, an jî di derheqa evîna şivên ya nîvplatonîk de ye.

Ew xortê diltenik, dilketiyê Mijganê, li ba bavê wê şivan e. Cihê şivên bi qonaxekê dûrî mala axê ye. Ew di xaniyekî mîna holikekê de dijî û ji panzdeh rojan carekê xwarina wî jê re diçe. Piraniya caran, pîrê, ku ew jî li ba mala axê xizmetkar e, xwarina şivên jê re dibe. Rojekê pîrê ne hazir e û kesekî din ku bikaribe xwarina şivên jê re bibe tuneye, ji ber vê yekê keça axê, Mijganê, digel xwarina şivên ya panzdeh rojan li hespê siwar dibe û berê xwe dide zozên, ba şivên.

“Mijgan bi bejna xwe ya zirav û narîn, bi çavêن xwe yên çeleng û bi cilên xwe ên xemilandî û giran spehîti bi xwe bû. Ciye wê bajar, xaniyêن delal û işê wê govend, reqs û stran bû; lê ne çiya, rîl û qantir bûn.”

Gava şivan bi wî awayî çav li Mijganê dikeve şaş dibe, bi çavêن xwe bawer nake.

“Mexlûqa çeleng! Çavêن min jê nedibûn. Cara pêşî min ew ji pir nêzik de didît. Niha ew li ber min sekinibû û tenê ji bona çavên min bû”.

Lê ew yeka han ji şivên re ne ewçend hê-san bû. Ya ku ew di xewn û xeyalan de lê difikirî, niha li ba wî, zadê wî yê panzdeh rojan jê re anîbû. Ji ber vê yekê jî ew şaş bûbû. Gava ew pê re dipeyivî jî, dilê wî hil davât, hişê wî diçû û qirika wî dihate gir-

tin.

Ji ber ku baran tê û çem weke lehiyekê radibe, Mijganê nikare li çem bixe, derbasî aliyê din bibe û here malê, loma bi tirs ber bi şivên ve vedigere. Şivan vê mîvana xwe ya ezîz bi dîlxwesiyeke bêhempa qebûl dike, ji bo ziwakirina kincen wê jê re agirekî dadide, di wê navê de jî jê re xwarinekê û tasek şîr amade dike. Paşê jî jê re ji pûş û ji postê mihê cihekî razanê çedike.

Ew yeka ku ji bo şivên bi tenê xewn û xeyal bû, niha rastî bi xwe bû. Loma jî wî “tu caran ezmanek mîna ezmanê wê şevê kûr û stêrk wek yên wê şevê ges nedîtibû”.

Keça axayê wî ye, şeveder maye û xwe spartîye wî. Şivanê diltenik ji evîna wê pê ve li tu tiştekî din nafikire. Yanî li gor gotina şivên, “Li tiştekî xerab nafikire”.

Xuyaye di wê holikê de li ser wî pûşî xewa Mijganê direve, ew radibe ser xwe û derdiikeve der.

“Deriyê holikê vebû û weke hîva çardeh-şevî keçika delal jê derker”.

Di hejmara 35'an a kovara Hawarê de jî çîrokeke Zaza bi navê “Perîşanî” heye. Pe-rîşanî ya li ser xeyalekê hatiye avakirin, wilo dest pê dike:

“Li taxa mahciran, ji oda xwe temaşa ba-xçeyen Şamê dikim. Ji nişkê ve zozanên Kurdistanê ên bilind, bi dar û avêñ cemidî tên bîra min. Ez xwe li wê derê, li ser kanîkê, li bin daran dibînin.” Û wilo dom dike, di van xeyalan de kûr diçe, digel xweşî û spehîbûna Kurdistanê, ew zilma leşkeran, stemkariya wan, perîşanî, belengazî, paşdemayîn û nezaniya kurdan û welatê wan dibîne û di vê rîwîtiya xeyalan de dîsan bi

paş de tê Şamê, dikeve oda xwe û li ber pencera xwe xuya dike. Bê hemdê xwe keserekê dikişîne û ji xwe re dibêje:

“Nezanî...Nezanî...Nezanî...”

Hevîna Perîxanê ji di hejmara 37'an a Hawarê de weşiyaye. Çiroknivîs vê bûyerê ji destpêka sedsala 19'an distîne. Ev evîna ku em pê dizanin, ne evîna xortekî ye. Evîna Perîxanê evîna welêt e, evîna gelê wê ye. Evîna bavê Perîxanê ji evîna gel bû, evîna welêt bû. Lê bavê wê yê girs, çeleng, dewlemend û miletperwer di ber vê evîna xwe de şehîd dikeve. Şehîdketina bavê Perîxanê gelekî tesîrê lê dike, dilê wê yê tenik perçê dike. Loma ew dixwîne, xwe digihîne, bi dil û can û bi bawerî dide ser riya bavê xwe. Di demeke kurt de gelek mirov li dor xwe dicivîne û dibe serok û şîretkera wan. Lê mixabin, ew ji mîna bavê xwe ji wê evîna pak re dibe gorî, lê ji aliyê din ji li ser riya hizir û ramana wê kurd cih bi cih rizgar dîbin.

“Nûçeyên serdestiya Kurdistanê dihatin. Xelkê hêstirên şîn û şahiyê dirijandin û giyanê Perîxanê di tava ala rengîn de dicîrisî û ji giyanê bavê xwe re dikenî”.

Nûredîn Zaza di hemû çirokên xwe de zimanekî sivik û zelal bi kar anîye. Ez bawer nakim wê tu xwendevan di xwendina van çirokan de zehmetiyê bikişîne. Digel sivikbûn û zelalbûna zimên, gava mirov temenê wî û dîroka nivîsandina van çirokan ji dide ber çavan, mirov dibîne ku Zaza xurt û jêhatî bû. Ger di nivîskariya wî de berdewamî hebûya, ew dikarîbû bibûya ni-vîskarekî dema me yê bijarte. Lê mixabin, ji ber gelek sedemên nas û nenas, mîna pi-


raniya endamên ekola Hawarê wî ji berhemîn kêm li dû xwe hiştin. Lê her çawan be, ev kêmberhemîn wî ji bo rohnîkirina dîroka kultur, siyaset û edebiyata kurdî, şewqek e. Nemaze, wê di dîroka edebiyata kurdî cihekî van çirokên wî yê taybetî hebe. Em hêvîdar in me ê bi berhevkirin, amadekirin û çapkirina vê pirtûkê li hemberî çiroknivîs û zanayê xwe Nûredîn Zaza berpirsiyariya xwe anîbe cih.

Herweha ez dixwazim çend gotinan li ser awayê amadekirina vê pirtûkê bibêjim. Di eslê xwe de ev tiştîn ku ez ê bibêjim, ji bo hemû nivîsên di Hawarê de derbas dibe. Di hin çirokan de ji berdêla “re” û “de”, “ra” û “da” hatiye nivîsandin, di hinan de ji, “re” û “de” derbas dibe. Ji berdêla “ku” ya ku îro tête bikaraînin, “ko” derbas dibe, “kiribû” bi “kiri bû” hatiye nivîsandin, “bûbû” bi celebê “bû bû” hatiye nivîsandin. Di şûna “hûn” an ji “hun” a îro de “hon” bi kar anîye. Me ji qet pê nelîst, di Hawarê de bi ci awayî hatibûn nivîsandin, me ji ew bi wî awayî nivîsandin. Herçî ji bo navê pirtûkê ye, me çiroka bi navê “Keskosor” minasib dît. Lê bi tenê, serpê-hatiya bi navê “Şerê Mêşan” ku di sala 1965'an de di Hêviya Welêt de hatibû weşandin, cûda ye, mîna standarta îro ye. Me ew ji mîna wê nivîsand. Ji bo ku xwendevan bikaribin bi hêsanî çavekî li orjînalâ wan bigerînin, me di binê çirokan de hejmar, meh û sal ji nivîsandine.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be... ↗

Fırat Ceweri

KOVAREKE BI SWÊDÎ; JIN



E v demek e hin jinê kurd yê rewşen-
bîr kovareke bi swêdî, bi navê "JIN"
derdixin.

Di "Jin"ê de bi taybetî li ser rewşa jinê kurdan û bi gelempêrî jî li ser rewşa Kurdistanê têre rawestandin. Di derheqa agahiyâ li ser rewşa jinê kurdan, kovara "Jin"ê ji bo raya giştî ya Swêdê çavkaniyeke baş e.

Yê ku bi nivîsên xwe beşdarî li vê hejmarê kirine, bi kurtî ev in; Boniye Cegerxwîn, Perîxan, Sebriya Hekarî, Lorîn Nas-

berg, Serpîl Înanç, Şukran Dûran, Perîkan Azîz, Nalîn Baksî, Necla Mehtab Bora, Zeliha Dagli, Olcay Evcî, Khaled Salih, Saniye Akdag, Şermîn Bozarslan, Zarîfe Demîr, Hale Anter, Meral Gundogan, Adile Düzgün, Irené Persson, Malmîsanij û Agneta Norberg ne.

Em nizanin bê JIN ji çend mehan carekê derdikeve, lê heta niha hejmarek bi serê xwe û du hejmar jî bi hev re derketine. Hejmara dawî ku du hejmar bi hev re ne û nivîskarê ku me li jor behsa wan kirin, tê de cih girtine, ji 75 rûpelan pêk tê.

Di nasnava JINê de weha hatiye nivîsan-din:

Xwedî: Komeleya Jinê Kurdistanê.

Berpîrsîyar: Boniye Cegerxwîn.

Redaktor: Meral Gundogan.

Redaksiyon: Serpîl Înanç, Şukran Dûran, Zarîfe Demîr, Perîkan Azîz.

Hevkar: Şermîn Bozarslan, Iréne, Anita N., Sümbül, Lennart Asp.


Navnîşan:

Box 490 90







100 28 Stockholm

Tel: 8- 652 85 85

Fax: 8- 650 21 20



Ji bo zarokan pirtûkên nû!



Apec-Förlag

Box: 3318, S-163 03 Spånga/Sweden

Telefon +46 8 761 81 18 • Telefax +46 8 761 24 90

NÜDEM

No 14 1995